



REWŞEN

Hejimar 6 - Zivistan 1991

"Hercî bire şûrî destê hîmmet
Zebtkir ji xwe re bi mîrî dewlet
Bê ceng û cidal û bê tehewwir
Qet vê şixulê mekin tesewvir"

-Ehmedê Xanî-

Kovara Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzê Kurdistan

- Karwan û Şêr
- Çar Leheng / Osman Sebrî
- Pirtûkeke Îsmaîl Beşîkcî ya bi navê Tunceli Kanunu (1935) ve Dersim Jenosidi
- Kurtebahsek ji jiyanâ dostekî gel - Xaçatûr Abovyan
- Serhildana Îsmaîl Axayê Şikakî - SIMKO (1921-1930)
- Mîrê evîn û dildariyê Mellayê CIZÎRÎ / Şerefxanê Kurd

DI
TÊKOŞÎNA
ŞOREŞGERÎ DE
HUNER Û WÊJE
- I -

- Hevpeyvînek di gel serokê Komela Mafêن Mirovan / G. Çiyan
- Helbestvanê bi nav û deng HÊMIN / Mahabad Kurdî
- Helbesta bêmirin - Pablo NERUDA / Dilbixwîn
- Rojek wek gelek rojêñ din - Dr. K. Husêñ
- Ahmed Temî û lacê yî / Marûf Y.
- Vegera Mal / Ş. Bekirê Soreklî

REWŞEN

Max Str. 50-52
5300 Bonn 1 /BRD
Tel: (0228) 63 09 90

REWŞEN

KOVARA YEKİTİYA REWŞENBİRÊN
WELATPARÊZÊN KURDISTAN E.

KOVARA KURDÎ YA ÇANDÎ, HUNERÎ,
WÊJEYÎ, DÎROKÎ Û RAMYARÎ YE

SALÊ ÇAR CARAN DIHÊ WEŞANDIN

XWEDÎ Û
BIRÊVEBIRÊ KARÊN WEŞANÎ:
YRWK
(Yekîtiya Rewşenbirê
Welatparêzên Kurdistan)

RÊZKIRINA NIVÎSAN:
Weşanên **REWŞEN**

HEKE DAXWAZEK
DIN NEHATIBE
DAXWEYANIKIRIN,
MAFÊ RASTKIRIN,
KINKIRIN, WEŞANDIN AN
NEWEŞANDINA NIVÎSAN
YA SERNIVÎSARIYA
KOVARA **REWŞEN** E

JI KOVARA **REWŞEN**
3.000 NIMÛNE ÇAP DIBIN

BUHA: 5,- DM / 20,- SEK
1,- £ / 5,- SFR / 15,- DKR
20,- NKR / 15,- FF



XWENDEVANÊN HÊJA BIBIN ABONEYÊN **REWŞEN**

REWŞEN BIXWÎNIN

REWŞEN RE BINIVISÎNIN

REWŞEN BIXWAZIN

REWŞEN BELAV BIKIN

TEVLÎ XEBATÊN **REWŞEN** BIBIN

KARTA ABONETIYÊ

JI KEREMA XWE RE JI
HEJMARA PÊ VE,
MIN BIKIN ABONEYÊ
KOVARA **REWŞEN**

Nav:

Paşnav:

Navnîsan:

.....

.....

.....

Bank:

YRWK

Ekram Nassan

Postgiroamt Köln

Konto Nr: 21 21 14 - 504

Aboneyên hêja,
vî cihî dagirin û tevlî kopyeka
pelê razandina 20.-DM an 35.-DM
bişinîn navnîşana YRWK

DW

Buhayê abonetiyê di salê de: Almanya 20,- DM, Welatêن din 35,- DM



Rûpel 14-15


NAVEROK

Rûpel


Name ji xwendevanan re	4
Nameyên xwendevanan	5-7
Serhildana Îsmaîl Axayê Şikakî - SIMIKO	8-13
Helbesta bê mirin - NERÛDA / Dilbixwîn	14 - 15
Çar Leheng / Osman SEBRÎ	16-20
Rojek wekî gelek rojêñ din / Dr. Kurdo Husêñ	21-23
Vegera Mal / Ş. Bekirê Soreklî	24
Mîrê evîn û dildariyê - Melayê CIZÎRÎ - Şerefhanê Kurd	25-28
Hevpeyyînek di gel serokê Komela Mafêñ Mirovan / Gabar Çiyan	29-30
Karwan û şêr	31
Ahmey Temî û Lacê yî / Arêkerdox: Marûf Y.	32
ZEKA / J. Esper	33
Di têkoşîna şoreshgerî de Huner û Wêje	34-40
Nişitimana xwe binase: Mêrdîn / M. Bozan	41-43
Mihemed ŞÊXO-Kewekî müşext û sitembar / Beşîr Botanî	44-46
Kurtebahsek ji jiyana X. Abovyan	47-49
Helbest & Hozan	50-52
Pirtûka Îsmaîl BEŞÎKÇÎ ya bi navê JENOSÎDA DÊRSIMÊ	53
Helbestvanê bi nav û deng HÊMIN / Mahabad Kurdî	54-55
Navê Pîsekî / M. Şevhat	56-57
Ferhengoka Nivîsaran	58



Rûpel 25-28



Rûpel 41-43



Rûpel 54-55

REWŞEN

Xwendevanên hêja

Di vê koçbera dawiyê de ji çerxa 20'an, rewşa cihanê ber bi guhartineke bingehîn ve diçe. Roj bi roj têkilî û pêwendiyêni navbera rejimên emperialist û sosyalist de baş dibine. Nêzikbûn çêdibe, ew pirsgirêk û dubendiyêni ku bandoriya xwe li têkiliyêni navbera wan de kirkibûn, hêdî hêdî ji holê radibine û têne çareserkirin. Ev ji aliyekeve, lê ji hêla din ve hilweşandin û nexweşiya ku rejimên piranî dewletêni sosyalist lê rast hatine, ew jî ji ber sedema alozî û tengaviya ku politika rejimên wan têde dijiya, vê yekê jî delîveyeke berfirehtir vekir ku emperializma cihanî sûd û fêdeyekê ji berjewendiyêni xwe re pêkbîne. Lê dîsa jî ev rizandina ku di nava dewletêni sosyalist de xurt û belav bûye, dihêle emperializm ji politik û şeweyêni xwe yên berê biguhêrîne û bi şeweyeke nuh xwe derîne holê.

Çawa be jî, hilweşandinna sosyalizma hemdemî qezenceke weha mezin bi dest emperializmê naxe, çîma? Berî her tiştî tu ziyan û lêdanêni mirinê negihane sosyalizma zanistî û tu caran ji nagihinê. Ev sosyalizm mîna hîmeke ku nayê leqandin û tu kes nikare pê bilîze maye û wê bîmine jî. Ji ber ku bi xwîna milyonan kes hatiye avakirin. Ne bi hesaniya ku sosyalizma hemdemî pê hildiweşe, pê tê listin û li gora armancê gel nayê bi rê ve birin. Sosyalizma hemdemî, ya ku têye hilweşandin ne ya gel e, lê ya kesan e.

Li vir mirov dikare bêje, sosyalizma hemdemî ya ku berjewendîn rejimên karbidest diparêze, roj bi roj ber bi mirinê ve diçe. Aloziya ku niha tevayî cîha-

nê têde vedigevize û dijî ji delîveyekê ji mirovahiyê re peydadike ku doza azadiya xwe ya civakî, aborî û ramyarî bike. Bê guman e, wê tevgerên şoresgerî bikaribin sûdekê ji vê astengiyê bibînin. Wê mirovahiyê bigihînin roja azadî û serfiraziyê. Di vê debarê de, wê sosyalizma zanistî bi na-veroka xwe ya afirandiyar, hilpişkînên şoresgerî derîne holê.

Êrdima Rojhilata Navîn, a pêşemîn e ku guhartinêni li cihanê çêdibin bandoriya (tesîra) xwe li ser dikin. Lewra em hîro dibînin Rojhilata Navîn bûye qada şer û cengeke gerim û giran. Bê guman e, qurbana vî şerê ne mafdar xwîna gelên Rojhilata Navîn e. Wê berî her kesî gelên herêmê li bin pêyan biçin.

Piştî dagîrkirina Kuveytê ji hêla dewleta İraqê ve, delîveyeke mezin ji emperializma cihanî re peyda bû ku, bi her hîm û hêza xwe herêmê têxe bin dolıwgerî û dagîrkeriya xwe. Bi hiçeta aloziya Xelîcê, iro emperializmê bi hezaran leske û bi sedan, tang, top û balafirêni xwe xistine herêmê. Ev xuya û şanî dike ku xwe ji bo şerekî hîn dorfirehtir û xurttir amade dike. Dîsa jî, ne emperializm û ne jî dewletêni girêdayî wê dikarin pirsgirêkîn herêmê çareser bikin. Her çendî ji dest wan were wê probleman xurttir bikin. Yên ku çareyan ji dubendiyêni herêmî re bibînin, dîsa gelên Rojhilata Navîn in. Çawa dibe bila bibe, wê ev guhatinêni ku çê bibin delîveyeke mezin ji tevger û şerê me yê rizgariya netewî re peyda bikin.

Ji ber ku mêtîngere Tirk ê xwînmij û faşist, şerê me yê rizgariya netewî birawestîne, gel bi daxwazêni xwe yên dagîrkerî re mijûlbiye û ji armancâ serxwebûn û azadiyê bi dûr bixe, iro xaka

welatê me ya paqîj û bi rûmet ji leşker û balafirêni NATO re kirîye bargeh. Dixwaze xwîna gelê me di vî şerê emperializmê yê ne mafdar de biherikine. Ev ji aliyekeve. Lê ji aliye din ve, wekî ku me li jor dayî xuya kirin, armanca rêda-na NATO ku hêza xwe di Kurdistana Bakurê-Rojava de bi cih bikin, ewe rawestandina şerê me yê ji bo Serxwebûn û azadiyê.

Belê, karbidesten Tirk ên ku dûrî taybetiyêni mirovahiyê ne, da ku xwe ji alozî û tengaviya tê de dijîn biderînin û xwe ji lêdanêni gerillayê ARGK biparêzên, li aliyekevî şerê taybetî xurt dikin û li aliye din heya dawiyê dergehîn xwe ji NATO re vedikin. Vê politika wan a ku bi zanebûn bi kar tê, hîşt ku bi hezaran mirovê me berê koça xwe bidin şikeft û binerdêni ku vê zivistanê zinaran diperçifînin. Gelo, ma ji bo ci dewleta Tirk vê nûçeyê belav dike "Wê dewleta İraqê çekên kîmawî bavêje ser Kurdistana Bakurê-Rojava.?"! Ji ber vê sedemê ye, iro gund û gelek bajaren Kurdistana Bakurê-Rojava vala bûne.

Di encamê de em dikarin bêjin, ev şer bi ci merc û şewyan dibe bila bibe, ne şerekî mafdar e. Şerê emperializmê ye, armancê rawestandina tevgerên netewî yên di herêmê de. Dîsa em dibêjin, ne emperializma Cihanî û dewletêni girêdayî, ne rejîma Saddam a faşist û ne jî mêtîngere Tirk ê hov û dirind. Armanca me ya pêşemîn û paşemîn Kurdisatneke serbixwe û azad e. Heya mirinê em amade ne ku Xwîna xwe ji bo pêkanîna vê armancê dilop bi dilop pêşkêş û diyarî bikin.

**Heya hejmara bê
bimînin di xweşiyê de**

REWŞEN

Nameyêñ xwendevanan

Ji hevalên Yekitiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan re

Hevalên hêja,

heya niha çar hejmarêñ kovara REWŞENê gihane destêñ min. Min ev kovar bi dilekî germ û bi çavekî rexnegirî xwend. Berî her tiştî divê ez bêjim, ku di riya serxwebûn û azadiyê de, li ser xeteke şoreşgerî û bi bir û baweriyeke aza, damezirandina YRWKê gaveke geleki girîng û bi rûmet e.

Ew rêga ku YRWK daye ber xwe û ew prensibên ku diparêze, ez wan di cih de û rast dibînem. Di bir û bawerîya min de, divê ev rêt û prensib ji aliyê hemû ronakbirêñ kurd ve bêne parastin û ji bo wan tever û xebat xurt bibe.

Weke ku hûn jî dibêjin barê yekitiyê gelek giran e. Milkirina vî barî ji bo her ronakbirekî kurd delameteke netewi ye.

Bi vê bawerîyê ez dixwazim ji bo xurtkirin û pêşvebirina şerê netewi, ji bo parastin û pêşvebirina ziman, dîrok, weje û pişeyâ kurdî mil bidim we û di nava Yekitiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan de cih bigirim. Bi silavêñ jidil, germin û şoreşgerî...

Jiyan Olek
1 Çirîya Paşîn 1990

Kovara hêja REWŞEN

Wekî hun dizanin ku pirtukxana me, Bibliothèque de l'Institute Nationale des Langues et Civilisations Orientales / Pirtukxana Amûjgeha Netewi ya ziman û şarîstanî yên Rojhîlat, yek ji mezintirîn û kevintirîn pirtukxanê Firensa ye. Gelek pirtûk bi pirraniya zimanê cîhanê de pirtukxana me de peyda din.

Hun dizanin ji ku ji nîveka salêñ 40 de, beşê kurdnasiyê li Zankoya Sorbonê li vî welatê me, Firensa, hatiye ava kirin. Gelek xwendevanêñ me hez dikin ku kovarêñ kurdî li ba me peyda bibin. Em tînine bîra we ku kovarêñ kurdî - lê ne tev - wekî Gelawêj, Hawar, Roşinbîrî Nû, Ronahî, Kurdistan, Karwan, û hwd. di pirtukxana me de hene. Vêca, eger hûn bişen Kovara xwe ji hejmara YEKÊ de, an ji ya dawiyê de ji mere tim bişinîn, em spasdarên we ne. Wiha, wê ji xwendevanêñ me re ji pîr hêsan be ku beşê kurdnasiyê li Firensa pêş de bibin. Em hêviya pêşveçûna xebata we dikin û rêt û silavêñ me yên germ ji we re hene.

LE BIBLIOTHEQUE DE L' ECOLE DES LANGUES ORIENTALES
De la Section Kurde
L'UNIVERSITE DE LA SORBONNE
NOUVELLE PARIS - FRENSE

Hemû besdar û endamên Yekitiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan -YRWK, ez silavêñ şoşîşerî ji we re dişinim

Rewşen kovareka pir hêja û delal e. Bi xwendina Rewşenê re em gelekî fêri zimanê kurdî dibin. Ez dixwazim çirokekê hikayeta mîrê Erbilê [Hewlêrê-R] binîvisinim ji xwendevanê Rewşenê re. Hikayeye weha hatîye bihistin.

Mîrê Erbilê şevekê derket derê malê bala xwe daye ku şev pir reş û tarî ye û baran hûr hûr dibare. Vegerîya xanî û pîrsî: 'Geli mirovan! Kesek heye ku işev herê gelîyê jîr û werê?' Gelekan got, 'belê em dikarin herin, ma ci heye.' Mîr got ezê tiştîkî ji we re bêjim, heke we pêk hanî ezê keça xwe bi xemîl û xêz bikim û ji we re bînime mala we û dîlanekî ji ji we re pêkbînim.' Mirovê li wê derê hemikan guh bêl kirin, gotin 'kerem bike mîrê me...' Mîr weha got: 'Kesê vê alê bibe gelî û şikeftek li wêrê heye, têde biçikilîne û were paşê ezê herim meyzekim ku welê be ezê keça xwe bîdime wî meriyê wusa.' Kesekî bersiva mîr nedâ çumku ew şikeft gelekî bi tirs û xof bû.

Meriyek xort bi navê Hişyar rabû ser xwe û got mîrê min tu rast dibêjî: 'Mîr got 'bi

eniya bavê xwe kim ez rast dibêjim.' Hişyar got 'mîrê min, kanî bide min ezê herim.' Mîr rabû alek dayê û Hişyar ala xwe girt û berî da gelîyê bi tirs û zor çû gelî û hate giha devê şikeftê.

Şev reş û tarî çû heta nivê şikeftê û rahêla kevir ku alê di erdê de bikute. Bala xwe dayê ku dengek ji dawiye şikeftê tête. Hişyar pesna xwe da, got 'ez Hişyar im, bavê Azad im. Ew kî ye' û dest avête xencerê û ji ber xwe kişand û çû da-wiya şikeftê. Bi dengê Hişyar re jinek ji dawiye şikeftê bersiva Hişyar da got 'Ez im.' Hişyar bala xwe dayê ku dengê ji dawiye şikeftê hat, dengê maliya wî bi xwe ye. Got 'keçê ci karê te heye li vir?' Pirekê got 'karê min heye ez hatim, ma tu çima haftî?' Hişyar şaş ma. Got 'keçê şolê min heye ez hatim. Got 'şolê xwe bibêje ka ci ye?' Got 'mesele mîr e.' Hişyar got ka vêca şolê te ci ye?' Jinikî got 'méro, pişti tu çûyi mala mîr, kurê mîr hate mala me û dest avête namûsa min. Min xwe jê xilas nekir. Min rabû rahêste dasa dara û li serê wî bê namûsi da û mîr. Min got, bi xwedê eger mîr bizanibe min kurê wi kuştiye, wê ew jî min û mîrê min bikuje. Min rabû laşê wî qet qet kir û xiste tûr û anî vê derê ku ez bêxime erdê. Va ye tu ji hati. Sedama hatina min ev bi xwe ye.'

Hişyar rabû ji her du çavêñ wê ramûsa û her du hatine ber bi malê. Pişti nêzîkî li Gund

Birayê delal û hevkarêñ REWŞENê

Va ez daxaza we tînime cî. Min hetanî niha ji we tenê hejmara lê ya Kovara weye delal sitendîye. Lê bawer im, hûnê yên din jî bi rê bikin.

Haya me li we pîr-hindîkî heye. Berî çend meha ji BBC hevalek li Êrivanê filmek dikişand ser jîyana hemû kurdan. Ew bi koma xwe ya sînemakişandinê hate mala me jî û li ser mesela kar û barê we ji min pîrsî. Min ji cîqası ku zanibû got û wana hilgirtine nava filmê. Navê wî xorî Ahmed Cemal bû. Ew bi eslê xweva hind e, lê Londonê rûdine.

Hêvidar im ku hûnê çend kasetên stranê Koma Berxwedanî û çend filman ji bi rê bikin.

Daxwazên we hebin, yeko-yeko minra binivisîn, ezê anegorî karebüna xwe bînime cî.

Belki ez piştî çend meha, salekê dinê bême Almanya, wî çaxî ezê we jî bibînim.

Serfirazî û pêşketina we daxaza dilê min e.

Birayê we
Têmûrê Xelîl Mûradov
Serokê Para Aborî ya Rojnama
- RiyaTeze - REWAN / USSR

kirin, Hişyar gote jîna xwe, 'tu here malê ezê herime mala mîrî.' Jin çû mal û Hişyar çû mala mîrî.

Hîna civin belav nebûye. Hişyar silav da û rûnişti. Mîr got 'te bir çekiland ala xwe?' Got 'belê mîrê min.' Bes mîr bala xwe dayê ku Hişyar békêf e. Mîr got, çîma tu békêf i. Belku tu tırsiyayı. Hişyar got, na mîrê min. Ez natırsim û ne tırsiyame. 'Bes eger mîr peymanê bide, ezê bîbejim. Mîr got, peyman ji te re be bêje! Hişyar mese-la jîna xwe û kurê mîr gote wan. Mîr got, ma ev tişt rast e? Got mîrê min, belê rast e. Mîr got aferin ji wê jînê re. Ez çavê wê maçı dikim. Ew kurê ku rabe here namûsa êla min, ew ne kurê min e. Were destê min min keça xwe da te. Hişyar got, Min qebûl kir keça te û min car di da te. Mîr got, ev ci ye. Got mîrê min, ew jîna wanî baş û bi namûs hêja ye ku ez yekê bînime ser û hewî bila keça mîr bi xwe be? Mîr got, Welleh na, keça mîr ne hêjaye neynûkeke wê ye. Hişyar çû mala xwe û kurê mîr çû jîsî xwe.'

Hikayeta min dawî pê hat. Hezar silav li ser şehîdîn Kurdistanê... û bijî PKK, ERNK û ARGK. Bijî serok Abdullah OCALAN

01 - 01 - 1991
Abdullah

Qersandina Ezmanî bû?

Di hejmara 4 a kovara REWŞENê de nameyeke nivisevanekî zîrek û bi zever, heval Perwîz Cîhanî hatibû belavkirin. Di wê nameyê de hevalê nivisevan ditinê xwe li ser rewşa belavkirina kovara REWŞENê dabû xuyakirin.

Hêjâyê gotinê ye ku heval Perwîz Cîhanî hozanvan û çiroknîvis, lêger û vejankarekî pir bizax e û hemî dergêhên çanda kurdî kutaye. Bi zîrekî û bi jêhalibûnî, peyva westiyan di hizra wî da koçer û mîşexit bûye. Lew ji dil û bîrjdî xwe avêtiye meydana çanda kurdî û bûye stêreke geş di ezmanê toreya kurdî da. Hêviya serkeftinê ji wî ta dixwazin.

Werine em da pêkve guh bidine Perwîz Cîhanî ku derheqê peyva 'rewşen' ê da ci ji me ra nivisiye? Perwîz dibêjît: "Gotin û peyva 'rewşen' ê ne kurdî ye, ku we ji bo kovareke kurdî hilbijartîye. Di kurdî de *ron, ronahi, ronakî, rojen* he-ne. Lew ci kurdek peyva 'rewşen'ê bi kar nahînit. Ev peyv (rewşen) peyveke farisî ye, ku li Kurdistana Iranê bi kar dihêt..."

Ji paragrafê diyar dabit ku heval Perwîz wisan peyva 'rewşen' gehîştiye, ku peyveke ne kurdî ye û belku peyveke farisî ye... Me ji xwe re ji wan wergirtiye! Bi vê çendê ji narawestit belku dibêjît ci kurdek peyva 'rewşen' bi kar nahînit! Ev

e bi xwe ji behaneke derheqê gelê kurd da diket. Çimku peyva 'rewşen'ê ya pir belav e û eger bawer nekî fermo pirsyara şivanekî kurd bike! Ger em peyva 'rewşen'ê şirûvekeyn û bizvrinîne, dê diyar bit ku peyveke kurdîya resen û xweşik û delal e û me ji kesî wernegirtiye û cilkê kurdî me bi zorê ne kiriye ber. Weke kak Perwîz bo çûyi... Gelek nivisevan eger peyveka kurdî dibinîn ew peyv her bi wê ramânê di zimanekî dî da dibinîn yekser tingîjîn û bêhna wan xwe li serî milêt wan didit û rastî li ber berze dibit êdî hizra xwe nakin û di pêla şâşiyê werdibin. Bi hizra wan ev peyv ne kurdî ye. Hemî şîyanen xwe terxan dikin ji bo qerisandina ezimanî. Lew iro dibinîn gelek peyvên dartıraşî û leng û nekehî ketine di nav zimanê me da. Her nivîsarek bi keyfa dilê xwe peyva daditıraşin. Kotiren peyva kehî û delal li ezmanê me kûvî dikin.

Perwîz Cîhanî ji ketîye şopa nivîsarek me behis jê kirî. Ewi ji nekir nemerdî işkeka dî li qerisandina ezimanê me zêde kir; dema golî peyva 'rewşen' ne kurdî!

Weki roja nîvro xuya ye, peyva 'rewşen'ê kurdîyeka resen e û hiç girêdanek di gel farisî nîne. Di kurdî de peyva 'rewşen'ê van raman û pêjna didit; ciwanî û zelalî û bêtêm û min ji her wisan ankû kawdan ji didit. Di hindek ciyan da ji ronahî didit weke hozanvanê navdar TIREJ di hozana xwe ya pişeng û bi nav û bang di 'Bilbilê Dilşadî' da bi kar haniye:

Destê tewqeyê iro ku em herdu bidine hev / Çend sal û zeman in di xirabjin em di gel hev / Dunya bi xwe dewran e bizan geh roj e geh şev / Geh tarî û dûman e û geh rewşen û nûr e⁽¹⁾ Ji bo ciwanî û zelalî û bêtêm û mijî, ji ev nimûne hene:

- "Gul rewşa biharê ye." Anku ciwanî û şengiya biharê bi gulan e.

- "Azad rewşa diwanan e!" Mirovekî tira-neker û beşûş û rûges e. Dilen bi xem û kovan dikenînit û tevén xem û jana ji ji ser dilan direvinît Ji bo bar anku kawdan ji ev nimûne heye:

- "Rewşa me kurdan pir xirab e." Anku halê me geleki nexwîs e...

Ji nimûneyen çûyi diyar dabit peyva 'rewşen'ê ji peyva 'rewş' a kurdî hatîye. Ne ji farisi weke kak Perwîz têgehiştî!

Me hîvî heye ku nivîskarêñ me wê xwe ji qerisandina ezmanî bi dûrêxin.

Ji bo helbijartina navê 'rewşen'ê ji, ji bo kovareka kurdî ew bi xwe efrandin e û nîşana jîrekî û bîrtijî û zimanzanînê ye, li cem sernîsîriya kovara REWŞENê. Bi rastî ji iro di govenda rojnamegeriya kurdî da guleka pir bêhîndar û delal e. Her berperêk wê, mîzgîniya bihareka geş didite xandevanen xwe. Me hîvî heye, wê malba-ta kovarê bi ser hemî kend û kospan serkevit.

Muhammed Çelîkî

(1) : Kovara REWŞEN, Hejmar 2, rûpel 3

Derdimandina Jina Rewşenbîrekî

Çavên wê tijî hêstir bûn û ji gewriyê gotin bi zorê derdiketin. Gote min: "xwazî min yekî tirk, ereb, ecem kîribûa û min evî kurd nekîribûa!" Ez mat mam. Çavên min fikirî û keseraka kûr kîşand û çiroka xwe wêlî berdewam kir: "Tîşte ku min dîtîye û ez dibinîm, bila kûçikên serê sergûyan ji nebînin. Ev neh salîn me ne ku em bi hev re zewicandî ne. Me bi dilê xwe ji hevdî kîribû. Wî kurdâyît û yekbûna doza me û doza Kurdistana zeffkîri hildaye ser milên xwe, lê bi kîmanî ji her deh panzdeh rojan carekê destek koteke digîne min. Bila çavên wî birîjen û di mista min kevin! Kurdistana zeffkîri dibîne û zorkeriyêن zordar dibîne û xwe ji serok û berpîrsiyar dibîne û hîna ji baweriya wî ew e ku; jîn jîn e û mîr mîr e! Ev bû heft salîn me ku em li Ewrûpa ne. Mafî min a dakteina bajîr bi tenê tune ye, ku ji xwe re şermeka mezîn dibîne ku têkeve metbexê. Pişta xwe dide qaryolê û qedeha xwe ya vala û li pêş mîvanan ji û bi pozekî bilind bêyî ku hema xwe bilîvîne dest dirêjê min dike û dibêje "dagire!" Heya ku ez nesax bim ji û curna feraqşustîni bi rojan tijî dimîne û hema destê xwe ji navêjê. Ji ber ku ji xwe re şerm dibîne ku mîrek li ber curna feraqşustîne raweste û feraqan biso. Hema qedeha avê ji nade dest min! Serê sibê ji mal derdikeve û dema şîvê vedigere malê. Ji min dixwaze dema ku xirtinî bi kilita derî ket ez li pişt derî amede bim û çakéta wî ji dest bigrim û pê re, divê zû ez

berê xwe bidime metbexê, şîva wî hazir li ser masê dahênim, çayeka germ ji pêginim! Ew maf dide xwe ku bipirse ka dî nava rojê de ci li mal çê bû, ci çê nebû. Lê hema mafê min nîne ku ez bizanibim wî ci dikir, ci ne dikir. Piri caran ji li serî zîmîn bi çend gotinê kurt bersîva min dide û yan ji berê xwe dide televizyonê û çaya xwe vedixwe. Yan ji kovareke faşîstêm tîrkan, ne yekâ kurdî dike. Divê ez li hember vê rewşê, xwe bigrim. Eger ez bêjîm "lam û cîm" wê bibe şer û bi destek koteke kuta bibe. Ci ye? Got, rewşenbîr e, berpîrsiyarê rewşenbîrân el! Vî mîrî mala min li pêş çavên min reş kiriye û dunya li serê min kiriye tara bêjingê! Ez pir dixwazim ji vê jiyanê rizgar bibim, lê hema kurê min ê tek ustîyê min badaye. Li Ewrûpa, her kes li xem û qisawetên xwe ye. Kes ne vala ye guhê xwe bide derd û kulên hevalê xwe yê dinê. Komelên jînên me ji wekî komelên jînên xelkê ji tune ne ku em derd û kulên xwe ji hev re rîz kin û care ji wan re bibînin! Lê bi nezaniya xwe emê hîn ji hev re bikin çîrok û medî hev kin û wisa şebîrikên xwe pê derbas kin.

Ez cûme welêt diya min pîrejinek e. Min nexwest ez derd û kulên xwe ji wê re bikim weqîya ser litirê. Xûşk û birayêñ min her kes li mal û jîn û zarokên xwe de ketine. Yanê serê kesî ji kesi re ne vala ye. Min pir kulên xwe da ser hev û da berhev û min ne da der. Min got bila ez ji jînbîra, xîzm û cîranan re nebîm çîrok. Yê dilê xwe xweş bike ki ye? Dê bêjîn heyf li caniya wê ki ye, "Keçê binêre, ca bibihîse li Ewrûpa ne Xwedê zane mîrén wan çav berdane keçikên ewrûpi!" Kela min

pir radibû û min bi dijwarî xwe digirt ku ez nedim der. Ji kerba bîra bavê re, kurê min destê diya min gez kir, ku eyar di nav diranê xwe de gihande hev. Li zarokên xuşk û birayêñ min dixist, porê xuşka min a canik li destê xwe daland. Rewşâ me ya aborî roj bi roj şûnde diçû. Malxoyê min, xeber li pê xeberê û bi bergeran ji min re dişand ku ew nikare bêyî me bimîne. Ev tîş hemû li serî min bûne kom û ez nesax ketim. Doktor gote min: "Tîşketî te tune ye. Nêxweşîya te nêxweşîye eseyî ye. Divê tu xwe aciz neki! Dema bêhna te teng bibe, du ji van heban vexwe û di hundir de nemîne. Derkeve ber bi derekê hînekî bimeşe, bila bêhna te fireh bibe û xwe bi tîştîna din ve mijûl bike." Xuşka min a canik di malê de şêt û mat ma ji gotinê doktor û bi mesela min agehdar bû. Dilê wê pîr bi kurê min dişewiti, ku çawa ew zarokê weke ferîstan bere bi bere dibe hovek. Şireten xuşka min, rewşâ kurê min û berger û sozîn malxoyê min hîştin ku ez pişî çarpêcî mehan, careka dinê li zîndana xwe' vegerim! Niha va ye tu dibînî, em bi hev re ne. Şer û dawîyêñ me berdewam in. Ev çendeyek e li min nêxistiye. Lê tîşta dişkîne û ez ji heban vedixwim. Derketina bi tenê ji bo min qedexe kiriye. Kurê me ji ji ber şerîn me bi xwe de dimîze. Kurik dibêje bavê xwe. "Eger ez ji dema mezîn bibim, ezê li jîna xwe xînim û roja dinê ji baqek gul jê re bînim!"

Dibêjîn: "Jîn nîvî cîvâtê ye." Engels ji dibêjî: "Tu xêr di wê cîvâtê de nîne, ku eger nîvî wê koleyê metbexê be!" Napolyon ji dibêjî: "Dayik bi destê rastê dergûş û bi destê çepê ji dunya dihejînel!"

Zin



Giriyêñ cenga azadiya kurdan li zindana Amedê

Can dost...

Di welatê me de tarîbûn, bi zanistyeke hemdemî rohnî dibe. Hişyarbûna netewi roj bi roj geşir dîbê û rîkxistina gelî xurttir dibe. Gelê me bi pêşengî û serokatiya xwe ve girêdayî ye. Ev çend sal in şerê serxwebûn û azadiyê bi jehâti-bûneke mezin tête ajotin.

Di 15'ê Tebaxa 1984'ê de, gelê me fişenga pêşîn li hevberî stûlewandin û koletiya xwe ya dûr û dirêj teqand. ji 15'ê Tebaxê û vir de, salên derbasbûyi bi fidekariyê mezîn û berfireh tiji ne. Her weha ji bo salên li pêşîya me, gelê me xurttir amade ye.

Sala 1990'ı, ji serî heya dawiyê, bi rîkxistin û disiplîn, bi lehengî û bi serihandanen serkeftî hatiye dawianîn. Gelê me ew doza xwe ya mafdar û meşrû, li derveyî welat ji, li nav neteweyan derxistiye holê. Bang li mirovatiya pêşverû kiriye, ji bo ku berpirsiyeriyen xwe bi cih bîhênin. Ew dengê ku li hevberî politik û politikayê dijimîn ên qirkirin û jiholêrakirina gelê me, bibihîse û piştigriya gelê me bike. Ew qirkirinê ku li dijî mirovahiyê dihêne kirin, li hevberî wan raweste û dengê xwe bilind bike.

Ew gelê ku iro di welatê xwe de ji kesanya xwe ya netewî hatiye bêparhiştin, zi-


manê wî hatiye qedexekirin, keda wî tête talankirin, ji 7 heya 70 salî, ji bo şerefekê mezîn, ketiye nava şer û cengê. Li hevberî vê ji, dijiminê dagîrker bi hezar awayen şer û cenga taybetî û bi alîkariya piştigîr û hevxebatkarêñ xwe yên împêryalist, iro dixwaze vê cengê vemirîne û gelê me bi carekê qir bike. Bêdengmayina împêryalizmê, hovîtiya li dijî gelê me tête wê wateyê (maneyê) ku, ew ji şerîk û beşdarên dijimîn in.

Gelê me di gundêñ xwe yên şewitandî de, dê sala nuh bi serkeftînî derbas bike. Mirovîn me yên ku hatine koçberkirin (nefi û sîrgûnkirin), bi hesreta erdê bav û kalêñ xwe dikevine saleke nuh.

Dîsan bi hezañan mirovîn me di bin tîrsa lêdan û hingavtinê de derbasî sala nuh dibin.

Lê hişyarbûna netewî û civakî ya gelê me, di gel cenga wî ya mafdar heye. Gelê me dé sala nuh xurttir hembêz bike.

Sala nuh ji bo gelê me û ji bo hemû mirovatiya pêşverû rohnî û pîroz be. Rojêñ azad û ronak yên me hemûyan bin.



İhsan GEDİK

**İhsan GEDİK
Gitîgeha Meletiyê
19 12 1990**

Gum, xuş, gum, xuş...

Ava newalê xuş-xuş
Maran dane pê hev fişe-fiş
Dijminan girte ser me
Henas teng bû, me hilekiş
Wuş! wuş!
Her çar aliye çiyê huziya
Kevir û kuçkêd giran
Li ciyê xwe man
Daketin mîrok û berok
Dîsa, ciya huziya
Hatin, tev de bûne serok
Ji berakî de bûne peya!
Peya, peya, hey peya!
Siya, siya, sîbera kerîya
Keriyêd serdest bi te dicêriya
Milet, kuflét, li aliye dinê, dizêriya
Lo keyayê peya, peyayê keya!

Her çar newalêd çiyê tene hev
Gum, xuş, gum, xuş...
Peya me, ci keya me!
Gotinêd min çêkirî ne
Ci bela me!

Pîsta min waqasî pan e
Ci pira me!

Nexweşiyek e ketiye canê min
Pê pûç bûne pê û pîsta min

Serê min bixwe, naçe ji canê min
Ez dimînim peya heya heya!

Zend û milêd min xurt in
Ê baran e, ne malê kurd in

Loma, bûme peyayê peya
Na, min xwe kiriye peyakî sêwî
Bê gel mame, gel ji min revî

Peyayê peyayê bêbiha
Min navê welat
Xweş e çoleka wiha!

Pêşîya min da bûne ser vê rîyê
Wan serî danî

Vê carê, me hilanî
Derdest e, lê bi me xweş e

Em ling deynin li şonê
Ci ye me ji Xanî?

Çi ye me ji APO?
Em genimê xelkê dikin sapo heta ku...

Dixwin perçak nanê pako heta ku...

Dîlan dikin, dîlîzin, kako, heta ku...

Xebatê dikin, çako, heta ku...

Em parsê ji dikin, malxirabo, heta ku...

Kurt, ji berakî de,

Me xwe firot ji, birako, heta ku...

Me li Çaldîranê motik çêkir heta ku...

Me li sedê nozdan komik çêkir heta ku...

Me li Sêrvî komik çêkir heta ku...

Me li Sîwasê ji xira kir heta ku...

Pîran rabû xwe komik kir heta ku...

Agîrî, berfa me lê bari heta ku...

Ro hilat Nîvro kombûn çê bû heta ku...

Bakur "dûr! dûr!"

Keyayêñ peya

Bûn "yuzbaşî û çawîş"

Bazara wan "ço, his, ço, his"

Peyayêñ keya

Bûn "efser û serheng"

Hevsar bi xwe ve xistîne, "kerêd pêşeng"

Rengerewşenbir; rengeserok

Bazdan, bûn "Monsieur" û "Sir"

Meyîk bûne,

Hin bûne peya, hin bûne mi,

"Diplomasiyê" bi GUR re dikine!

Zikekî têr, yekî birçî! Heta ku...

Anto - 23 09 1989

Ser hildana

Îsmaîl Axayê Şikak - SIMKO

1921 - 1930

Ji dema cenga di navbera osmanî û rûsan de ya ku di salên 1828 û 1829'ê de derketibû, têkiliya kurdan bi rûsan re çêbûye. Ji wê demê vê, ku bi hezaran mirovên kurd, ji ber êrişen leşkerên hov ên tirk, reviyane û çûne wê derê. Bi taybetî ji, gelek kurdên olêzîdî reviyane û di Qafqasiyâ de bi cih û war bûne. Pişti vê rewşê, rûsan vê herêmê xistine bin zora xwe. Kurdên vê derê, bi vî awayî, xwe di vir de parastine. Lê belê, ew piştivaniya rûsan, bi serekên êlên kurdên di wir de, ji bo armanceke ramyarî bû. Xuya ye, ku rûsan di sedsala XIX'ye de, dixwestin Kurdistanê ji xwe re bikine dagirgeh. Dema wê cengê, gelek ji axayên Kurdistanê, ketin bin destê rûsan. Ji wan deman ve, kurdên olêzîd û ermen, ketine bin otorîteya rûsan. Dema ku rûs ketin herêma Bazidê, peyayê kurd Yezdan Şêr, ji bo ku bikaribe tîrkan ji Kurdistanê derîne, dê alîkarî ji rûsan bixwesta. Çawa ku Yezdan Şêr, li dijî tîrkan, rûs ji xwe re kire pişt, her wisan ji, Ubeydullah Nehrî, dema berî serîhildana 1880'ê, pişta xwe dabû rûsan û li diji hovîtiya ingilîzan serî hildabû.

Rohilata Kurdistanê, ji aliyê platforme-ka stratejîki ve, xwedî ciyeka geleki pêwîst e. Ne tenê ji bo kurd û faris û tîrkan, lê ji bo hêzen kolonyalîst ji. Di rohilata Kurdistanê de, her du bajarê kurd ên mezin, Kermanşan û Erdelan e. Dîsan gelekê kurdan, di bajarê Loristanê de dijin, ne bi kêmanî li Azerbeycanê ji. Heya kurd li hinde ciyên din ên Ecemistanê (Iran) ji dimînin.

Pişti avakirina alayên Hemîdî, rûsan, ji demen berê bêhtir, bala xwe dane Kurdistanê. Êdî li ser gelê kurd nivîsar nivîsan-din, nûcayan belav kirin. Di destpêkê de, bi riya hêzen leşkerî, têkili çekirin û di pişt re ji bi riya rojhîlatnasen kurd dane nasandin. Wê demê tîrkan politika xwe ya li dijî kurdan guhartin. Leşkerên xwe, li gel hînek caşen kurd şandin Mehabadê. Gava ku dîtin rûs dixwazin xwe di Ecemistanê de bi cih bikin, sala 1909'ê, hînek leşkerên din xistine rohilata Kurdistanê. Lê, di sala 1907'ê de, meha tebaxê, rûs û Ingilîzan biryar di nava xwe de standibûn ku împeratoriya farisi di navbera xwe de par bikin. Bakur

ji bo rûsan be û başûr ji, ji bo Ingilîzan... Di navbera her du herêman de, herêmeke bêalî hebe.

Di sala 1909'ê de, rûsan piştigirtina şahê Ecemistanê kirin û Azerbeycan û bakurê Ecemistanê bi dêst xwe ve anîn. Wê demê, mîrê kurd Îsmaîlê Şikakî - SIMKO (1875-1930), hebûna rûsan di Azerbeycanê de nepejirand û li dijî wan û hakimên farisan bi 3000 suwaran rabû şer û serî hilda. Lê belê, di bin hîkariya (tesîr) rewşenbîrê kurd, ê bi nav û deng Ebdullrezzaq Bedirxan de ma û nêrîna xwe guhart û bi çavekî din li rûs nihêrî.

Dema ku hîkûmeta tîrkî ya nûavabûyi, ji şerî Balqanê reviya û têkçû (1911 - 1912), di bakurê Kurdistanê de hişyarbûneke newqî çêbû û ramana Kurdistanê serbi-xwe derkete meydanê. Ev yek ji bo Simko ji piştigirî û hêviyeke mezin bû. Hişyariya wî ya netewî xurt kir. Di wê demê de, li bakurê Kurdistanê serîhildanan destpêkirin. Sêrt, Xerzan, Botan, Şêrwan, Mêrdîn, Nisêbîn, Cizîr, Farpîn... Û êriş çûne ser sazî û avahiyên tîrk. Wê demê, Ingilîzan ji, bala xwe mîna rûsan kişandin ser Kurdistanê û xwestin tevgera kurdî bi dest xwe ve bînîn.

Leşkerên tîrk, bi hovîti şoreşa kurdan pelîxandin û wêran kirin û kuştinê zora wan bir. Gelekî mîrxasên kurd bi serbilindî çûne ber kîndirên daleqandinê. Melle Resûlê Qehreman, dema ku çû ber benê darvekirin got: "Baweriya min heye ku dê gelê kurd ji zordariya tîrkan azad bibe".

Em vegereine ser Simaîl Axa. Simko di jiyanâ xwe de, ji gelek bûyerên li herêmê poside wergirt û bi taybetî ji, bi kuştina birayê wî yê mezin Cafer Axa. Birayê wî bi destê Moxtî Şemsê, ku wê demê qerâle Azerbeycanê bû, hate kuştin. Moxtî Şemsê kurê Şahê Ecem bû. Cafer Axa, serekê êla ŞIKAKAN bû. Şikak yek ji êlên Kurdistanê yên bi nav û deng e. Dema damezrandina Komera Mehabadê, ev êl xwedî 40 000 mirov bû. Di navbera bakurê Silêmanî û rojavayê gola Ürmîye de, bi war û cih bûye. Şikak ji 5 paran e; şikak, şikoftî, mukrî, şawêlî (Şah Weli) û Botan. Weke ku dîrokzan dibêjin, ku zimanê mukriyan zimanê dewleta Mîdî bû. Ela Şikakan ew nexşen li ser diwarêن bajarê Pîrsîpolê, ên ku

berî zayînê, bi 600 salan, yên hexamenşîyan bû û niha li bakurê bajarê Şîrazê ye, tîne bîra mirovî.

Ji ber ku şahê ecemistanî ji kurdan ditirsîya, sala 1907'ê birayê Simko, Cafer Axa, bi riya karbidestêن Tebrîzê, vexwendiyê hevdîtinekê kir. Li wê derê, li Tebrîzê, bi xinîzî Cafer axa kuştin. Ev bûyer bû sedemeke ji sedemên rabûna Simko. Lê ne weke ku dîrokzan dibînin; tenê tolehildan û xwînrêtin di mêjiye Simko de hebûne. Simko Axa, nola kurdîkî gernas dît, ku eger toleya birayê xwe hilnede, wê di rojîn dahatî de wî ji bikujin.

Ebdulrezzaq Bedirxan ê ku di maleke kurd a welatparêz de mazin bûbû, rewşenbîrekî gelekî mezin bû. Têkiliya wî bi hozanên mîna Hacı Qadir Koyî, Evdilhîmê Hekarî û gelek kêsên din ên zane re hebû. Simko axa bi çavekî mezin lê dinêrî. Pir jê hez dikir, lê li ba tîrkan weke dijmînekî dihate naskirin. Hevdîtina Simko axa û Ebdulrezzaq, hevkariya zor û zanînê nîşan dide. Ebdulrezzaq dostê bavê Simko bû, hîkariya (tesîr) xwe ji zû ve li Simko axa kiribû.

Dr. Celîlê Celîl tîne ziman, ku di salên 1912 - 1913' yî de Simko axa li gel Ebdulrezzaq Bedirxan komeleyeke kurdî ji bo hînkirinê li bajarê Xoyê ava kiriye. Armanca komeleyê; avakirina dibistanan, derhanîna kovar û rojnameyan û serokê vê komeleyê ji Ebdulrezzaq bûye.

Ebdulrezzaq pir dil dikir ku têkiliya kurdan bi rûsan re çêbike. Bi riya komeleyê, bi hînek rojhîlatnasen rûs re peyiî. Ji wan xwest ku çenda kurdî, toreyâ gelê kurd wergerînine ser zimanê rûsî û yê ewrûpî. Ji bo ku komele xurt bibe Simko alîkarî di-civand. Û bi van peran komele bi pêş di-xist. Gava ku komeleyê dibistan vekirin, nûnerên evrûpiyan bi dengekî bilind li dij sekinin. Gelek gotinê pîs û dijûn li ser Simko axa derxistin û ji xelkê xwestin ku kes peran nede Simko. Nokerên Tirkîyê û yên Ecemistanê bi hev re geriyan û li dijî Simko bangeşî (propaxande) kirin û dixebeitin ku kurdan li dijî Simko rakin... Digotin "Simko dixwaze kurdên misilman bike filleh!" Ebdulrezzaq û Simko ji bo destpêkirina xwendinê ji xelkê re axîfî nameyek bi navê gelê kurd hinartine Qeyserî rûsî, bersiv ji aliyê Wezîrê derive yê rûsî ve



hat. Tê de vekirina dibistanê hate sipas-kirin. Bi rastî dostaniya Ebdulrezzaq û Simko ji demeke zû ve ye. Bavê Simko [Mihemet Axayê Şikakî - REWSEN] yê ku bi Ebdulrezzaq re demekê li Şanbolê mabû, li gel wî hatibû girtin û ajotinî (sirgûnî) Trîpoliyê (Trablûsê) bûbû. Li wir jî bavê Simko axa di bin şkencê de mir. Ji destpeka sedsala bîstê ve, Ebdulrezzaq roleke mezin lîstiye, bê guman pîlaneke wî ji bo serxwebûna Kurdistanê hebûye.

Berî ku cenga cîhanî ya yekem destpê bike, rûsan hêza xwe di bakur û rojavayê Ecemistanê de pirtir kiribûn. Baweriya wan bi Ebdilrezzaq û Simko axa re jî seda-sed dijî xeyal û daxwazên tîrkan bûn. Li ser ve bingehê Simko bû berpirsiyare parêzgeha Sînorê, ya ku li Katorê bû û tê de cebîlxana rûsî hebû. Rohilatnas û diplomatên rûsî yên mîna Çêrkov, Gordîfskî û Hekîmovîc têkîf, pêwendî û bawerî di navbera kurdan û rûsan de peydakiribûn. Çi bi nivîsên xwe û çi bi gotin û weşanên çandeyî yên li ser kurdan.

Ji aliye dî ve, Şêx Taha jî yek ji kesênu roleke mezin di jiyan û xebata Simko de leystiye. Ew jî ji malbata Şêx Ubey-dullahê Nehrî ye. Şêx Taha xebitiye, ku têkîf û pêwendiyêñ kurdan bi îngîlizan re hebin û piştî cenga cîhanî ya yekemîn geleki caran li gel îngîlizan rûniştiye û xwestiye, ku alîkariya wî û Simko axa, bo damezrandina dewleteke kurdfî bikin. Şêx Taha jî, mîna Ebdilrezzaq Bedirxan ji bo vekirina komeleyeke bi navê Hogirî li Rewandizê xebitiye.

Di dawiya sala 1912'yê de gava serokê leşkerê tîrk derbas bûye rohilata Kurdistanê, bi armanca bicihkîrina Ebdilrezzaq Bedirxan û şopandina wî, tirseke mezin ketiye dilê wî, gava ji bajarê Xoyê biçe Katorê. Ji ber ku leşkerê Simko axa di wê herêmê de xurt bû. Gava ew bi şâşî bi ser mala Simko axa de hatiye. Li "Çiyarî-Kala", nizanî bû çi ji bo Simko axa bibêje. Di cih de hêvî kir, ku wî bigihînine sînorê "Tirkîyê". Simko axa bi hiskî bi wî re axîf û ji tîrkan xwest, ku careke din derbas nebîne welatê wî.

Li Urmiyê filleh hindik bûn, taxeke bajêr ji wan bû. Di dîrokê de, bi musilmanan re mîna hevserên sirûşî dijiyan û bazarvanî dikirin. Heya ku hikarî û tesîra îngîlizan berî cenga cîhanî ya yekemîn di herêmê de peyd bû. Ji wê demê ve îngîliz xebitîn, ku di nava aşûr û kurdan de dijminahîye peyda bikin.

Îngîlizan her û her xwe mîna parêzvanekî fillehan di koloniyêñ xwe de didît û bi wî rengî maf dida xwe bo mêtina xêr û bêreën welatê dagîrkîrî û êriskirina ser wan.

Zordariya aşûrên, ku xwe kiribûn des-tikê kêrê ji rûsan û şahê ecemî re, giha bû qonaxeke mezin. Dibêjin ku suwarêñ wan kurd digirtin, rêz dikirin û ji wan dixwestin bibezin. Ën ku 20 gavan bibezin wê sed tumenan bistînin. Ën ku 40 gavan bibezin, wê sêsesd tumenan bistînin. Lê yên ku bêhtir bibezin, wê çarsed tumenan bistînin. Gava mirovêñ kurd di-bezin, ku tumenêñ xwe bistînin, serên wan dihatine jêkirin û hesinekî, ku di êgir de sor bûbû didane ser qirkêñ wan ên bê

serî diman. Navê wê lîstikê kiribûn "bezîna kurdan".

Di destpêka cenga cîhanî ya yekê de, hêzên tîrkî yên ittîhadî di rojhilata Kurdistanê de cih girtibûn û hînde êlîn kurdan jî bi aliye xwe ve xistibûn. Armancêñ xwe yên ramyarî (siyasi) bi riya cuda-hiya "mezhebi" ya, ku di nava kurdan û farisan de bi cih anîbûn û hêzên xwe yên jar bi piştigirtina kurdan xurt kiribûn. Lê pir dirêj nekir, piştî 5 mehan rûsan heyânî Urmiyê ji dest wan girt û fillehîn, ku ji ber tîrkan dinalîn, ji rûsan re bûn piştîvan û çavdêri ji wan re kirin. Rûsan baweriya xwe bêhtir bi wan dikir, ne bi kurdêñ, ku piraniya wan musilman in. Simko axa û hinêkîn din hatin girtin û wan şandin Gurcistanê. Kurdan dijî vê yekê serî hildan û çende êlîn kurdfî, bi hevkariya çavdêrekî Alman, êrisî ser hêzên rûsî kirin û nehîstîn, ku rûs pêş ve bêñ. Berxwedana wan êlan 88 mehan dirêj kir. Ji ber vê yekê û ji ber ku li Hemedanê 10 000 serbazêñ kurd di nava 18 000 ên leşkerê tîrkî de hebûn, rûsan pîlana xwe beranberî kurdan gu-hartin. Simko axa berdan û xwestin, ku bi wî re têkîf û pê-wendiyê çebikin.

Di cengê de ci hêza netewî an oldarî bi serê xwe nema. Fillehîn Urmiyê xwe dane rex biyaniyêñ mîna îngîliz, rûs û fi-renciyen û gelek musilmanan xwe dane rex dewleta osmanî. Kolonyalistên Euro-payê bi mebesta (qesda) şikandina hêzên osmanî, ne tenê fillehîn herêmê ji bo xwe kiribûne millîs û pêshêz, bi wan re gelek afrîkî û Hinistanî jî anîbûne ro-hilata navîn. Bi riya misyonê (mission)



dibistanêن fillehan li Hekarî û Reşqoçanê vekirin û ji aliyê konsulê îngilîzi yê Wanê ve hatin xurtkirin û parastin. Mîsyonerên emerîkî ji sala 1820'ê de di Kurdistanê de bi cih bûbûn û ji xwe re, bi taybetî li Tebrîzê, li kesên oisost û "çav-vekirî" digerîyan. Biyaniyan di nava müsilmanan û fillehan de dîwarekî dîjînahiyê peyda kirin.

Berî wan mîsyonan, têkiliyên müsliman û fillehan li Hekarê û Behdînan ci caran pîs nebûn. Her wisan ji dema Şêx Ubeydullahê Nehrî û Şêx Evdîselamê Barzîn de... Eve ji ji aliyê çend rohilat-nasên rojavayî ve hatiye bi cih kirin. Lî ji destpêka cenga cîhanî ya yekê ve fillehan ramiyariyeke ber bi Europa û Rûsiya, bi rê ve birin. Osmaniyan ji ji hêla xwe ve, bi navê İslâm û xîlafetê kurdêñ müsliman dij wan tûj kirin. Ji aliyekî dî ve ji, têkîli dî nava faris û kurdan de ber bi nebaşîyê ve çûbû. Bi taybetî piştî kuştina Cafer axa birayê Simko axa.

Konsulê emerîkî Gordon Paddock ku li Tebrîzê bû, têkiliya wî ji bi Simko axa re çêbûbû û ji bo wî 5 000 Dollarên zîvî anîbûn, ku Simko razî bike; ji bo rîdayîna mîsyona fillehî di Kurdistanê

de. Ew li ser Simko wilô debêje:

"Simko mîrekî ciwan, baş û jîr bû. Di dardoreke zorê de mezin bûbû û kuştina birayê wî yê, ku bi deh salan ji wî mezintir, ji bîra wî nedîcû."

Di payîza sala 1915'ê de 25 000 filleh ji herêma Hekarî ji ber hêrişen tîrkan reviyân û ber bi Urmîyê ve hatin. Di riya xwe de, bi zora 5 000 tifingên rûsî û 6 000 suwar û peyayan, mal û gundêñ kurdan talan kirin. Lî gava ew gihane Urmîyê, rûsan ji wan xwestin, ku dijî tîrkan şer bikin. Mîsyonariya emerîkî ya, ku ew xistibûn bin basîkên xwe, rê dane wan, ji bo parastina berjewend û daxwazîn emerîkî di herêmê de, ku li dijî müslimamam şer bikin.

Hesen Erfa yê, ku wê demê serlekereki faris bû û dijî Simko şer kîribû, dibêje, ku fillehan dixwestin, bi piştgirtina rûs û emerîkanan û bi rîberiya serokê wan Mar Şamon û Petrus axa, li Urmîyê û Salmasê dewletek ji xwe re ava bikin. Û wilô em têdîghînin, evana bi soz û pîlanêñ biyaniyan habîbûn xapandin. Ji ber ku ciyê ku dixwestin têde dewletek ji bo xwe çêbîkin û ci caran wê kurd bêdeng li hevberî bûyereke wilô nemînin. Simko heyâ wê

demê li dora xwe temaşa dikir û dizanî, ku wê rûs û emerîkiyan li hevberî rawestana cenga cîhanî mabû. Li ser bingeha vê ramanê têkîli û pêwerdiyêñ xwe bi Mar Şamon re xuri kir ku nehêle biyani kurdan û aşûran berdine hev û li dijî hev û din bi kar bînin.

Di destpêka cengê de, sala 1914'ê Simko axa, Ebdilrezzaq beg û Şêx Taha Nehrî (kurê Şêx Ubeydullah Nehrî) li gel hikûmeta qeyseriya rûs, peymanek girêdan û bi hev re soz û peymana xebateke hevkar ji bo avakirina dewleteke kurdî dabûn. Ev peyman heyanî serketîna şoreşa Oktoberê mabû. Lî piştî serketîna şoreşê wan dît ku şoreşa teviya rûsiya ne amade ye, ji bo bi cih anîna wê peymanê. Lewma serekîn kurdan vegerîyan Tirkîyê. Ebdulrezzaq Bedirxan di cih de hate girtin û li Müsilê berî ku tiştekî jê bipirsin hate dardekirin. Seyid Taha û Simko nehatin girtin.

Weke em dizanîn, di dîrokê de, dijminahiyeke mezin û dirêj her di nava dewleta osmanî û qeyseriya rûsî de hebûye. Lewma rûsan ji xwe re standina Kurdistanê ji dest tîrkan kiribûn armanc û ji bo wê armancê xebitîne. Di despêka sala 1926'ê de leşkerên rûsî pareke mezin ji Kurdistanê, heyanî Rojavayê Erzin-canê û başûra Rewardîzê kirine bin destêñ xwe û xebateke mezin nîşan dane. Ji bo standina Müsilê, bi riya herêmê Barzaniyan û Xaneqînê. Lî ji ber ku li Rûsiya serhildana karkeran destpêkir, hêzên rûsî xwe ji Kurdistanê bêdil û bêmiraz vekîsandin.

Basil Nîkitîn dibêje, ku di dawîya sala 1917'ê de mirovek hate baregeha wî ya konsulî li Urmîyê. Ew mirov bi navê Komela Serxwebûna Kurdistanê axîvî û nameyek ji aliyê Şêx Taha ve ji bo konsulê rûsî ani, bi mebesta hevkariyê dijî tîrkan, ku Kurdistan were rîzgarkirin. Li gorî dîtina Basil Nîkitîn, Şêx Taha yê ku ji zîndanê Rûsiya qeyserî reviyaye, kurê birayê Şêx Evdîlqadîr e. Şêx Taha heyanî sala 1917'ê li Stanbolê mabû. Piş re koçî Mekkê kir cem şêxê Ereban Husêñ. Di sala 1925'ê de tîrkan ew li bajarê Diyarbekirê bi dar de kirin.

(...)

Di 08 01 1918'ê serokê Amerîka Willson li pêş kongiresa emerîkî got, ku pêwîst e ji bo hindikiyê netewî yêne tîrku di çarçiva imperatoriya osmanî de dijîn, bergeha stadina maftûn wan ên bêkemânî di serxwebûnê de were dayîn, bêyî ku kesek destê xwe têxîne nav, an ji hikariya xwe li wan bike.

Ev banga Willson, bi du sê armancan bû, yek ji wan li hevberî banga Şoreşa Oktoberê ya bo maftûn gelan bû, dido, Ji bo tûjkirina pevçûna nava gelên dewleta osmanî bû, mîna Ereban, Kurdistan û netewîn din. Sisê, ji bo xurtkirina habûna Amerîka di herêma Rohilata Navîn de.



Lê çend bibe, nebe, vê bangê dilê kurdan tiji hêvi kir, ku li derveyî herêmê dewlet û mirov hene, wê alîkariya serxwebûna wan bikin. Bi rastî, dîrok ji bo kurdan roj bi roj tarîfir û restir bû. Kuştina Mar Şamon ji, li ba welatêñ fillehan nav û dengê Simko û yê tevgera kurdî, rreş û tenî bikira. Lê gava bangêsiya dijmin xurtir be, ew dikare hemû rastiyan dîrokî û bûyeran biguhêre û kurdan her û her mina hovan diyar bike.

Di mêjuya 30 10 1918'ye de cenga cihanî ya yekê rawestiya, leşkerên tirkî ji Ecemistan û Qefqasiya derketin û li rojhilata Kurdistanê valahiyeye ramyârî peyda bû. Ji bêhtirî 200 serbazên Iranê ci hêzen din nebûn. Diyar dikir ku Simko axa di herêmê de ji her kesî bi hêztir bû. Farisan dît ku bi leşker û cengê nikandin tişteki dij Simko bikin. Berpirsiyarê Azerbeycanê pakêtekî "Şîranî" li ser navê

bapîra Simko ji bo wî şiyandin. Tê de bombezey hatibû veşartin. Gava teqiya birayekî Simko hate kuştin.

Simko axa bîryara xwe da, ku bilive û wilo di destpêka sala 1919'ye de êrisi ser Urmiyê kir û daxwaza Kurdistanêke serbixwe kir. Kurdêñ Hekarî ji alîkariya wî kirin û di demeke kin de hêzên wî li teviya rojhilata Kurdistanê belav bûn.

Sala 1919'ye Bill xanimê ajana îngîliz, li ser Simko nîvîsandiye, ku wî bîryara xwe daye, bi qasî neynûkekê ji malê fillehan, ewê ku di cengê de ji wan standiye, li wan venegerîne û dibêje ku baregehê Simko di çiyayêñ bilind de bû û ci caran kesek di wir de nikare zora wî bibe. Bi bîr û baweriya Bill xanimê, dijminahiya Simko ji Ecemistanê re ye. Bi ser vê yekê ve ji, Simko, li gorî dîtina Bill xanimê ditirse, ku Ingîliz tola fillehan ji wî vedin û lewma ew xwe nêzîkî tirkan dike. Bill xanim dibêje, ku Şêx Taha di ba-

kura Rojhilata Kurdistanê de, ji alîyê ramyârî û rewani ve mirovekî hézdar û berçav bû. Serhildana malbata wî sala 1880 li Urmiyê bi wî navekî mezin bû û dêrîna (mulkê) wî jî pir bû. Şêx Ubeydullah li Stanbolê li gel kurê Evdilqadîr girti bû. Kurê wî Evdilqadîr berpirsiyarê partiya kurdî ya netewi bû. Kurê wî yê din Siddîq êrisi biribû ser fillehan û zordarî li wan kiribû. Di rewşekê wilo de Şêx Taha dikaribû, têkiliyên xwe biparasta almanan ji. Gava rûs ji wî xeyidîn mala wî li Nehri hilweşandin. Ew ji alîyê malbatî ve merivê Simko ye.

Şêx Taha di roja pêncê meha gulana sala 1919'ye de, ji bo musteşarê îngîliz yê Kerkükê dînivise, ku Simko ji Elîxanî mîrê bajarê Xoy hezname û dixwaze wî ji wir derxîne. Gava sermîriyê giştî yê bajarê Tebrîzê daxwaza Simko nepejirand, Simko êrisi ser Urmiyê kir û Erşed El-Melék kire sermîriyê bajêr. Dibêjin, ku Simko teviya hêza leşkerî ya farîsi di bajêr de (Li dora 600 cendirme bûn) qırkir û kesek ji wan cendirman sax berneña. Bi ser de ji komeka mezin ji misyoner û ajanen emerîki kuşt. Sermîrê Tebrîzê xwe nêzîkî netewperestên tirkan kir, ewen ku hinek serhêzên xwe ji bo navberiyê şandin Urmiyê û di wê demê de, sermîr, guman kiribû, ku ewê zora kurdan bibe, ji Mihabadê ve êrisi kir. Destpêkê kanîbû bi hêzeke ji 300 cendirman ji Karandîrifê pêşve biçe. Lê Simko ew şikandin û ji wan herêman bi dûr xistin. Ji Mihabadê ji hêza farisî ber bi herêma Soldozê ve reviya. Simko da pey wan cendirman. Sermîr ji Salmasê ve êrisêke din bi 2000 cendirman û suwarên Qozaq anî ser kurdan. Lê ew êrisi ji hate şikandin û kurdan çekêن wan standin. Dema ku sermîr dît, ew nikare zora kurdan bibe, rabû careke din serhêzên tirkan bi pilan şiyandin ba Simko.

Şêx Taha dibîne, ku di nava tirkan û sermîrê Tebrîze de peymaneke bi dizî heye. Cigir nûnerê giştî yê îngîliz li Raniyê nameyeke bi dizî ji serokê xwe yê li Suleymaniye re dişine. Têde dînivise, ku îngîliz bixwazin an nexwazin, navê Simko mezin dimîne û di teqretêni dijî îngîliz de, ji alîyê bangeşîyên dijî dewletê ve, mîna mirovekî namdar navê wî tête nimandin.

Wilo Bill xanimê di dermafê Simko û Şêx Taha de li ba serokê xwe dipeyiye û ji berpirsiyarê xwe re dînivîş:

Xwuya dike ku daxwazên Şêx Taha ji îngîlizan ev bûn:

1. Derxistina fermana beratkirina giştî li Kurdistanê.

2. Vegerandina fillehan nava kurdan û welatê wan divê kurdan nexîne bin zordariya ermenan an ji nastoriyan

3. Divêt sermîriya îngîlizî, ji bo alîkariyekî mîna ya ji bo Iraqê, ji bo gelê

Kurdistanê re ji amadebe.

Lê bi rastî soz û peymanê îngilîzan tev derew bûn û tenê dixwastin baregehên xwe di Kurdistanê de xurttir bikin.

Cigîrê konsulê îngilîzan li Hemedanê ji bo wezîrê karbi-destê îngilîzî li Tehranê û ser-karê giştî yê li Bexdadê, di mîjuya 18 8 1921'ê de dinivise; ku wî ji jîyedereke durustbihîstiye, ku Simko nameyek bi êlîn Kurdistanâ Iranê hinariye. Têde pêş-niyar dike, ku ji bo rûxandina zordariya ser-mîriya frisî rabin û soz daye wan, ku dewletereke biyani wê qâlikariya wan bi-ke. Elîn kurdan ji bi pejirandina pêşniyara wî mijûl in. Wê civîneka serekên êlan di demeka nêzîk de çêbibe. Ew ji berpirsiyarê xwe yên îngilîzî dipirse, ka tiştekî dijî Simko bikin an na. Wezîrê îngilîzî, ji cîgîrê konsul dixwaze, ku ew xwe bi-gehîne serêkên êlîn kurdi û wan ji Simko cuda bike.

Piştî rawestana cenga cîhanî ya yekê, kongira aştîyê ya Sêvres çardeh xalêن bernameya serokê emerîkî Wilson biryar best. Ü li ser vê bingehê û li gorî bendêن vê peymanê, gelê kurd ji bo serxwebûna xwe liviya.

Rast e, ku rohila- ta Kurdistanê neketibû bin biryaren peymana Sêvresê, lê rabûnê gelê me li bakura Kurdistanê û serhildana Şêx Mehmûdê Berzincî (Binêr REWŞEN hej.3. sal 1989) li Suleymaniye, dijî kolonyalistê îngilîzi, têhna xwe ya şoreşin dabû teviya welatê me û hêviya standina mafê netewî li ba Simko xurtkirin.

Piştî peymana Sêvres, Simko lêdaneka mezin li artêsa farisî xist, ku êrişeka nuh bi 2 000 serbazan biribû ser Mihabadê. Faris reviyan û li şûn xwe du topên rûsî yên giran, gelek çek û tifingan hîstîn.

Di sala 1921'ê de bajarêñ Mihabad,

Baneh, Marage û Miyawinduwab ketibûn bin ala Simko. Heyanî sala 1922'ye serketinê Simko li pey hev dihatin û peymana Sêvres ruh û xwîn berdabû damarên tevgera kurdi, ku civata navnetewî mafê gelê kurd di serxwebûnê de pejirandiye û mafdar dîtiye.

Di mîjuya 21 2 1921'ê de, Riza Xanê, ku berê serekê kozakan bû, êriş anî ser Tehranê, Shah Ehmedê, jar bûbû


û fillehêñ din, di Kurdistanê de zordariy- eke hov pêk hanîn û bi taybetî dijî kurdêñ, ku serekê wan Simko bû.

Di wan deman de, Simko xwe diteverand, ku dan ûständinê xwe yên diplomati berpahn bike. Ne tenê bi îngilîz, bi tirkan û biyaniyê din re, di nava kurdan de ji, bi serekên êlan re û bi hemû kesêñ, ku wî dikarî rî ji bo têkiliyê bi wan re bidîta.

Simko dizanî, ku armanca tirkan di Kurdistanê de, tükirina nakokiyê di nava êlîn kurdan û sermîriya Iraqê ye û standina hemû hebûnê kurdan bi riya bac û talanê ye. Lewma wî digot, ku wan kesêñ hatine Kurdistanê û bi taybetî li Kanî Reş û Rewandizê ne, reviyane, ew nokerên tirkan in. Simko dizanî ji, ku li ba îngilîzan, tirkan, fari- san û rûsan bawerî bi wî nîne. Lewma digot: "Ez dizanim, ku di têkiliya bi hukmetan re, navê min bi xiyanet û rovîtiyê ve girêdayî ye."

Berpirsiyarê ramyarî (siyasi, fikri) yê li Suleymaniye, di wê salê de nameyekê bi dizî ji bo serkarê giştî yê Bexdadê dişîne. Têde dibêje, ku Dimko wilô ye: xortekî çalak û têwerkir e. Serpêkan bi cih kirin, ku mirov nikare pişta xwe bide wî, lê ji aliye kî dî ve wî nikarî wê cihê xwe yê bilind bi- standa eger ne wiloba. Rast e ku wî gelen serketin dijî sermîriya farisî pêkhanîne, lê xuya nake, ku wî serkefti-

neke mezin bi cih anîye. Bê guman ew têgîhfîsiye, ku serketina wî bi hêza êlî tenê, heyanî li hevberî sermîriyeke jar ya mîna Ecemistanê ji ne hesan e. Ev berpirsiyar dibîne, ku bê guman eger îngilîz piştgirtina Simko bikin, wê bikare destê xwe deyne ser wê herêmê û dibe ji, ku rojavayê Rewandizê ji bistîne. Mebesta (meqsed) wî ew e, ku di nava kurdêñ Simko û yên Şêx Mehmûdê Berzincî de



dijheviyekê peyda bike.

Em dibînin, ku çu caran maf û azadiya kurdan di dilê îngîlîzan de cih negiribûn. Eger tiştêkî wilo heba, wê wilo bi hişki û dijmîni li hevberî rabûna. Şêx Mehmûd ra newwestiyana. Wê welatê me bi peymana Sayks-Picot parce parce nekirana. Lê dîsan jî mîna iro baweriya hinek rewşenbirêñ kurd bi împiryalîstan hebû.

Berî vê yekê jî, îngîlîzan nerindî û neqencî li dijî kurdan kiribûn û bêbawerî li ba kurdan peyda kiribûn. Bi derwa vegerandina aşûran cih û warêñ wan, di meha gulana 1920'î de, îngîlîzan bi hezaran fillehêñ Asûrî birêxistin, bi mebesta standina Urmiyê ji destêñ kurdan, Riya ku hatibû pêşniyarkirin, ji Akrê di nav herêma Barzanîyan a ciyayî re diçûne Gewre û ji wir jî bi hesanî ewan diçhiyan riya Ûrmîyê. Pîlana Petrus axa, serokê aşûran, ew bû, ku herêma girêñ biçük ên li ser sînorêñ tirk-faris bistîne û ji wir ve, destê xwe deyne ser herêmêñ din.

Di mêjuya 23 8 1922'yê de, Riza Xan (pişt re bû Şah) leşkerekî mezin şiyande ser Salmasê. Bi alîkariya leşkerê tirkî yê, ku berê dijî eceman bû, zerareke mezin gihande hêzêñ Simko.

Piştî vekişana Simko ji nav gundê Dêrê li bakura Hewlîrê, Major Noel hêvî dikir, ku hêzêñ kurdi yên Şêx Mehmûdê Berszncî, Şêx Tahayê Nehri û Simko axa, bi pilaneke hevkariyê dijî leşkerê tirkî bihajo. Lê di wê demê de, leşkerê ecem, bi alîkariya hêzêñ tirkî herêmêñ kurdi ji Dilman heyanî Bane, yên ku Simko rrizgarkiribûn ji dest Simko girtibûn. Simko û Şêx Mehmûd daxwaza Major Noel nepejîrandin. Hema Şêx Taha bi ya îngîlîzan kir, êrişî ser rewandizê kir û zerareke mezin giha hêzêñ wî û pir kurd hatin kuştin.

Di salêñ 1922-23'an de, alîkariyekî mezin di nava leşkerên ecem û yên tirk de, li dijî kurdan çêbûbû û wilo rewşa Simko ber bi nebaşiyê ve diçû. Serekê leşkerê ecem General Ebdullah Tihmasip bi alîkariya êlêñ Azerbeycanê yên koçer kanibû hêzêñ Simko axa hêdî hêdî ber bi sînorêñ Kurdistana bakur ve bida. Hemû xebatêñ Simko, ku hêzêñ kurdi ber hev û din bîne, wan bike yek û dijî leşkerên tirkan û farisan têxîne qadêñ şer jar bû bi şûn de ketin. Bîzava, ku bi riya Şêx Taha dihat kirin, bi mebesta standina alîkariyê ji îngîlîzan têkçû. Serketina Ataturk di peymana Lozanê de, lêdanekî mezin li teviya tevgera azadîxwaza Kurdistanê xist. Xweya bû ku hêzêñ ewrûpî dixwestin Ataturk di hêrêmê de li gel Riza Şah û Melê Husêñ ê Ereban pêş ve biçin, ji ber ku sôd û berjewemden îngîlîzan diparastin û firehtir dikirin.

C.J. Edmonds, piştî hevditinekê bi

Simko re, dînivise ku Simko, xwest bi tirkan re têkiliya xwe bibirre. Ewêñ ku di destpêkê de ji wî hez dikirin û li dawiyê dij wî rawestiyân. Ew gelek şâş mabû, ji ber rawestana îngîlîzan, li hevberî fîrsêñ, ku bi dirêjahiya sînorê li gel tirkan kar di-

Gava Simko dît, ku îngîlîz ci caran guh nadîn wî û gelê kurd, bîryara xwe da ji bo çûyîna Suleymaniye. Sala 1923 Ismaîl axa - Simko çû bajarê Suleymaniye û li wir têkîlî û dan û standinekî ramyari û bîrayetî li gel Şêx Mehmûdê Berzîncî xurtir kir.

Sala 1925'ê Riza Xan Ecemistan zept kir û xwe kire Şahînşah. Zordariya xwînî dijî kurdan bû ramyariya dewletê û ji ber ku serhildana Şêx Seîdi Pîrânî li Diyarbekirê berpehn bûbû, şahê diktator ji yekbûna kurdêñ Ecemistan, Iraq û Tirkîyê tîrsiya bû. Lewma hêvî dikir, ku bi darê zorê delîv (fersend) nede Simko ku hevgirêdan bi rabûnêñ li deverên Kurdistanê bike. Şahê Ecemistanê kuştina Simko axa ji xwe re kiribû arman-ceke gîring û mezin.

Bi meha çiriya pêşin a sala 1926'ê, Simko bi hêza xwe ya mezin derbasî herêmêñ kurdi yên ku di bin karbidestiyen Iraqê bû. Sermîriya Iraqê nikarî bû ew ji herêma Rewandizê derxista û heya Gulana 1928'ê, nûnerê giştî yê îngîlîz li Bexdadê telegramek ji bo wezîrê dewleta îngîlîz yê berpirsiyare kolonîyan hinartîye. Têde dibêje, ku kurd bizava pêkhanîna peymanekî kurdi ji bo avakirîna dewleteke serbixwe dikin. Eger pilanêñ rûsî yên ji bo parçekirina dewleta farisî biserkevin, eve ji bo me diyar dike, ku gotinêñ Eagleton dermafê Simko de nerast in. Gava di nîvîsara xwe ya bi navê "Komara Mihabad" de dibêje, ku Simko ji bo daxwazêñ xwe yên êli dijî dewleta farisi bû, ne ji bo serxwebûna Kurdistanê.

Simko axa derbas bû bakura Kurdistanê. Li wir jî hêzêñ tirkî êrişî ser hêzêñ wî kirin, lewma vegeeria başûrê Kurdiatanê. Dît ku îngîlîz, ecem û iraqîyan bi hev re peymanek oli dijî wî peyda kirine û bîryarek ji serekê wezareta iraqî re, di mêjuya 14'yê tîrmeha sala 1927'ê derket. Têde hatîye nîvîsîn, ku sermîriya iraqî, berê û niha jî, ramyariya standina çekan ji hemû êlan bi kar haniye û bi kar tîne. Ji bo hemû iraqîyan hilgirtina çekan di hinek herêman de bê destûr qedexe ye. Û ev herêm hêdî hêdî hatine firehki-riñ û bi riya xurtkirina hêzêñ cihber ji bo pêşvedana vê ramyariyê dikare armanca xwe bi cih bîne. Hema pirsa standina çekan ji êlan bi riya êrişîn leşkerî, eve ci encamên baş nade. Sermîriya iraqî bawer dike, ku pêşvçûnen iraq û Ecemistanê nehiştin, ku têkîlî û navbera Iraq û Ecemistanê de çêtir bibin. U tiştêñ ku ji tunebûna "Ittifaqa rastîn!" di nava berpir-

siyaren sînorê de peyda bûne, hîştin, ku êl xurt bibin û komikêñ çekdar karêñ xwe yên bi zîrâr ên ku sermîriya Iraqê ji ber dinale, berdewam bikin.

Gava şahîsahê Ecemistanê dît, ku ew bi zorê nikare kurdan bipelixîne, ramyariya xwe ya Kurdistanî bi pilan û hovîti guhart û qedr û buhayê Simko bi zimanxeşî xuyar kir. Li ser bingeha vê guherinê Simko gelek caran li gel se-rekêñ farisan rûnişt û bi gotinêñ wan ên hingivîn hate xapandin. Meha nîsana sala 1930'î sermîrê bajarê Şîno şande pey Simko ku were bajêr, ji bo hevditinekê li gel şahînşah Riza Xan. Simko li gel hêzeka suwar a biçük, bû mîhvanê sermîrê bêbext Serheng Saraxanê, ku qedr û qîmeta mîhvanê xwe şanî kir! Lê Simko nîzânibû, ew dahf û kemend bû û bi ferманa şahê teres bû. Li gorî hinek serçavik û jêderêñ dîrokî, Simko di 21ê meha hezîrana sala 1930'î de, li Şîno (Uşnewiyê), ji aliye farisan ve, bi xinizi û nemerdî hatiye kuştin.

Di cih de kurdan dest avêtin kîr û xenceran. Cafer Sultan Hemedanî bangâ şoreş û tolhildanê kir. Lê pir dereng bû û dewleta xwînmij xwe ji reşike wilo ve amade kiribû.

Piştî wan bûyeran Umer Xan ê, ku mîna dêwekî gir bû, diplomatekî niyas, çavvekirî û jêhâtî bû. Destê xwe da ser êla Sîkakan, lê ji ber ku di nava wî û Tehir Xan de (ew ji kurê Simko axa bû) her û her pevcûn hebû, wî nikarî roleke mîna rola Simko axa bileyista.

Dû kuştina Simko re, gelê kurd hayanî avabûna komara Mihabadê, li ser wî beşê niştîmana xwe, mîna şêrekî birîndar û girtî hate hîştin. □

Jêder: Kovara Karwan

SIMKO ŞIKAK

Simko şikakê palevan - lo dilo
Gazi dîkê j' bo Kurdistan - lo dilo
Lo dilo, lo dilo - hey dilo

Simko şikakê simbêlzer - lo dilo
Bi top û tifeng û xencer - lo dilo
Lo dilo, lo dilo - hey dilo

Simko şikakê xwînsîrîn - lo dilo
Laşê dijmîni kire xwîn - lo dilo
Lo dilo, lo dilo - hey dilo

Ji Folklorâ Botan

HELBESTA BÊMIRIN

PABLO NERUDA

Dilbixwîn

Bi Kurtahî
jînameya Pablo Nerûda

Bi rastî mirov nikare bi nivîs, hema rûpelekê ji jiyana hozanê bi nav û deng Nerûda bîne ziman. Jîyana wî bi xwe dasîtanake, helbesteke bi xem e. Her wekî girêkekê ye, nayê vekirin... Rûpelekê ji ji êş, keder, jan û kovanan hatîye dagirtin... Ú di tarîkê de bê ronahî maye. Ji dema ku çavêن xwe di vê cîhanê de vekirin û ta bi dawiya jiyana xwe, nola lehengê dasîtanekê, di şerê hebûn û nebûnê de bû... Bêyi ku tova tirs û newêrînê di dilê wî de cih bigire, bi ser diket û bi xameya xwe ya tûj, wê tarîkê diçirand û cîhan ges dikir... Çiqas em bêjin, ewqas rûpela jiyana wî berferreh û kûrtir dibe, êdi pénüs nikare bîne ziman. Şoreşgeriya Nerûda ji Pozê nivîskokê xurttir e.

Navê wî yê rastinî Rîkardo Nîftalî ye. Di 12'ye hezîrana 1904'ê de, li bajarê Baral Şîlî, ji diya xwe dibe. U bi mîvandarî vê jiyana bi rûmet hembêz dike, nola jiyanevê bi hêrs xwe bi cih dike. Wê salê bi xwe de diya wî ya xemgîn destê xwe ji vê cîhanê dikişîne û diçe dilovaniya xwe... Ú Nerûda yê mendal di yeksaliya xwe de sêwî dimîne.

Di sala 1910'î de, Rîkardo dest bi dibistânê dike. Bi jîri û salên xwendinê de bi ser dikeve û ji hevalên xwe yên biçûk re dibe sîmbolek. Di sala 1917'ye de helbesta wî ya yekemîn ditê weşandin. Ev helbesta her wekî hilpişkînekê bû di rîveçûna jiyana wî de bû hîmeke xurt û di pêşketin û pêşveçûna wî de roleke mezin lîst. Bê guman e ku Rîkardo çend dilop li hêstîrên kêfxwesbûnê ji çavan hatîne xwar. Di sala 1920'î de navê "Pablo Nerûda" li xwe dike û êdî weşanên xwe di bin vî navî de diweşîne. Di vê salê de cîvînoka xwe ya yekemîn 'Şefaq' belav dike. Piştî vê hilgavtinê bi pênc salan di kovara 'Kabalodi Basdos' de dibe ser-

nivîskar. Di sala 1933'ê de hozanê spanî Lorka dinase û destaniyeke ku ji pê re dibe hevalbendîyeke xurt pê re datîne.

Dema ku cenga xelkî (ehlî) li Spaniya-ayê dest pêdike, êdî giyana jiyanê ji dibe nişangeha tifingan, erzan dibe, ci rûmet ji xwîna mirovan re namîne. Laş li ser laşan kom dibin. Cendekê mirovan bêhejmar li kolan û ziqaqan rêz dibin. Her wekî çemekî xwîn diherike û dîwar bi lekeyên xwînê di-xemilin... Belê, di wê kîliya tarî de faşistên spanî destê xwe yên bi qirêj, lepêni bi xwîn dijîjî jiyana Lorka dikan û li Girnakta, pela gûla wî diçilmisînin... Na, gulê ji kokê ve hil dîkin. Lê hema ji bîr kirin ku gula Lorka di dilê karker û belengazan de naçîlmise.

Ji wê roja reş û bi şûn ve, Mîroka dest bi cîvînoka xwe ya duwemîn "Di dil de Spaniya" dike û dibe sazûmankarê "Yekîtiya Rewşen-bîrêñ Şîlî ji bo parastina çand û kultûrê" Piştî vê damezrandinê, bi demeke ne pir dirêj kovara "Hozanê cîhanê Spanya dibarêzin" diweşîne.. Di sala 1945'ê de, bi serdanevê diçe Kûba'yê. Li vegerê têkîli partiya kommunîsta Şîlî dibe û her wekî endamekî cihê xwe tê de digire. Wê demê helbesta wê ya sergaras "patek ji Stalîngrad re" belav dibe û bi dorferehî ditê xwendin. Ji lewra, di sala 1946'ê de, serekomarê Şîlî fermanekê dermafê girtina wî de derdice. Gelekî lê geriyan, xwestin mîna Lorka wî binerd bikin. Lê nedîkarîn... Nîroda xwe dihavêje bin lehengî û qehremanîyan û di nav van kendal hîm û zinaran de, helbesta xwe ya bi nîrx "Sirûda Gelempêr" dinivîse.

Di sala 1953 de, pêşabûya (caîze) "Lenîn ji bo Aştiyê" diyarî wî dibe. Di 1971'ê de, bi keft û leftekte çalak xwest ku çepen Şîliyê li hev bîcivîne. Wê hîvîyê pêkhani. Ji ber giranbihabûn û payebilindiya wî ji bo namzete serekomariya Şîlî hate hilbijartîn. Lê hema ew serkeftina diyarî dostê xwe yê ji dil Al-lyende re kir û bû balyozê Şîlî li Parisê.

Di mîjuya 21'ê Çiriya Yekem (Oktôber) a wê salê de, dîsa bi pêşabûya "Nobel ya Torevaniyê" şâ dibe û nav lê bû "Hozanê rûmetiya mirovan, ya riswabûyî".

Şeveke ronak, ku ji ezmanan tîrêjan xwe bera ser gelêن bindest û welatên dagîrgeh didan, mîzgîn û pîrozbahî diyarî şoreşen netewi dikir. Di meha êlûna sala 1973 de vemirî, lê ne ji xwe ber, guman heye ku faşistên Şîlî, yê ku rejîma Allyen-dê hilweşandin, bi xinizi ew şehîd kiribûn. Ne tenê giyana wî pak kirin... Dîwarêna mala wî anîne xwar. Nivízar û destnîvîsên wî pel bi pel şewitandin û pê şefaqâ bin-destan hilanîn. Belê, her wiha rûpela mezintîrin hozanê şoreşger di cîhanê de, Pa-blo Nerûda ditê tewandin.

Rîveçûna Nerûda ya Hozaniyê

Dengê wî yê qebe, her wekî birûskan li xûn mij û mirovkujan diket, bi hêrsa we-lat parêzî û niştimanperweriyê xurt bibû, çiqas ji welatê xwe hezdikir! bi dil-darî û evîndariyê çiqas, newal, zozan, karker û cotkarên Şîlî re dijiya. Her wiha li ser welatê xwe dikiliya û digot:

*Cem ji te re distirêñ
Ü bi pêlên wê re
Giyana min direve
Wekî tu dixwazî
Min bi ku ve dibî-bibe
Riya min veke*

Piştî ku ew kêferat û tengezariya di ser Spaniya re dibuhure, helbestêñ Nerûda kîncîn rengîn bi ser xwe de ber-didin û xwe dirêjî iş û derdêñ gelêñ bindest dikin. Kovana dagîrkeran kûr bûye, hewar û naîlin bilind bûne. Cîhan di nav firtoneyekêd e dij... Li vir pirsek xwe di mîjîyê wî de diliwîne: "Gelo hozan ji kê re dinivîse? Nerûda ji kê re dinivîse? Lê belê, nivîsoka wî ji gelê Şîliyê û yêñ bindest re berdestî ye. Lê mixabin, sed mixabin! Ew mirovê ku Nîroda bi sev û rojan li ser dinale, guhdarî helbestêñ wî nakin, naxwînîn... Dîsan ji bi hîvîyeke bilind dibêje:

*Ez ji gel re dinivîsim
Baş dizanım
Bi çavêن westayî
Nikarin helbestêñ min bixwînîn
Lê hema hêvidar im
Wê ew kîliya bê
Roja ku helbestêñ min
Bîgîhêñ guhêñ wan
Wê cotkar çavêن xwe vekin
Wê karker bikenin
Ü keviran bisikînîn
Belê
Wê li helbestêñ min binêrin
Dibe ku hemû bêjin:
"Ew hevalê me bû"
Taca ku ez lê digerim ev e.*

Nerûda wê tacê
didê ser serê xwe û
hîn bêhtir ji gel re
nêziktir dibe. Xebata
bi gel re hildana ala
azadiyê bi xwe ye. Ji
lewre her wekî çekeke
giring huner û helb-
estêñ xwe yên bomba-
kirî bi ser faşist û ko-
ledaran de dibarandin
û bi hêrsa xwe dikete
cenga împeryalîzmê...
Ez dikarim bibejim
Nerûda xwedanê dara
azadiyê ye. Azadiya
gelan di cerg
û hinavêñ wî de şîn
bûye û şiqqin daye:


*Ew dar e
Dara gel e
Dara hemû gelan e
Dara azadî û
têkoşînê ye
Divêt em nehêlin
Pelên wê hişk bibin
Ev e dara ku di dilê
Erdê de şîn bûye...*

Ger em bi kûranî
van malikan bikolin,
wê bête xuyakirin ku
Nerûda cedeliyet ji
xwe re kiriye bingeh û
li ser diwarê xwe
lêkiriye. Çimku ew
bawer e ku têkiliya di
navbera mirovan de
gelekî xurt e û jiyan bê
pêwendî nabe... Ji
lewre jî bi her hêza
xwe, tevlî wê têkiliyê
dibe:

*Ez
hevalbendê we me
Da ku
erdê ronî bikin
Ez dixwazim
Jî gelan re
bibime nan
Xebat
jî min ne dûr e
Min naveciniqîne!*

Rola helbestan di rêvgûna mirovahiyê
de gelekî pêwîst e. Di şer de tifing e û di
aştiyê de guleke sipî ye, lê bê nirx e
dema ku di van herdu waran de xwe ne-
livîne, hingê bi kêrî tiştekî nayê:

*Helbest...
Çî ne ku nebin
Dilopêñ xunavê
Çî ne ku nebin
Jî bo vê şevê
Xençer dil dibire
Çî ne ku nebin*



vexewûrandana
Û bixwarana
Minê
ji bona
Dengê te yê şêrin
Her tişt bikira
Ez dimirim
Da ku
Bi şev te bibînim



*jî bo vê rojê
Nebin
jî bo vê berbangê...
Dostaniya ku li ser bîrdoziyek û bîr û
baweriyeke ava bûye, ci caran neyê
jibirkirin û erzan nabe. Nerûda jî rîhev
alê xwe yê hêja Lorka, kêlî bi kêlî tînê
ber çavan û helbestan li ser dixwîne:*

*Ger min bikariba
Ezê ji tîrsa
Kavilekî re bigriyama
Minê
Her du çavêñ xwe*



rûmet e. Çiqasî hozanê me Pablo
Nerûda ji azadiya gelan hez dike. Çiqas
xweş e dema tarîk were çîrandin:

*Ez dixwazim
Roja girtî hilê
Çav vebin
Û...
ronahiyê bibînim*

Her wiha şoreşen netewî didomin, da-
gîrgehêñ sitembar serî li berxwedanî
diñ û di gora reş de dilê Nerûda ve-
dihesînin. □

ÇAR LEHENG

Xwendevanê hêja

Weke tête zanîn Osman Sebrî, di xebata ji bo welet de, mîna welatparêzêkî dîlsoj, roleke mazin leyîstîye. Ji bo doza gelê xwe ya maîdar, gelek wêstan, lêdan, girtin û tengezarî ditine. Bêyîdu dili û xemkarî, bêyî rawestan xebitiye û ji rîcê derneketiye. Her çendiro kaleki hel-tê salî ye ji, dîsan bi hiş, ji can û dil, bi awayekî bêmenend û nûmûne, ji piştigîrî û hevalbendiya doza serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê xwe erkdar dibîne.

Nivîsareka wî ya bi navê "Çar Leheng", berî vê bi heft salan, mîna pirtûkeke biçûk hatîye çapkirin. Lî mixabin bi dorfirehî belav nebüye.

Pêşkêş e ji bo kurdênu ku dixwazin di riya serxwebûnê da xebata çekdarî bikin...
Şam - 1984

Çend Gotin

Heya demekî pirr nîzîk, xwendayêne me kurdan weke bav û kalênu xwe di gel ziman û dîroka gelê xwe bendewar nedibûn. Lî di van çend salênu paşîn da, hin xortêni bi rûmet çav dane xwendin û nîvîsina zimanê xwe. Bawer im ku ev tevger destpêka hişyarbûnê ye, ku kireke holê dilê her kurdeki bîbirî û gelparêzî ges dike.

Ev her çar bûyerên ku di dûr vê pirtûkekê da diidim çapê, berî hejde salan min ji kovara ÇIYA ra şandibû û têda hatibûn belavkirin. Iro ji daxwaza min van bûyerên ku berî cil-pencî salî, hin birayêne me yên kurd pê rabûne û li pêş neyaran bi ci mîraniyê şer kirine û bi xurtiya dilênu xwe çawa çavênu dijmin şikandine û serê gelênu xwe bilind kirine ji nû va bidim ber çavênu xortênu kurd, da bizanîn rûmet, mîrani û gelparêzî çawa bûye û me iro ci divê bikin.

Diyêt em ji bîra nekin, ku birayêne me yên dizanîn Tirkîye, Iraq, Iranê da bê serî danîn, doza gelê xwe bi xurtî ji ne-yarêne sitemkarî dîkin, ew ji celebek lehengî ye. Lî dil dixwast ku mîrxaşen me kurdan bi hêsanî gewriya xwe nedana destêne neyaran. Çêtirî di zîndanî da bi bêbavî bêne kuştin, bila di serê çiyan, di nav lat û zinarêne welet da, ney-arêne xwe bikujin û bêne kuştin. Qencê gel û qencîxwazê niştiman ew in, ku di riya serxwebûnê û parastina mafê gel da, bi comerdî dimirin. Sed xwezi bi dilînu wan şeran.

Nivîsar bi naverok û forma xwe, gelekî hêja û bi nirx e. "Çar Leheng", lehen-giye hînde kesen li dîroka Kurdistanê, li diji dagîrker û kedxwaran, bêrxwedan afitandine, dihêne ser zîmîn. Serdema çiro-kê, ew dem e, ku dagîrkeren tîr bêntiri 120 hezar leşkeren xwe êrisi ser Serîhildana Çiyayê Agirî dîkin. Ew serîhildana ku, ji sala 1925'ê ve heyâ 1930'yi, bi rîberiya İhsan Nûrî Paşa bilînd dibû. Dî navbera van salan de, *Çar Lehengêne Kurd*, ku her yeke dilehengiyanetewi de, bênimûne ne.

Iro di têkoşîna rizgariya netewa Kurdistanê ya hemdemî de ji, gelek leheng û ger-nasen hêja û jêhatî derkette. Navênu xwe bi xwîn û xweydana xwe, li ser zinarêni çiyayêne bilînd kolane û li ser dîwarêni zîndanî tarî nîvîsine. Her wisan di dîroka gelê me de bûne nemir. Lehengêne weke

Mazlûm DOGAN, M. Xeyrî DURMUS, Kê-mal PÎR û Egîdê Mahsum KORMAZ...

Birastî li dîrokêji van palewanêner berx-wedanê geleki kêm hene. Lewma me ji xwest ku em "Çar Leheng"ên Osman Sebrî, li ser rûpelên REWŞENê ji bi-wesînîn û pêskêsi wan lehengan dikin ku li ser ewçen Çiyayen Cûdi, Gabar, Here-kol, Kela Memê û di zîndanê dagîrkeran de, mîna şeran li ber xwe didin.

Lî dumahîkê em dixwazin bibêjine ku nîvîsara "Çar Leheng" di warê rézimanî de, ji bili hin awarîyêne girîng weke orjinala xwe hatîye hîstin. Me ji bili rînivîs û pê ve destkariyekê lê nekiriye. Vokabuler her weke xwe maye.

REWŞEN

LEHENG I

Di sala 1929'ê da şerê Agirî hêdî hêdî berwe xurtbûnê dicû. Şervanêne kurd li her alî welat berên xwe didan Agirî û li dora serdarê şoreşê İhsan Nûrî xwe di-dan hev. Hingê ji bo parastina sînorê çiyê û gaziyyêne bi lez siwarî diviyabûn û di çiyê da heps hindik mabûn. Serdar İhsan Nûrî, Ferzende di gel şest siwarî şande nav eşîren Serheden, ku sedak hesp peyda bike, serê her gundê dewle-mend hespek an dudu jê dixwestin. Ci-vandina hespan ne kirek e ku ji hukûmetê bîhata veşartin. Zûka haya hikûmetê jê bû. Serdariya leşkerê tîr yê rohilat du alayî siwarî şandin pêsiye Ferzende. Her du alayî ne dûrî hev berî dabûn êrdima ku té da hesp dihatin ci-vandin. Li pêş gelîyê Zilan alayiyek ji wan rastê ferzende hat, lê nexwest bi tena xwe şerê wî bike, ji ber ku dizanîn Ferzende kî ye. Ji lewra dûredür li pê çû heya alayîya din jî xwe digehîne ser. Lî Ferzende bîra vê yekê dîbir û nedixwest herdu alayîyan li ser xwe bigehîne hev. Bê dudîlî hespênu ku civandibûn spartîn deh siwaran, bi pêncî siwarî dirêjî alayîya tîr kir. Şer bi awakî birûskîn destpêkir. Şervanêne kurd bê ku tîfingê biteqînin li pê bavê Efrasiyab ajotin ser nîveka alayîya dijmin. Devê tîfingêne wan bê minet digihan qefsîngâ neyar, wek coleq gurên dev bi xwîn bikeve nav keriyeq pez. Tîrkan ev celeb şer nedîtibûn, nedîkarîn sînga xwe ji devê tîfingêne kurd bi-parêzin. Şehsiwarêne kurd tîfing dest bi dest berra pêsiye neyar didan. Leşkerêne tîr wek pelikêne daran di ser pişta hespan da dihatin xwarê. Bîstek neborî neyar dest ji ber hev berdan û her yek bi alîkî da revîn.

Holê keysa dijmin ketibû Ferzende û digel siwarêne xwe yên mîrxaşen da ser

pişta wan. Hespên tîrkan ne ew çend beza bûn, kurd bi hêsanî digihanê û ew di ser pişta hespan da tanîn xwar. saeteke neborî qada şer ji cendekên tîrkan hate dagirtin, gelek hesp û tifig bêxwedî mabûn.

Gava alayîya duduyan gîha qada şer ji Ferzende û siwarêne wî pêva kes nedîtin. Berî ku leşker li ber xwe binêrin Ferzende ajote ser wan, wek bazen ku dikevin nav refê qulingan, her ew di ser pişta hespan da tanîn xwar. Her weki destêne tîrkan girêdayî be bes deng ji tifingêne kurdan dihatin. Ji lewra şer dom nekir, alayîya duduyan ji revî û pişta xwe dan kurdan. Ji ber ku hespên kurdan westiyabûn û ji hal ketibûn geleki li pê dijmin neçûn û li qada şer vegeirîn. Pirritî du sed û pêncî kuştî ji leşkerêne tîrkan hebû, ji kurdan sê kes birîndar bûbûn û birîna wan sivik bû. Heke gotin û nîvîsina bûyereke holê hêsan be ji baw-erkirina wê hinekî dijwar e, lê ev bû, ya ku wê rojê qewimî. Pişti şer qediyâ Ferzende hesp û tifingêne kuştîyan civandin û berê xwe da hêla Agirî. Pişti vî şerî bi çar pênc rojan her du alayîyen tîr nedikarîn siwarêne xwe yên pij û belavbûyî bi-qehînin ser hev.

Pişti hatîna ser hev û xisara xwe nasînê, fedî kirin, ku Ferzende bi pêncî siwarî ew holê şerpeze kirine, komandanî her du alayîyan raporek derewîn şandin serdariya leşker ra, ku eşîren Gelyî Zilan tevda aîşkariya Ferzende kirine, ji lewra hinde leşker hatîn kuştin. Li ser vê raporê bû, ku hikumeta tîr heştê gund li Gelyî Zilan, tevî kal û pîran, jîn û zarokan, da şewitandin. Ew serdestiya Ferzende bû sedema şewitandina heştê gundê kurdan.

Mîraniya Ferzende ne tenê ev bûye, di gelek şeran da mîraniyê holê kirine, lê zanîna me di vî warî geleki teng e.

Yek jê, di şerekî Agirî yê mezin (1930) da tîrkan çepera wî li ser tehtekî nasîn. Nîzîkî du sed gulleyên topan berdanê, çeper bi ser-hevda hilweşî, Ferzende di ranê xwe da birîndar bû. Hevalen wî xwestin hinekî ji çepera hilweşî bi dûrxin, heya hinekî vehêse, lê bavê Efrasiyab qîma xwe bi lavayî û daxwaza wan ne anî û got:

Gava rom [tirk] bizane, ku torinekî Hesenî du gavan ji çepera xwe bi şûn de çûye, dê vê yekî ji xwe ra serdestî bîzanîn. Ez qîma xwe bi mirinê tînim, lê ne bi vê yeka han.

Di cihê xwe da ma, heya êvar bû û şer sekînî. Rehma xwedê lê bit, ew ji pêşengêñ Kurdistanê bû, ku dirêjiya umrê xwe rev ne-nasî.

MIN SEYIDXAN ÇAWA NASÎ

Dawiya meha gulanê sala 1926'ê, ez gîhabûm zîndana Amedê. Hîngê ew zîndan ji şêxan, began, axan û mîrexasan dagirtî bû. Her roj girtî bîr bi bîr dibîrin mehkema iştîklalê. Mahkema tu kesî pîrtîrî du rojan dom nedîkir. Girtiyên biçûna mehkemê an bi derve dibûn, an ji hikim didanê, kêm caran, bêguneh berdîan. Dema girtî ji mehkemê vedigerîn, xelkê zîndanê diçûn hemberê dergeh da bizanîn, kî bi darve dibe û kê hikim danê. Wê rojê ez ji tevî kesên ku ji mehkemê vegeîn da xortekî dirêj û rûgeş, derbasî hundur bû, yekî ji çavdaran jê pîrsî:

- Seyitxan! Çend sal hikim dane te? Wî bi tinaz lê vegeîn got:


- Gora bavê wan, min yanzde ji wan kuştin, wan deh sal dane min. Peyayeki wan belaş çû.

Holê min Seyidxan dît, careke din keys neket min, ku bibînim. Kesên hikim danê zûka dişandin zîndanêñ tîrkan heya ji bo girtiyênuh cih di zîndanê de hebe. Pişti em du salan di zîndanêñ tîrkan de man û bi qanûna efiwê vegeîn welatê xwe, çawan berê Seyidxan ketiye tékoşînê nîzanîm. Lê gava berê xwe da Sûriyê ez hîngê li Hesiçê bûm. Pîrtîrî her kesî di gel hevalen wî bendewar bûm û bûyeren wî şerî baş nasîn. Wê gavê çawan ji min ra hatiye gotin, welê dînîvisim. Dîvê ev leheng her wekî hêja bû, di dîroka tékoşîna gelê kurd da xwedî cih be.

LEHENG II

Sala 1930, Hikûmeta tîr 120 000 leşker şandibûn ser Çiyayê Agirî ji bo bikarin riça şoreşa kurdan ku bi destê

îhsan Nûrî di wî erdî da cih girtibû biderxe. Ser sê mehan dom kir. Ji ber tevdîra ku Partiya Xoybûn [Serxwebûn-R] danî bû neçû şerî, şoreş bi hêsanî hate vemirandin. İhsan Nûrî tevî Ferzende ji kûntarêñ Agirî derketin, xwe spartin dewleta Iranê. Hîngê di nava welêt da kesên mîrexas cih cih tifing ji destêne xwe ne avetibûn û şerî ji zorbazân tîr da danenîn li Serheden ji Seyidxan û Elîcan her yekî panzde-bîst siwar dabûn dor xwe û şerî dijmin dikirin. Ji van her du camêran di kîjan erdî da keysa Leşkerê tîr biketa wan wek



bîrûskê lêdidan û derbazî aliyeñ din dibûn.

Hikûmeta tîr gelekî bi wan ra westî bû. Alayık leşker berdabû pey wan, lê wê alayıyê nedîkarî şerî wan bike, ne ji pêşîya kîren wan bigire. Bi vî awayî di navbera wîlâyeten Erzerom, Mûş û Bitlisê da diçûn dihatin. Sala 1931'ê Elîcan di şerekî da hat kuştin û gîha rehma xwedê, siwarê wî ji gîhane Seyitxan. Ji ber ku destê hikûmetê nedîgha şervaniyan, xelkênd Gundêñ wan érdimana di ber kîren şervaniya va dişandin. Ji ber vê yekî Seyitxan xwestibû derbasî Sûriyê bibe.

Tîrkan li ser riya guhbelan (casus) bîhîstibûn ku berê wan li Sûriyê ye. Ji xwe alayıyek siwarî her li pey wan bû, tevî ku nedîkarî xwe li wan tevgerên wan dikir û hikûmet serwextî rewşa wan dikir.

Dema ku hikûmetê zanî ku berê Seyitxan û 37 siwarê wî ber bi Sûriyê ye, rî di çiyayê Mêrdînê da ji du gelîyan pêva nîne, berî hatina wan bi sê rojan firqeyek leşker zû şand di wan gelîyan da kemîn danîn. Gelîyek ji wan bi dirêjiya panzde kilometran e, du hezar leşker tevî topê wê firqê tê da bi cih kirin. Gelîyê din dirêjiya pêncî kilometrî ye, neh hezar leşker tê da bi cih kirin û li benda hatina Seyitxan rawestîn. Rojekê ji berî berbangê Seyitxan tevî siwarê xwe gîhabû serê gelîyê dirêj, ku berî sê rojan neh hezar leşker li ser dirêjiya gelî di her du aliyeñ rî da tawî kolabûn, tê da kemîn danibûn. Di serê gelî da deh siwarê tikan çavdêriya hatina wan dikirin. Dema rûberî hev bûn kurdan mecalâ şer neda wan, her deh siwar dîl kîrin û çek jê standin. Lî nedîzanîn ku ev siwar çavdarêñ kemîneke mezin in. Heye ku di dîroka cîhanê da kemînek holê mezin neketibe pêşîya şervanîn evqas hindik. Berî rohilat şer dest pêkir, ji her du aliyan gulle wekî zîpîkê bi ser wan da dibarîn. Şervanîn kurd weki gûrên dev bi xwîn dirêjî gulleyen kemînê dikirin û leşker nedîkarî xwe li ber wan bigirin. Çiqas li pêş xwe gulleyen leşker diditîn bi êrisê ew direvandin, hinekîn din li pêş xwe diditîn. Gelî dirêj, seranser kemîn bû. Ji rî derketin ji ne mikûn bû, jê pêva reya ku hesp tê da biçûna tinebû. Seyitxan ji nedixwest hespan ji tîrkan re bihêle û derkeve bilind-cihêñ çiyê. Holê bi şer re bilind bû û gîha nîvî ezmîn, paşê dagerî hêdî hêdî bû êvar, her şer û kuştin û lêdan bû. Bi vî awayî pişî rojavê bi saetekî gîhan dawîya gelî. Li wir deh-penze otomobilên zirxîrî li benda wan rawestiya bûn. Gava çav bi şervanîn kurd ketin bê şer revyan.

Heye wê hîngê ji siwarê Seyidxan tenê du kes birîndar bûbûn. Yek jê pis-mamê wî Silêman axa, yê din biraziye wî Mistefa bû. Her du ji di nav neyaran da mabûn, ku dê vegeîn ser çela wan. Pişti Seyidxan di gel sih û pênc siwarê mayî ji gelî derketin û gîhane deşta Mêrdînê, gelekî westiyabûn, ji tihna û ji birçîna ji hal ketibûn. Dirêjiya sêzde saetan bi neh hezar leşkerén dijmin ra şerkirin ne hêsanî bû. Çawan welê bi gengazî ji wê kemînê filitibû nedîket serê wan. Di serê deşta Mêrdînê da gîhane ber gundekî. Xwestin herin nav gund avê vexin, lê nedîzanîn ku otomobilên zirxîrî çûne wî gundi. Dema gîhan ber gund, bi çeqreqa lingêñ hespan ra tifingek li gund teqîya berrika wê li eniya

Seyitxan ket û pê çû rehma xwedê. Ji ber ku şev bû kesên di nav gund da kuştina Seyitxan nedîtibûn. Siwaran cendekê lehengê kurd birin, di nav wê axa welêt a paqî da veşartin û berê xwe dane sînorê Sûriyê. Gava hatin ez li Hesîçê bûm, min bi çavê xwe dît, pirraniya şervanêñ kurd tifingek û hinan jî du tifing ji ên leşkerêñ tirk ên kuştî bi xwe ra anîbûn.

Gava Salih Paşa serekê erkana leşkerê tirk destpêka şer bihîst, wê rojê bi balafirê ji Angerê cû Amedê (Diyarbekirê) û roja din cû Mêrdînê û xwe gîhande qada şer. Ew bawer bû, ku cendekê hemî şervanêñ kurd li ber xwe bibîne, lê welê derneket, tenê jê ra hat gotin: "Birîndarek ket dest tê me, di gel du leşkeran me şand Mêrdînê." Sê rojan leşkerêñ firqê li cendekêñ kurdan digerîn, lê yek jê nedîtin. Salih Paşa geleki xeyidî, hemî zabitêñ firqê dan Dîwan-i Herb (mahkeme leşkerî).

Ji van zabitan yok revî Sûriyê, dema min bihîst li Hesîçê ye, ez çûme nik wî. Min dixwest jimara kuştîyêñ tirkan binasim. Gava min jê pîrsî bi ruyekî şermî gote min: "Ji xeynî birîndaran nod leşker hatine kuştin. Jî kurdan tenê Seyitxan hatibû kuştin". Biraziyê Seyitxan Mistefa dema birîndar bû, berrik di gepê da lêketibû. Bi bayê berrikê ra gêj bûbû û ji ser pişta hêsp ketibû xwarê. Holê girtina wî ji tirkan ra hêsan bûbû. Pişti şer ji wan bi dûr ket, desten wî girêdan û li hespê wî, siwar kirin, xistin pêşîya dû leşkeran şandin Mardînê. Bi rê va hêdî hêdî hiş dihatin serê wî. Mistefa qenc dizanîn ku li pêş wî ji kuştînê pêva tiştik nîne. Berî bigehêñ Mêrdînê, bi xurtî zengû li newqa hêsp da û revî. Her du leşkerêñ di gel wî çend berrik bera wî dan, lê çîva rê ket navbera wî û leşker, zûka ji berrikan hate parastin. Heya her du leşkeran xwe gihadîn serê civê Mistefa ji wan va nedîyar bû. Pişti mecaleke dirêj reviya, rawestî, hin kurdêñ rîwî destîn wî vekirin. Holê hat Sûriyê û gîha hevalê xwe.

Vêcar em vegerin ser birîndarê din, Silêman axa. Birîna wî di bin çîçikê rastê da lêketibû û di bin pîyê rastê da bi derketibû. Birîna wî hişk û dijwar bû, lê ne ya mirinê bû. Dema lêket û di ser pişta hêsp da hate xwarê, hevalan careke din ew siwar kirin, vêcar di bin wî da li hesp xistin, dîsa hate xwarê. Gorî gotina wî geleki dişîya û ji xwe bêhêvî bûbû û gote hevalan:

Êşa min dijwar e. Ez ji birîna xwe bê hêvî me. Ne hêja ye hûn ji bo min xwe bidin kûştin. Ev e tifinga min di gel xwe bibin û min bihêlin.

Gava heval di-bînin, ku bi wê êşê ew dê nikaribe xwe li ser pişta hêsp bigire, li ser daxwaza wî tifinga wî birin û ew histin. Silêman axa got: "Pişti hevalan ez



hiştîm û çûn, bi dû-sê saetan, êşa birîna min sist bû. Roj diçû ava, dinê tarî bi-hiştîm û çû, bi du-sê saetan, êşa birîna min sist bû. Roj diçû ava, dinê tarî bibûya, min dê bikariya ji qada şer bi dûrketama û xwe veşarta"

Silêman axa ji wî erdî ra ne bi-yanî bû. Ji xwe wî berê Seyitxan dabû ser riya geliyê dirêj.

Di şerê cihanê yê pêşin da, dema xelkê Serhedê mihacir bûn, hîngê Silêman axa habîbû çiyayê Mér-dînê, li nik xwedî-gundekî bûbû xulam. Nizîka çar-pênc salan li wî gundi mabû. Ew çiya û gündên dorâlî gelî baş dinasîn. Gava dinê tarî bû ji qada şer bi rohilat da ce-mekî biçük diherike, xwe gi-hande wî cemî û têr av vexwar. Her du aliyêñ cem darêñ bihî yê gurr bûbûn, gava leşker bihata dikarı xwe berda nav ava cem û serê xwe di nav tilayêñ bihiyê da ve-şere. Wê şevê ma li ber cem, sibetirê leşkeren tirk habîbûn li qada şer û dorâliyê wê li kuşî û bîrîndaran digerîyan. Dema çav bi leşkeren ket, her weki xistibû serê xwe exist nav tilayêñ dara bihiyê. Holê hate parastin.

Piştî leşker çûn, ji nav avê derket û cilêñ xwe guvaştin, ziha kirin û wergirtin. Du rojêñ diji leşker dihatin li wî erdî dosh dibûn. Silêman axa ji wek roja pêşin xwe berdida nav avê û serê xwe di nav tilayêñ darê bihiyê da vedişart. Di wê navê da çar rojan bê xwarin mabûn. Ji ber germa havînê kurm ji ketibûn birîna wî. Roja pêncan leşker nehat wî erdî, dora nîvro şivanekî pez anî wir.

Silêman axa cû cem, nan di gel şivêñ hebû, jê ra kodek şîr dot û zikê wî têr kir. Paşê pirsâ xwediyeñ gundê ku tê da xu-lamî kiribû ji şivêñ kir. Şivêñ gotê:

"Ew mîrov heye û rewşa wî çak e. "Hîngê Silêman axa gote şivêñ:

- Bira tu rewşa min dibînî, ma dikarı xwe bigehînî xwediyeñ gund û bêjiyê, xu-lamê te Silêman birîndar e, bila were min bigehîne cihekî?

- Wey li ser çavan. Evarê ez dê pez li pêş gund mexelkim, bi lez û bez herim gundê wî û haydarî halê te bikim. Sibê dîsa bême vir, ku cihê te raveyî wî bikim.

Sibetirê, dîsa şivan tevî pez hate wir. Hin nan û xwarin jî di gel xwe anîbû û gote Silêman axa:

- Bi şev ez cûm gundê wî, min camêr dît, berî rojavê dê were vir, da jê ra cihê

birîn deh salan jiya.

LEHENG III

Piştî şoreşa Şêx Seîdê rehmetî, pêlén şoreşin bi xurtî ji her alî welêt radibûn. Eger di navbera wan pêlan da nasî û yekîti hebûyana hikumeta tîrkan tucaran nedikarı xwe li ber wan pêlan bigire û welat azad dibû. Ji wan pêlén şoreşin yeka xurt li çiyayê Sasûnê di bin serekatiya malbatâ Eliyê Yunis da leşkeren tirk bêzar kiribû. Hîngê xelkên Sasûnê ku gund berdabûn û derketibûn serê çiyan, Di hundirêñ xaniyêñ xwe da çaline binerdî kola bûn û pirtalêñ xwe tê da veşartibûn. Dema rojekê hewceyî tiştekî bibûna di bin şevê da dadiketin gund, tiştên bixwestana di çalê da derdixistin, carekê din davê çalê digirtin û vedi-gerin çiyê. Ev yeka han ji hemî xelkên çiye ra tiştekî nas bû.

Herçî leşkeren tirk nedikarı derkevin çiyê. Çiqas digêhan kûntarêñ çiyê şelpene pir xurt û mezin ji destêñ şer-vanêñ kurd diiditîn. Ji lewra ew li nav esîrêñ dora çiyê dosh dibûn û carcaran reya xwe bi gündên vala jî dixistin. Gava kesek li wê êrdimê bidîtina bê ku bizanîn kî ye kûda diçe dikuştin. Demsal payîz bû. Li serê çiyan sermayê hestiyêñ şer-vanâñ dihingavt. Bê merş û mitêl mirovan nema dikarı xwe li ber wê sermayê hişk bigire. Nemaze siban berî berbangê ji ber sermayê diranêñ mirov dirikrikin.

Sibekê zû, berî berbangê, di kûntarêñ çiyê da, li nav gundekî ji wan gündên berdayî, deng bi bi tifingê ket, lê ji hev qut nedibûn. Şerevanî gelekî ecêb mabûn û bi meraq ji hev dipirsin: "Ma gelo ev bêbavêñ tirk şerê kê dikin? " Dinê ronî bû, paşê hêdi hêdi ro hilat, hîn dengê tifingan bi xurtî dihat. Kesî nedizanî üst û jêdera vî şerî ci ye. Ro bilind bû, xwe gîhande sînga ezmân, pîr neçû



te nîşandim. Dema dinê tarî dibe wê te li

bergîrê siwarke bibe.

Wê rojê serêvarê bergîr anî hat. Dema şev tarî bû Silêman axa siwar kir bir.

Piştî du rojan anîn Hesîcê, tevî wê birînê wek şerekî dimeşe. Hîngê ez li wira bûm, du rojan min û Ekrem begê xizmeta wî dikir. Piştî jê ra du emeliyat çêkirin û şes parsû ji her du aliyêñ sîngê

dengê topan jî hat. Xuya bû leşkerê tirk bi topan li gund didan. Günd i vala bû, ma gelo hinde berrik û gulle berra kê didan?

Ev pirs li ser zimanê hemî şer-vanan digeriya. Hîngê tiştek hate bîra Mihemet axa kûrê Eliyê Yûnis. Ma gelo nebe ku ji bo anîna hin pirtal kesek çûbe gund û restê leşkerê tirk hatibe? We gavê ji bî-rayê xwe Evdirehman ra got:

- Binihêr! Ka kî ji xelkê me çûye gund? Heke kesek çûbe teqez niha di tengiyê da ye, divê em di gaziyê de biçin û ji nav lepén leşker biderxin.

- Piştî Evdirehmen axa ji hin xelkê wî gundi pirsî, zanî ku Remezanê bi tena xwe, ji bona anîna hin pirtal, nîvê şevê dakteviye gund û hîn venegeriye.

Remezan ne peyayê ku ji bo anîna pirtalêñ xwe alîkarî ji kesî bixwasta. Pir caran bi tena xwe diçû gund û di bin şevê da vedigeri ciyê. Lî "her car bext ji mirovan ra nabe yar." Vê carê dest ji Remezan kir û leşkerêñ tirk berdane pîsîra wî û ket nava şerekî giran.

Remezan nîvê şevê daktebi gund. Di hundîrê xênî da çal vekir û herçî pirtalêñ diviyabû li ber şewla mîftikê derxistin, paşê devê çalê wek berê dada û hinêk zibil ji bi ser reşand, xwest şû-na devê çalê ne diyar be. Piştiyê xwe pêkanî û hilda pişta xwe, da derî ku biderkeve. Li ber derî du leş-kerêñ tirk li pêş-berê xwe dîtin. Xuya bû ew ji hatibûn di nava gund da li tiştina bigerin. Bê ku Remezan keysê bide wan û dever û ew da erdê. Yê mayî xwe avêt pişt taldeyekî û wî ji berra Remezan da, lê berrika wî vala cû. Ji ber vê yeka han Remezan bi şûnda vegeñ xênî, piştiyê xwe danî û xwe ji bo şer pêk anî. Bê gu-man du leşker bi tena xwe ne dihatin gund, dê hevalêñ wan ji hebûna. A rast ji ew her du ne bê heval bûn, ew ji alayıyek piyade bûn. Alayıyek din ji dê sibetîrê bihata, heya êrişkê bidin gundêñ di kûntarêñ ciyê da.

Li ser dengên tifingan leşkerêñ alayıyem hemî çûn çarmedorî xaniyê Remezan girtin û şerekî xurt dest pêkir. Remezan nemerdî nekir, berî ku dunya ronî bibe, xwe gihande ser cendekê leş-kerê mirî, tifing û fişekîn wî hilgirtin birin hundurê xani. Paşê çarmedorê xênî ji aliyê hundur va kunêñ biçük di dîwêr da vekirin heya ew bikare xwe ji êrişêñ leşkeran biparêze. Piştî dunya baş ronik bû, se-rhengê alayıyê fermana êrişê da. Ji ber ku kesê li pêşberî wan peyakî bi tenê bû, êriş gelekî xurt çebûbû û bêperwa dajotin ser xênî. Remezan ji bona êrişke holê pêkhatî bû. Çiqas ku leşkeran xwe diğîhandine dora xênî ji ber berrikêñ Remezan nedifilitin û deverû di nav xwîna xwe da vedigevizin.

Dema bi dehan cendek li dorlî xênî ketin, êriş sist bû û zanîn ku peyayê li

pêş wan kurdekî mîrxas e. Piştî rohilat bi du saetan alayiya din ji gîhabû gund û di gel wê topêñ hawin ji hebûn. Dema dîtin ku Remezan gelek leşkerêñ wan kuştin û birîndar kirin û dest dâni-ne, vêcar bi topan li xêni dan. Ji ber ku cihê xêni nizim bû, i du gullan pêve li dîwarê xêni neketin. Lî şerebnalêñ guleyekî ji wan birînek di ranê Remezan da vekir. Tevî ku hestiyê ling ne şikayabû ji, piştî birîn sar bû, nema lehengê me dikari li ser lingê xwe bi hêsanî bimeşe. Lî wê birînê ew ji desthilanîn nexist. Darek da bin çengê xwe û li ser lingekî, wek şerê birîndar, di nava xêni da li ber kunçeperan diçû dihat û her nav di xwe dida. Nîvro dageriyabû, ku Mihemedî Eliyê Yûnis tevî malbat û eşîra xwe di gaziya Remezan cûn. Hemîyan nedixwestin ku wî şerî di nav lepén dijmin da bîhîlin. Gaziyê xwe gihande gund, şerekî pir xurt û giran di navbera her du alayıyêñ tirk û şervanêñ sasûnî da bû. Ser du saetan dom nekir, ku leşkerêñ tirk ji gund biderketin û revî revî berên xwe dan Hezoyê. Hîngê kesêñ di gaziya Remezan cübün berî dan xaniyê Remezan. Dora xanî ji cendekan tijî bû, berî her tiştî tifing û fişekîn leşkerêñ mirî ci-vandin û paşê cûn nava xêni û Remezanê birîndar birin ciyê.

Min ji Evdirehman axa kurê Eliyê Yûnis pîrsa kuştiyêñ dor xaniyê Remezanê kir, ev bersiv da min:

- Dema em gîhane xaniyê Remezan her wekî keriyek pez li dora xanî mexel be.

- Ma gelo we cendekêñ doralî mala Remezan jîmartin?

- Di navbera kuşî û birîndaran da heftê leşker bûn.

- Ma birîna Remezan çawa bû?

- Bîst roj di ser vî şerî ra neborîn, ku careke din di nava şerevanan da xuya bû, lê vê carê di rêza lehengan da radiwestî.

Rehma xwedê li Evdirehman axa be, ku bûyera mîrxasiya Remezanê Xerzo ji min re got û wenda nebû.

Herciya ez ji Evdirehman axa hîn bûm, ne tenê ev nîvîsan bû. Bûyerên şerî Sasûnê ji berî sed salî heya mala Eliyê Yûnis ji ciyê derketine û hatine Sûriyê, t ev ji min ra gotibû û min nîvîsî. Nîzika sêsed rûpel bûlî û mixabin ku ew nîvîsan ket destê hikîmetê û holê westa min a du sê mehan vala cû.

LEHENG IV

Sala 1925'ê şoreşa Şêx Seîd şikest û rehmetî tevî 48 hevalan bi dar ve bûn. Serekeşîr, şoreşvan, têkoşer, mîrxas bi hezaran diketin zîndanêñ Xarpêt û Diyarbekirê. Ev girtî gulbe bi gulbe [grûb bi grûb / pişk û pişk] dibirin pêş dadgeha Is-tiklalê. Ev kes an diahtin darvekirin, an ji

ji deh salê heyâ sed salê hikim dikirin û dişandan zîndanêñ rogayê Tirkîye, da li wan cihan bimîrin. Erdimêñ ku té da şoreş bûbû, di nava destê Tirkân de bû. Bi hezaran kurd wek pez û dewar ser jê dikirin. Bi sedan gund tevî zav û zêc dişewitandin. Ji bo çavtîsandina gelê kurd ci kira sitemkar diviyabe bêdilovanî dikirin. Herçî érdimêñ ku şoreş negihabûyê serek, rîsîpî, mîrxas surgûn [di-hajotin / nefî] dikirin û ji bo civandina tivingan cih cih mifrezeyêñ leşker dişandin gundan, ku tifingêñ di dest kurdan de bicivînin.

Adil Beg ji begzadêyên ku ji mîjêva dewlemendiya xwe wenda kiribû û bi rumeta bav û kalêñ xwe girtibû. Tevî birayê xwe di gundekî bi cih bûbû, têkiliya xwe ji tişteki netanî. Tenê wî diviyabû hewceyi kesekî nebe û ava rûyê xwe li ber lingê nemerdan nerijîne. Tevî birayê xwe, dema dîtin gelê wan di şoreşê da bindest bû hikîmeta tirk çekan dicivîne û mifreza leşker gîhaye nîzîkî gundê wan, her du biran tifingêñ xwe derxistin danîn paş derê malê, ci gava ku mifreze big-ehe gundê wan, bê gotin her du tifingan bidin mifrezê.

Wê sibê Adil Beg berî birayê xwe ji xewê hişyar bû, cilêñ xwe wergirtin û çavnêriya hatîna mifrezê kir. Pir neçû pêşîya mifrezê derket, sî siwarî û zabitek bûn. Adil Begê birayê xwe hişyar kir û xwe berda pêşîya siwaran da ku serê hespê wan bigire. Heya birayê Adil Begê gîha ber derî, wî rahişte serê hespê zabit û bi ruyekî geş gotê: "Fermo peyabe! Em di xizmeta te da ne." Lî zabitê tirk mecalâ tiştsî neda her du birayan, bê ku tişteki bêje tajanga xwe hilanî û danî nav çavêñ Adil Begê û bê dilovanî dawêşandê. Dema Adil Begê ev bêbavî ji zabit dî, bê parastina rûmata xwe ya şikestî tiştekkî nehat bîrê, gote birayê xwe, ku gîhabû ber derî: "Law tu nabînî ev bêbav gi dike? Eddî mirin ji mayinê pir xweşir e. Lêxe wî bitevizîne."

Bi dengê Adil begê re, birayê wî tifing ji pişta derî hilda û da pêşîra zabit û wî ji ser pişta hespê anî xwarê. Adil begê ji şeşderba zabitê ketî kişand û berda leşkerêñ doralîyêñ xwe. Birê ji bi her berikek leşkerekî diavête erdê. Gava leşkeran dîtin ku mirin ji desten wan dibare, bê ku dest bibine çekêñ xwe revîn. Lî Adil begê dev ji wan berneda. Tevlî birayê xwe li hespê yên kuşî suwar bûn û dan ser pişta wan. Her du bira weke teyrêñ dubiran dirêjî mifreza revok kirin. Wê rojê 23 kes ji leşkeran kuştin. Hesp û tifingêñ wan hanîne malê. Evarê zaro û pertalêñ xwe li hespê leşkeran bar kirin û berê xwe dane Kotolê, sînorê Iranê. Dema hinek bixwazin rûmata xwe pirêzin, du mîr ne hindik in, dikarin gelek tiştan bikin. Piştî vê kira han, gelo ma ne hêja ye, ku em navê Adil begê ji

ROJĘK WEK GELEK ROJĘN DIN

Kurteçirok (Novel)

Dr. Kurdo Husen

Eger berî nêzîki deh salan, ji Darayê Dihokî bihataya pirsîn "Gelo çi tişt hew di bin stûna ezmên de, ji wî nexwestir heye?", wî dê di cih de vegerandibaya, bê ku ew pir zimanê xwe di devê xwe de bigerîne: "Ew bêwelatmabûn e, ew ji welat dûrxistine e. "Lê ji deh salan û vir ve, Darayê Dihokî li Parisê bi cih bibû. Eger di wê rojê de û nemaze di serma wê roja han de, hem ew pirsa han ji wî bihataya kirin, wî dê bêguman, bersiva xwe bi awayekî dinê bidaya.

Wê rojê, bayekî xurt li ser cadeyên Parisê dikire vîze-vîz û wî, mîna carûdek pehn û naye xuyabûn cade û baxçeyên bajêr ji kesan vala dikirin. Wilo jî, Darayê Dihokî pêrgîni pir kêm kesan hat dema wî berê xwe da çayxana ku her dem wî di nav dîwarén wê de kul û derdênil dilê xwe dihêrandin.

Hundîre çayxanê, wek bajêr vala bû û Dara berê xwe da qata jorê. Berî ku ew bi pêlikan biçûya jorê, wî weke her carê li Lîza temaşa kir. Lîza her dem dev bi ken bû û dinanêñ wê yên sîpi di nav lêvên wê yên sor û dagirti de diçirisîn. Çayxane vala bû û Dara li hevberî Lîza rawestiya û bi kêfa dilê xwe wî nêrinêñ xwe li ser rû û canê wê gerandin. Ew ji

xweşikbûna wê têr nedibû. Lîza xwe li ser qûma herm a sûret ramirandibû û sûsa Koka-Kola di dest de, wê jî hema li Dara dînihêri û dikeniya, bi keneke bêdeng. Dara garsonê çayxanê ji bîr nekiribû û dizanibû ku ew dê nêzîki wî bibe da ji wî biprise ew çi dixwaze vexwe. Ji ber vî tiştî, ew ber bi jor ve gû û li nêzîki pencereya pir fireh ciyek ji xwe re hilbijart. Weke her carê, wî pirtûk û nîvisîn xwe danîn ber xwe. Pirtûkek ve-kir û xwest bixwîne, lê, dilê wî ji binî ve nedîçû xwendinê. Dilê wî ji derd û kulan giran bû û ji ber vî tiştî jî, tip û rez li ber çavêñ wî dilan dikirin û dibûn weke ger-gerikan. Her tîpekê berê xwe dida aliye-kî. Dara pirtûka xwe girt û bi xemgîniyeke mezin, awîren xwe li ser çiqiyeñ darêñ rût garandin. Bayê xurt şaxêñ bêpel, bi hêrs, li hev dixistin û tevlî ku pencereyên çayxanê hemû girtibûn, nale-nala daran û care-cara bayê digi-han guhêñ Dara. Ezman tarîtit dibû û ewrêñ reş i avis dabûn dû hev û dixwestin kêlyek berî kêlyekê xwe ji barêñ xwe azad bikin.

Dara xwe di nav pêlîn xeman de win-da kiribû dema wî bawer kir ku dengêñ pêyine sivik ji jêr ve hatin. Li ber guhêñ wî, gav biçûk û sivik bûn û wî ji xwe re

got ku hebû nebû, jinekê berê xwe dabû aramiya qatê jor. Wilo jî nêrinêñ wî bi pêlikan girêdayî man ta ku keçek, ji wî re, di valahiya deverê de xuya bû. Keçê çavêñ xwe garandin û wê masa Dara hilbijart û li pêşîya wî rûnişt. Wê jî pritûkek ji çenteya xwe ya destan derêxist û piştî ku wê du sê caran li Dara nihêri, awîren xwe di sînga pirtûka xwe de çikandin.

Nale-nala daran û care-cara ba hatin bîrrîn û nema êdî gihane hundîre çayxanê. Û Dara nema xwe bi tenha serê xwe dît. Bi çend nihêrinan, wî di navbera xwe û keçê de, ew çend bihust pîvandin û bi kêfxweşiyek diyar, di dilê xwe de, ji xwe re got: "Baş e, pir baş e! Wê dikarîbû li hezar ciyîn din bimaya, wê dikarîbû li paş stûnekî rûniştibaya, ma stûn ji vê çayxanê kêm in? Wê dikarîbû jî li qatê jêr bimaya. Lê ew helkişya û li hevberî min rûnişt. Baş e, pir baş e!"

Dara pêşî bi dizî û paşê eşkere, nihêri û di nava xwe de berdomand: "Eger dilê wê nexwestibaya, ewê li mala xwe bimaya, ma di rojek weke vê roja han, ku Xwedê jê nestendibe, kî ji mala xwe derdiikeve?"

Kec, bêhawê bi ser Lîza ve diçû û vî tiştî dihîst ku Dara bêhtir di nav xwe de bikele. Por, pêşanî, ebrûh, mijang, çav,

lêv, çeng, rûhinarik, hemû yên Lîza bûn. Lê wê keçê kincê zivistanê bi ser bejna xwe ya zirav de dakiribûn û wê dihişt'ku tişt li ber çavêñ Dara di serê wî de, bêhawê tev li hev bibin.

Di wan salêñ dawiyê de, Dara her dem li ser welêt dihizirand û difikirî. Ew bi pir tiştêñ din ji xerîk û mijûl dibû. Yek ji wan tiştan pirsa tenhayiyê bû. Dara di xwest zencîra tenhayiyê bisikîne, bi dost-hevaltiya çend dostêñ ewrûpi û bi saya jineke xweşik û zana. Dara di kesaniya frensiyan de dixwast ji xwe re pişteke xurt, sitareke mezin biditaya. Wî dixwest bawer bikiraya ku eger çareyek ji bo jiyna wî ya tevlihev û tarûmar peyda bibaya, ew dê bi saya ewrûpiyan peyda bibûya. Di tenhayiya şevêñ bêhawê dirêj de, di dijwariya sermaya tenhayiyê de, wî dixwest di kesaniya jînêñ ewrûpi de keştiya biserketin û azadiyê biditaya.

Keç ji Dara re ne pir xerîb bû û Dara ji xwe re got ku ew li ciyekî rastî wê hatibû û gelek caran dîtibû. Lê li kê derê? Kengî? Çawa? Wî nikaribû bersivêñ wan pirsan bidaya. Ji dêvila ku ew bi wê re biaxive, xwe nêzîkî wê bike, perda bêdengiyê bidirrîne, ew hinekî ji bîr kir û gotin û serpehatiya xortekî kurd anîn bîra xwe. Béguman gelek caran gotin û serpehatiya Avdilqadir bi bîra xwe ve anîbûn.

Di şevekê ji şev û ahengên kurdan de, li bajarê Parîsê Dara rastî Avdilqadir hat. Dara ne ji mîj ve gihabû Parîsê. Avdilqadir, ji ber gelek tiştan bala wî kişand û gelek caran pişti wê şevê ew hevûdudîtin hate bîra wî. Xort bala Dara kişand, ne tenê ji ber ku wî rengê porê xwe bi dermanan zer kiribû, lê ji ber tevgera xwe, dan û standinêñ xwe, çekêñ xwe û ji ber wan kesêñ ku wî ew li dora xwe civandibûn... Wê rojê ji, li derive sar bû û kurdan xwe gihandibûn hev û her yekî dixwest aloziyêñ jiyana li deriveyî welat ji bîr bikira. Rojêñ ges, rojê şahîyan bi bîra xwe bîhaniya. Wilo ji, eger di nêrînêñ jin û mîran de xemgînî nedihat vaşartîn. Kêfa Avdilqadir li cih bû, her ku ew dilîviya ew kêt ji wî diweşîya û dibariya. Keçekî hûrik xwe xistibû bin çengan û hema wê destê xwe dixist bin çakêta wî, te digot qey qafalî bi ser de hatibû. Dara di wê şevê de pir tişt bi çavêñ serê xwe ditîn û bi guhêñ xwe bîhistin, wî naskir ku xort, bi guhêrandina rengê porê xwe nerazî bû wî navê xwe ji guhêrandibû û wî ew ji Avdilqadir kiribû Rody.

Tevlî ku Rody nedida xuyakirin ku haya wî ji nêrînan hebû, xweş dizanîbû ci li hawirdora wî dibuhurî. Dizanîbû ku Dara zuq li wî mîze dikir. Wî bîstikekê dev ji keça ku xwe bi wî ve dizeliqand berda û xwe nêzîkî Dara kir. Wî destê xwe danî ser milê wî û ew bi nermî ber bi masêñ ku xwarin û vexwarin li ser

wan hatibûn rêzkirin, kişand. Ji bo şevê, jînêñ kurd nanê welat û hemû xwarinêñ kurdî çêkiribûn. Wan sêniyêñ birincê, kûfîte, tîrşikê, pelêñ rezan û pelêñ lehanan û mast û xeyar, li ser masan raxisibûn. Rody kûfteyek rada devê xwe û paşê, destê xwe dirêji şûşeyek bîra kir û ew bi ser xwe ve kir. Rody dixwest tiştêñ bibêje û wî nehişt ku Darayê Dihokî pir li hêviya wî bimîne.

- Binêr xorto, tu nû ji welêt hatiyî û hêna tu çavgirtî yî. Bi rastî, ez ji te re bibêjim, awirêñ te bêhna min teng dikin. Lê ne xem e. Ez dizanim tu jî rojekê werî guhertin.

Dara dengê xwe nekir û Rody rahişt kûfteyekê din. Pişti ku wî ew bi bêhntengî cût û daqurtand û bêyî ku haya wî pir ji Dara hebûya domand:

- Mirov gerek weke lastikê be û li gor bayê serdeمان here. Bawer bike ku eger tu bixwazî ciyê xwe di nava gelê ewrûpi de bibînî, gerek tu weke lastikê bî. Keçen vê derê ji xortêñ nerm, yên weke lastikê nerm hez dikin.

Rody di nav lêvên xwe de hinekî keñiya û li keçâ ku weke sêwîyan bê wî mabû nîhîrî:

Mirov gerek bizanibe çawa xwe nêzîkî ewrûpiyan bike.

Haya Rody nema ji Dara hebû û ew di ber xwe de diaxîvî. Wî çend qurtêñ li dûv hev li şûşeya bîrayê xist û şûşeya vala avête ser maseyê. Paşê li Dara vegeyîa û ji bîr kir li ser ci dihaxîvî. Ew bi kêt dixuya. Diyar bû ku wî ciyê xwe di nava ji-yana Parîsê de peyda kiribû û nedixwest ku ew ci ji destê wî biçûya. Pişti ku ew wilô li ser nêrînêñ xwe axîvî, cû kete nav hevalêñ xwe û berê xwe da dîskotêka "dîlangeha" herî mezin di bajêr de. Berî ku ew di nav gurmê-guma Parîsê de ji ber çavan biketa, Dara hat bîra wî, li paş xwe nêrî û bi dengekî hinekî bilind got: "Lastikê ji bîr meke hal!". Dara bêdeng mabû û nema dizanîbû wî di wê şeva han de ci dikir. Ew di ciyê xwe de weke gêjan ma, ta ku hevalekî bi destê wî girt û ew ber bi govendê ve kişand.

Govend û demêñ govendan ji mîj ve ji cîhana Darayê Dihokî dûrketibûn. Wê rojê, di wê çayxanê de, ew rûnişti bû û gotinêñ Rody-Avdilqadir xweş dihatin bîra wî. Te digot ew û Rody di şeva cûyî de pêrgîn hev bûbûn. Gotinêñ Rody helbet rîyîne fireh li ber wî vedikirîn û ji ber vî tiştî, ew dihatine bîra wî û bi gaziya dîlê wî dihatin. Wan çareyêñ hêja li ber wî pahn dikirin û bêyî ku haya wî ji wî hebaya, Dara li neynika li ser diwêr nêrî û destê xwe di ser porêñ xwe yên reş re bir. Eger wî bi ya Rody kiribaya, wî dê ji mîj ve porêñ xwe zer kiribaya. Di neynika li ser diwêr, porêñ wî her dem reş bûn. Tevlî ku, di wan salêñ dawiyê de, çend tayêñ sıpî ketibûnê.

Dara careke din keça li hevberî xwe

dît û li wê mîze kir. Ew keç... ew çend bedew û dilbir bû ku di xewnen şevan de ji peyda nedibû. Lê aneha, ew li hevberî wî rûnişti bû û xwe ji qazî û nazîyan, di nav pelêñ pirtûka xwe de winda dikir. Ji nişkê ve û weke ku wê bizanibaya ku Dara cegevê xwe danîbû hev, wê serê xwe bilind kir. Dara gotinêñ xwe amede dikirin.

- Ez hêvidar im ku te aciz nakim. Bi-buhure eger min te nerehet kir, bi-buhure! Min dît ku tu bi tenha xwe bûyî û min xwest bi te re hinekî bihavivim."

Dara rawestiya û xwest şûna gotinêñ xwe li ser rûyê keçâ firensi bibîne. Rûyê keçê weke xwe ma û Dara naskir ku li zora wê çû. Lê wî dabû navê û nema dikaribû paşûber vegeyîaba û berdomand:

- Ez xwe bi te didim naskirin. Navê min Dara ye, Darayê Dihokî. Weke ku navê min nişan dide, ez ji bajarê Dihokî me. Ez kurd im ji Kurdistanâ Başûr im û ez ji çend salan ve ye li Parîsê me."

Keç, weke ku ew li hêviya van gotinan baya û weke ku wê ji mîj ve gotinêñ xwe di serê xwe de amede kiribana, wê nehişt ku Dara gotinêñ xwe dirêjtir bike û bi bêhntengî gote:

- Bes e, Dara, bes e... Ev cara sedî ye ku tu stirana xwe ya kevn hema ji min re dibêjî. Ma tu nikarî li ser tiştêñ din bi-havivî?"

Dara nizanîbû ci bigotaya. Wî nêrînêñ xwe birin derveyî çayxanê, nava şax û çiqilêñ darêñ ku nizanîbûn çawa xwe ji hovitiya bayê har biparêzin. Care-cara ba û nale-nala daran careke din gihan guhêñ wî. Dema keçê dît ku ew bêdeng ma, wê qerfîn xwe kirin û dengê wê tevî dengen ku ji derive dihatin têkel bû:

- Bibêje, Darayê Dihokî... Kanî şapîken te? Kanî xencera te ya zîvin a ku te serê xwe pê bilind dikir?"


Pişti van gotinan, wê welê berdomand:

- Bibêje, Darayê Dihokî? Tu wê ci ji xwe re bikî keys da ku tu xwe nêzîkî min bikî? Da ku tu bîhêlî dilê min bi te bişewite? Perçêñ Kurdistanê? Şoreşa Şêx Seîd? Kî dizane? Belkî miriyêñ bajarê Helebcê?"

Dara bi xemgîniyeke diyar nêrînêñ xwe li ser çiqilêñ ku dikirin hawar gerandin û paşê, serê xwe xiste ber xwe. Wê rojê, wî dixwest li ser tenhayiya xwe, bêxwedîka sermaya ku xwe berdabû nava hestiyêñ wî bihavive. Wî dixwest li ser derdêñ xwe yên pir, derdêñ girêdayî bi bajarê ajotinê (nefiyê) bihavivî. Lê zimanê wî, di devê wî de bûbû weke textekî û ew nedilîviya. Qerfîn keçê, zimanê wî di korta devê wî de pûc kiribûn.

Keça ciwan li saeta bezinê destê xwe nîhîrî û weke ku dilê wê hinekî hênik bibaya, dengê xwe daxist.

"Tu dizanî Dara, ez kurdêñ li Ewrûpa



xweş nas dikim. Çawa ku hevalê te Rody bawer dike ku ew keçan nasdike... Beşek ji we bi navê welatê parîşan di-xwaze têr bixwe. Beşek dixwaze dilê keçên bêhiş bi xwe bişewitîne. Beşek ji xwe dihavêje devê gurê har û bawer dike ku ew ê bi saya ewrûpiyan welêt rizgar bike."

Keçê çavêن xwe ji çavên Dara derxistin li derive nêri û paşê, bi dengekî bi zor dihîşt guhêñ Dara, wê berdomand:

"- U beşek, ji bêcariyê, dîn dibe, yan ber bi dinbûnê ve diçe."

Wê careka din li saeta xwe nihêri û xwest rabaya. Dixuya bû ku ew nikarîbû bêhtir bimaya. Dema wê dît ku deng ji Dara dernakeve, got:

- Ma xweşikbûna rû û laşê min ne hêja ne ku tu ji bo wan her tiştî ji bîr bik? Hetta navê xwe û navê bajarê Dihokê ji, ji bîr bik?

Bi wan gotinan, ew rabû ser xwe û wê xwest di nav lêvên xwe de bikeniya, serê xwe xwar kir û nema rûyê wê ji Dara ve

dihat xuyakirin. Lê dengê wê xweş digiha guhê wî. "Em ê careka dinê hevûdû bibînin. Ji bîr meke ku em ji kesêñ nerm, wek lastikê nerm hez dikin."

Dara pelên pirtûka xwe dan hev û bi pêlikan ve daket. Li jêr, li ciyê xwe, Lîza xwe careka dinê li ser qûma nerm ramîrandibû. Wê kincêñ xwe yên zivistanê ji xwe kiribûn û laşê xwe dîda ber tava rokek xweş. Ew her û her dikeniya û şûşa Koka-Kola'yê her di destê wê de bû.

Dema Dara derket, bayê xurt xwe li canê wî pêçand. Wî li hawîrdora xwe nihêri, li bajarê sar û li darêñ baxçê li hevberî çayxanê nihêri û bi dûr ket. Rody û gelek xortêñ hemwelatiyêñ wî, li ber çavêñ wî geh dibûn weke guran, qîlêñ xwe di canêñ hev de diçikandin, geh dibûn weke pisîngan û di nav diwarêñ Parîsa bêhawê mezin û tavlihev de xwe vedîşartin! Li derive, pir sar bû û di wê bîstikê de, Dara pir bêriya rûyê diya xwe û destêñ bavê xwe yên ku kîfxweşî ji wan dibariyan kir. Wî bêriya

xwehêñ xwe, birayêñ xwe, dost û hogirêñ xwe kir. Wî pir bêriya darek gulêñ sor ku wî bi destê xwe di hewşa malê ñeçandibû kir.

Wilo ji, eger berî deh salan ji Darayê Dihokî bihataya pîrsin:

"Gelo gi tişt hew di bin stûna asmêñ de ji wî nexweştiñ heye", wî dê di cî de vegerandibaya, bêyî ku ew pir zimanê xwe di devê xwe de bigerîne: "Ew bêwelatmabûn e, ew ji welat dûrxistin e" bigotaya. Lê ji deh salan û vir ve, eger di wê rojê de û nemaze di sermaya wê roja han de, hem ew pîrsa han ji wî bihataya kirin, wê bêguman, bersiva xwe bi awayekî dîn bidaya.

Dara, di wê sermayê de, li wî bajarî, weke sehekî kotî, weke sehekî bê xwedî bû ji ber ku tu kesî ew pîrs ji wî nekir, wî ji tu bersiv neda.

Wê rojê, bayekî xurt li ser cadeyêñ Parîsê dikir vîze-vîz û wî mîna carûdeh pehn û nayê xuyabûn cade û baxçeyêñ bajêr ji kesan vala dikirin... ■

A zad bi dengekî nizim pirsî."Yadê, bavo dê kengê vegere?" Te digot belku ne dixwest keseki din xeyn ji dayka wî vê pirsê bibihîse. Nazê kir ku wê dengê kurê xwe ne bihîst, lêniherî û got: "zû qedeha xwe vala ke, ji bo ez ji te re dîsan tijîkim. Zû, zû, hîna çay sar ne bûye." Azad dest ne avêt qedehê û ne jî li dayka xwe niherî. Berî çend salan, dema ew hê mindalekî biçûk bû, wî sê çar qedeh çay li ser xwarina taştê vedixwarin, lê belê çaya iroj weke ava dilopan soravîn bû, ne bi tama xwe tama çayê bû û ne jî şeraniya xwe. Weke rojêni kevin şekirê kapikrîn jî di tasê de tune bû. Ji bo mirov têke devê xwe û çayê li dû bi ser xwe ve ke. "Yadê, bavo dê kengê vegere?" Dîsan Azad ji dayika xwe pirsî, ya ku ji dest ne hat der careke din guhêñ xwe di derheqê pîrsa lawê xwe de kerr bihêle; rabû ser xwe, ber bi Azad ve meşîya, li ber wî danişt, her du destêñ xwe li dora wî gerandin, ew hembez kir û bi dengekî pîrr nizim di guhêñ wî yê çepê de got: "Azad, min jî bîra bavo kiriye, weke te; yan belku hê bêhtir. Ew ê were înşellah hefta li pêş. Ger na, meha tê ew dê were. Têye bîra te ew çawa şevekê tev hevaleki xwe ji nişka ve ket hundir? Na, te nedît ew çawa ket hundir. Lî te dît çawa wî tu ji xew rakirî û tûrîkên şekir û xurman kirin destêñ te. Ewê di van rojan de dîsan were, ez dizanim."

Hejimara léxistina dilê Azad bi bersiva dayka wî re rabû jor û baş hat bîra wî, çawa bavê wî ew di kûraniya şevê de cara berê ji xew rakir. Berf wê demê hê tune bû. Dawiya payîzê bû, li derve vîze vîza bê bû. Ew seeta wê şevê weke xewneke şerîn dihat bîra wî. Hundîr xaniyê wan ji dûyê cigaran tiji bûbû. Mirov zexim, debançe li pişte, tifing li pêş û ser dawîya doşega wî rûniştiñ û bavê wî jî ew kiribû hembezâ xwe, radîmûsa û tûrîkên armûxanan didan wî. Dû rohilat, dema ew ji xew rabû, ji şeva cûnê tenê, bîhna dûyê cixaran di hundir de mabû. Dayîka wî tûrîkên şekir û xurman veşartibûn. Divê bû ku ew haya keseki negihîne hatina bavikê ya şeva buhirî. Nazê, dayka wî, tenbe li wî kiribû.

Azad hê di hembezâ Nazê de bû, dema diya wê hat bîra wî. Zarokiya diya wê jî weke Azad derbas bûbû. Kalkê Nazê, Memê, di navbera salêñ 1946 û 48'ê de tenê sê caran di nîvîn şevan de hatibûye mal û dûre şevekê li ser sinor hatibûye kuştin. Çavêñ Nazê nedîkaribûn édi hêstiran paşve vegerîn, yên ku dest pê kirin li ser rûyê Azad bibarin. Kur û dê dilêñ xwe bi gîrî honik kirin.

Mam Reşîd ji bîrê av dikîşand. Vê sibê dunê pîrr sar bû. Bayê şeva borîn berf li ser erdê hişk û luht kiribû. Her roj keça wî Bihar dicû avê, lêbelê iroj Mam Reşîd zû ji xew rabûbû, nîvîja sibê kiribû û hatibû ser bîrê avê ji ber qîza xwe ve bikişine. Rojêni Mam Reşîd hemî li vî gundiñ derbas bûbûn. Di wan de yên xewş ji û yên reş ji hebûn. Lî tev hemî kêmasiyan jî, ew ji jiyanâ xwe razî bû. Ta berî salekê, dema kul-

feta wî rojekê nexweş ketibû û di nava du sê rojan miribû. Mirina şuya wî şahiya dilê wî jî bi xwe re kiribû axa gorê û nema édi keseki ken li ser lêvîn wî ditibû.

Ji zaroyen Mam Reşîd tenê Bihar hê bêlar bû. Ew ên din hemî xudan kulfet bûn û iroj li şûnêñ din diman. Neha bûkeke wî tev zarokê xwe tev wî û Biharê li Gund rûniştiñ. Çimku kurê wî Seyid jî weke mîrê Nazê pêşmerge bû.

Mam Reşîd satila xwe tijî kir, ew li şûnê hîşt û hebekî ber bi wê de çû. Li ser kevirekî reş rûnişt, tûrîkê titûnê ji bêrika xwe derêxist û dest pê kir cigarekê bipêce. Kelêboxa ji satila avê radibû bi kinî bala wî kişand ser xwe, lê dûre herdu çavêñ wî xaniyêñ gund bo xwe kirin amade. Hate bîra wî ku çawa wî û Resûl Mamend, xezûrê Nazê, berî salne pîrr xaniyêñ xwe di hundir zikê sê heftan de, yek li kèleka yê din lêkirin. Bêyi ku bixwaze, stûyê wî ber bi hêla merzelê gund liviya û çavêñ wî têkoşîyan ku gora Resûl di nav yêñ din de bi cîh bikin. Dûyê cigarê giran giran di herdu bêviîen wî re derdiket û xwe di nav bayê sar de wenda dikir. Tama cigarê ji her dem bêhtir tal bû di devê wî de û li kêfa wi nedihat. Lî carekê hatibû vêxistin û diviya bû were kişandin. Di dilê xwe de Mam Reşîd li pêçandina wê poşman bûbû, çimku wî pîri caran bîryar dabû, ku êdî li xurînî cigarê nekişîne. Mam Reşîd kutek din li cigarê xist, ew di bin lingekî xwe de vemirand, rabû ser xwe, satila avê bi destê rastê rakir û hêdî hêdî ber bi mal meşîya.

Her der vê sibê gewr-sipî xuya dikir, xeyn ji malan. Serén kaşen li dordora gund ji mij xuya ne dikirin. Xeyn ji dengê segekî tu dengen din nedihatîn guhan. Lî dirêj nekir. Dengê segekî bû, yê duduyan û sisîyan û çaran... Mam Reşîd satil danî û li dora xwe mîzê kir. Tiştek nedihat xuya kirin, ku mirov bîbêje, ew ê bikaribe bîbe sedema ewte-ewta kûcîkîn gund. Hê Mam Reşîd di vê girikê de mijûl bûbû, dema dengê balefirân ji dûr ve kete guhêñ wî. Wisan, ew têgehişt çima deng bi segan ketîye; dîsan dest avête satile ew rakir û meşa xwe domand. Hatîna dengê balefirân di van rojan de ne tiştekî ecêb bû. Dengê ji ezmîn her ku çû bêtir bû. "Tu caran evçend nêzîki li gundê me nekirine." Di dilê xwe de digot Mam Reşîd, dema ku gurmîniyeke weke dengê ewreke meha nisanê hate guhan, pîrr dirêj ne kir gurmîniyeke din, içar ji heleke gund hat û erd di bin lingêñ wî de hêjand, satil vê re ji dest xist. Gurminîya çaran Mam Reşîd li ser qûnê xist, yê ku ber xwe da, ji bo rabe ser xwe, û dît çawa zaniyê wî û yê Resûl di hundir dûyekî gewr û reş de wenda bûne. Her du çokên wî ketin ber û sist bûn. Janêne zirav xwe berda kuranîya dilê wî, ew li ser zik kete xwarê û rûyê wî di komika berfê de wenda bû.

VEGERA MAL

Şahînê B. Soreklî

Hê sar bû, lê yekî dizanibû ku zivistan edî mala xwe hêdî hêdî bar dike. Sê hefte û çar roj mabûn ku Newroz xwe bigehîne holê. Şerko, mîrê Nazê di şeva reş de nêzîki li gund dikir. İroj ew bi tenê xwe bû. Du hevalen wî li gundekî din mabûn û wan ê ber rohilat dîsan li şûnekê hevûdu bidîtana. Barê Şerko ne sivik bû. Xeyn ji Klaşnikofê; du derax û maleke gullan li pişta wî bûn, çar bombeyên destan, her dudu di tûrikekî de, bi qayışa wî da hatibûn girêdan. Li ser milekî wî jî tûrîkî mezîn hebû, yê ku di hindir xwe de şekir, çayî, şûşak donê gazê û tiştên din, ku ji qaçaxçıyan hatibûn kirin, dihewandin. İroj kurê Mam Reşîd jî hin titûn û hûr-mûrén din ji bo malbata xwe tev Şerko şandibûn.

Ev bûbûn nêzîki pênc mehan, ku Şerko û jîna xwe hê pênc deqe ji çavêñ ên din dûr, bi hev re derbas ne kiribûn. Dilê wî dikir gupe-gup û gavêñ wî bi lez pêşeye dihatin avetiñ. Desten wî yêñ hişk û sar ê bi bedena Nazê yê nerm û şerîn germ bibûna. Wey hawar! Wî çiqas bêriya Nazê û Azad kiribû! "Şekir û xurmeyên Azad, ez ê bêriya ji mal derkevîm bidîmê". Di dilê xwe de digot. Dûre ew demeke kin di hundir derd û xeman de wenda bû. Kengê aşitî dê vegere van dorhêlan? Kengê azadî dê têkevin şûna zordarîyê? Dengen segen gund Şerko dîsan hişyar kirin. Kişandina cigarake din û ewê bigehîsta mala xwe û ji bo xwe têxe binê lihêfê û bedena xwe û ya Nazê bike yet, û di evina dilan de wenda bibe. Ewê dûre donê gazê berde paporê, ava çayê bide ser. Cigareyeke gindori bipêce, guh bide ser dengê Nazê û ji wê re bipeiyive. Dema wan têr şor kirin, ewê deng li Azad ke, wi di hembezâ xwe de bide rûnişkandin û ramûse. Dîsan ramûse û careke din... Dûre ewê tûrîkên naylon yên tiji şekir û xurme bide wî...


Tirseke sivik ji nişka ve kete dilê Şerko, yê ku bi dengekî nizim ji xwe pirsî: "Kuro lawo, ka xani?" Wî baş dizanibû, ku wî re şâş ne kiriye. Wî û segen gund hev nas kiribûn û kûcîkî Mam Reşîd bi wî re dimesîya, hema xwe davete ber lingêñ wî, weke ku dixwaze haya wî bikişîne ser tiştekî. Tirs herku çû bêtir bû û tamareñ Şerko sist kirin. Bi carekê ve wî dît, çawa tîrsa neha daye ser tîrsa ji mirinê. Rojekê derbas nedibû, bêyi ku ew û mirinê li çavêñ hev nenihérin. Lî ci caran tîrsa mirinê tamareñ wî wisan sist nedikirin. Ew édi fêr bûbû wê rewşê. Dema ew gehîşt dara ku bavê wî di roja bûyîna wî de çikandibû, tenê komên kevir û xweliyê li şûna xaniyê wî û yê Mam Reşîd xuya dikiñ.

Pişta xwe da darê û kir ku bigirî, lê ne dikîrbû. Jan û gîrr û şewat û gehra di dilê wî de, nedixwestin xwe têxine hindir hêstiran ji bo werin der. □

MELLAYÊ CIZIRÎ

Mîrê evîn û dildariyê

Şerefxanê Kurd



Bê guman e, dema ku mirov rûpe-lênen dîrokê birûpelîne, wê li gelek kesen paye bilind û nirxdar rast were. Ev di dirêjiya dîroka me de mîna rastiyekê xwe şanî dike û derdikeve holê. Qehremanê gelêri, yên ku ji bo parastina rûmet, namûs, êl, xak û nav û dengê xwe, destanê berxwedanê li hember doliwgeriya biyanî û dagîrkeren hoveber bi xwîna xwe nîvisandine gelek in. Bi rastî mirov nikare wan leheng û cegermendant bijmîre û yeko yeko bîne ziman. Heya ku em wan û lehengîya ku afirandine derînin ronahiyê, em bê gav dimînin ku pirtûkan li ser wan binivîsin. Ji bili vê yekê mirov nikare bi hesanî li ser wan binivise. Ji ber ku her yek ji wan bi serê xwe destaneke qehremaniyyê bûye. Ji lew em dibêjin, ne hewcye em li ser wan yeko yeko birawestin. Ma gelo, ev rûpela dikare Kela Dimdimê û berxwedana Biradost, a ku hîma Şahê Farisî Ebbas leqand û bi mehan mîna egitan li ber xwe da bîne ziman?! Gelo, mirov dikare bi vê hesaniyê Seyid Riza, yê ku li ber kîndira daleqandinê bi serbilindî got:

" Ez mîrekî 75 salî me. Vaye dibim

şehîd, di nava rêzên şehîdên Kurdistanê de cih digirim. Dêrsim dikeve bin, lê hemâ wê Kurd û Kurdistan her bijîn. Wê ciwanê Kurdistanê heyf û toleyê hilînin. Bimre zordarî û dagîrkerî, bila bimrin nemerd û sitemkar..."

Her weha Şêx Seîdê Piranî yê kal û rihi sipî. Şêxê ku di kîliya dawiyê ji jiyana xwe de li hemberê dagîrkeran qêriya û got: "Ez gelekî serbilind im, ku ji bo dozeke mafdar li ber kîndira daleqandinê me. Ev ji bo min rûmet û şerefekê mezîn e. Wê ji pê re zarok û neviyêne seriyê xwe li ber we netewînin. Wê bizanibin ku bav û kalîn wan xwesiparî nepejîrandin, li ber dijmin negeriyan û serî netewandin..."

Di vê dabarê de nimûne gelek in. Niha ji ev qehremaniya ku bi rastî bê nîse yexwe şanî mirov dike. Ma wesiyet nameya nemirê me yê mezîn M. H. DURMUŞ, dema got: "Li ser gora min binivîsin ev deyndarê Kurdistanê ye..." Gelo ev ne nimûneyeke dîrokî ye?! Jyana xwe gorî Kurdistanê dike û hîn bi ser ve ji dibêje ez deydar im! Nimûneyen weha, ne tenê di dîroka Kurdistanê de, lê di dîroka cîhanê de ji kêm in.

Di şoreşa me ya hemdemî de, bi dehan hene yên ku fişeka dawiyê ji bo xwe hîştine û bi mejiyê xwe ve tecqandîne. Tenê da ku birîndar nekevine nava destêni dijmin, ew lepênu ku bi lekeyen xwînê sor bûne. Ji bo ku nebin dîliyên şer, rewanê xwe bi vî awahî pak dikirin û bê mirin koça xwe bardikirin.

Belê, bi wê qehremaniya ku serê mirov nikare bilindiya wê hilgire, ciwanêne me yên ku temenê wan di navbera salên 20-25 salî de gelek ji wan weha şehîd ketine. Wan bi xwîna xwe ya sor û zelal, gul û gulîkîn Kurdistanê rengi rengi kirine. Ma gelo, ji vê dilîri û gernasiyê bilindir hene?! Êdî li vir bersiva pirsê bidin, ez ji we re dihêlim.

Di dermafê vê wêrîn û mîrxaziyê de, gelek dîrokna û rojhilatzanê biyanî gotine ku "dîroka Kudistanê ya qehremanan e" Lewra mirov dikare li vir bêje, "dîroka me ya netewi qahreman û leheng afirandine. Ev rastiyekê, tu hes nikare înakar bike û bêje na! Heya bi dijmin be ji gotiye û dibêje ku, gelê Kurd ji mirinê natirse, nizane mirin çiye. Kesê Kurd mirinê ji xwe direvîne û ditirsîne.

Belê, çawa ku dîroka me di warê

mêrani, egidî û cengaweriyê de kesêen bilind û nirxdar deranîne holê, her weha di warê torevanî û wêjeyê de ji, pir kesênu ku di dîroka cîhanê de kêm wekî wan nimûne hene afirandiye. Wekî ku tê zanîn, piraniya van torevan û wêjevanan, di dema feodalizmê de afirîne. Anglo, dema ku feodalizm li Kurdistanê hîna di ciwaniya xwe debû. Lewre em dibînin ku klasikên me di bin bandoriya ola Îslamî de nivîsanren xwe pêşkêşkirine. Ji ber ku feodalizma dolîwger, a ku Kurdistan xistibû bin destlatî û karbidestiya xwe xwedanê wî edeolojiya Îslamî bû. Dema ku em pevek û gotinên biyanî û bi teybetî yên Erebî (ji quranê) di berhemên wan de dibînin, divê em bizanibin ku ji ber wê sedemê tê.

Em li vir dikarin bêjin ku toreya me, tevî wan gotinên biyanî, ku bê dixwaza dil têde cih girtine payeke bilind digire. Kelepora ku bavpirêñ me heyâ roja hîro û bi dirêjiya sedan salan ji me re hîstine, li aliyeke toreye, li aliyeke berxwedan e û li aliye din ji nokerî û xiniziye. Belê, nokerî û xinizi ji di dîrokê de kelepor maye. Gelo, ma wê neviyên Idrîsê Bedlîsi şopa wî neşpînin!

Ez guman dikim, me piçekî di vê debarê de direj kir. em niha vegerin şer eniya tore û wêjeya Kurdî. Bawer im vekirina rûpelên jiyana torevanên me yên klasik pêwîstî û divêtiyeke. Divê mirov wan bide bide nasdan û çendî ji dest were berhem û jînameya wan bine ziman. Min xwest li gora pêkanîn û derfetîn xwe, hineki li ser torevanê klasik, mîrê evîn û dildariyê, xwedan û mamostayê Dibistana Sor,li Cizîra Botan, Mellayê Cizîri bisekinim. Çendî ku ji dest min were, helbestêñ wî verêsim û ji xwendavanên hêja re bînim ziman.

Mîr Celadet Bedirxan, bî îmzeya He-rekol Azîzan, di Kovara Hawarê de, weha torevanên me yên klasik li gora jîyan û temenê wan di nivîse: "Eli Herîrî, Mellayê Cizîri, Feqiyê Teyran, Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Salimê Beyazîdî, Şerfxan, Mirad Xan, Siyapûş, Axayok, Mewlînda Xalid, Mella Yehyayê Mizûrî, Mella Xelîlê Sertî, Şêx Evdilgadirê Gêlanî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Evdilrehmanê Taxê, Nalî, Şêx Riza, Hecî Qadirê Koyî, Şêx Nûredînê Birifkî, Evdilrehmanê Axtepî,



Eli Teremaxî, Mella Ünisê Erteqînî, Mellayê Erwasê"

Ji van hozanên klasik hinek hene tenê Kurdnasan di lêkolînên xwe de çêl û qala wan kirine û hew. Hîna berhem û nivîsanren wan nehatine weşandin û belavkirin. Ji bilî van kesan ji gelek zanyarên me wenda û heyâ niha veşartî mane. Sed mixabin, vê navê wan maye.

Em werin ser mîrê evîn û dildariyê Mellayê Cizîri. Da ku em li gora derfetêñ xwe jiyana wî ya niximandî derînin ber çavan û helbestêñ wî ji xwendavanen re bixwînîn. Bi rastî mîna gelek hozanova-nen me yên klasik, mîjuya jiyana Mellayê Cizîri ji ne eşkere ye. Her lêkolînvan û rojhîlatnesekî li gora ku bîhistîye, mîjuya jiyana wî daniye. Em dikarin li jêr bi dermafê vê yekê hinde nimûneyan bînin ziman.

Mamosta Hejar di pirtûka xwe ya bi sernîvîsa "Dîwana Arifê Rebbaneî Şêx Ehmedê Cizîri, Meşhûrê bi Mellayê Cizîri" de dibêje:

"Navê wî Şêx Ehmed e, ji şeniyê Cizîra Botan e" Li cihekî din mamosta Hejar ji dîroknas û nivîskarên Kurd û yên biyanî gelek nimûneyan tîne ziman:

"Mamosta Elaeddîn Elsiccadî dibêje

ku, Mellayê Cizîri di navbera salên 1407-1481'an de jiyaye. Anglo di sed-sal û çerxa 15'an de. Navê wî Şêx Ehmed e. Navê bavê wî Şêx Muhammed e. Ji Cizîra Botan e. Ev Cizîra Botan, a ku gelek keşen mezin û sergevaz afirandiye, Mîrê evînê ji, Mellayê Cizîri aniye rûyê gerdûnê". Lê dîsa ji Elaeddîn Elsiccadî dibêje ku, mîjuya jiyana wî di tariyê de ye.

Dr. Blêc Şêrgo, di pirtûka xwe ya bi sernîvîsa "El Qediye El Kurdi ye" de, bi dermafê jiyana wî weha dibêje:

Mellayê Cizîri, navê wî Şêx Ehmed e. Ji şeniyê Botan e. Di sala 1160'î de, li şarê Cizîra Botan koça xwe barkiriye. Di warê evîn û dildariyê de helbestêñ wî gelek in..."

Mamostayê mezin, M. Emin Zekî, di pirtûka xwe ya bi navê "Mîjuya Kurd û Kurdistan" de, weha dinivîse û dibêje:

"Navê wî Şêx Ehmed e, di sed sala VI'an a Koçî de jiyaye. Di dema destla-tiya Îmadeddîn, fermandarê Mûsilî de"

Rojhilatnasê Rûsî yê bi nav û deng, Alexander Jaba, di pirtûka xwe ya bi navê Hîkayetên Kurdî de derbarê Mellayê Cizîri de weha dibêje:

"Mella ji şeniyê Cizîra Botan e."

Di dema Îmadeddinê Zengî de jiwaye (540-556 Koçî, 1146-1166 Zayîni)"

Miftî yê Şarê Qamişlo (Kurdistana Başûrê Rojava), Şêx Ehmed Kurê Mîmemedê Zivingî, di pêşgotina Eleqid El Cewherî Fî Şerh Dîwan Mella El Cizîrî de weha tîne ziman:

"Navê wî Şêx Ehmed e. Bi navê Mellayê Cizîrî navdar e, ew jî ji ber ku ji Cizîrê ye. Gelek helbestên wî bi şanevana Nîşanî îmzikirîne. Ev jî tê wê watwyê ku ew ji tîrkevanê evîn û dildariyê re nîşan bû ye. Ji lew re nav li xwe kiriye Nîşanî, ev ji aliyekî ve. Lê ji hêla din ve, dibe ku Nîşanî ji şanika li ser dêma wî hatibe. Ji ber ku li gora tê gotin şanikek li ser dêma wî hebûye. Di gelek helbestên xwe de çêla wê şanikê kiriye..."

Li cihekî din dîsa didomîne û dibêje:

"Li gora diyaloga helbestî ya di navbera wî û Feqê Teyran de, xuya dibe ku ew di dema Feqê Teyran de bûye (1041 Z). Piştî lêkolînekê em têdighêjin ku ew di dawiya Nehsidî de hatiye dinyaOê û heya piştî Hezarî jiwaye. Guman heye ku ew heya 1050.K jiya be..." Di dermafê veşartina laşê wî de Zivingî weha dibêje: "Gora Mellayê Cizîrî li başûrê Dibistana Sor e. Mellayê Cizîrî bi xwe mellayê vê Dibistanê bû. Ev Dibistan jî li başûrê Sûra Cizîra Botan e..."

Em bi hev re li vir bixwînin ka Prof. Qanatê Kurdo ci dibêje:

"Mellayê Cizîrî di sedsala Xî'an de jiya ye. Ew şairê mîrê Cizîra Botan Îmadeddin bûye. Wî jî di sedsala Xî'an de mîriîtiya Botanê kiriye...Wezîrê Nadîrî dinivîse ku Mellayê Cizîrî li sala 1101'an hatiye dunyayê, û li sala 1169'an çûye dilovaniya xwe. Bi fikra min ev gotina nêzîka rastiyê ye. Mellayê Cizîrî di nîva sedsala Xî'an de jiya ya..."

Di dermafê zanîstî û şarezayiya wî de, Wezîrê Nadîrî weha dinivîse:

"Mellayê Cizîrî, mirovekî gelek xwendewar bû ye, şareza û zana bûye. Pispore edebiyeta Erebî û Farîsi bûye. Wî li Bagdadê xwendibû. Nivîsarêñ nivîskarêñ Ereb, Faris ên Dînnasiyê, Filosofiyê, Stêrnasî û Tebiêtasiyê xwendibûn..."

Em dikarin bigihêjin dawiya van nimûneyan û encamekê jê derînin ku, Mellayê Cizîrî di dema Îmadeddin mîrê

Botanê de jiwaye.

Mellayê Cizîrî û evîna dil:

Wekî ku tê dizanîn di gulistana evîndariyê de, di hozan û helbestên evîndarî û Xezelî, giyanî (rûhî) û eşqê de, Mellayê Cizîrî bi xwe dibistaneke. Bi sedan salan çendî ev dibistana çûye dewlemendtir bûye. Nehatiye hilweşandin, dem û dewranan nekrîbûye wêran bike û hilweşîne.

Ev e dibistana evîn û dildariyê Mellayê Cizîrî! Ji wan salêñ dûr û dirêj û vir ve bûye mamostayê evînê, bûye mamostayê yên ku dixwazin di warê evînê de binivîsin. Gulistan e, her kesê ku xwestiye li ser evînê binale guleke xwe jêkiriye û bi wê bêhna evînê serxweş bûye. Gelek hozanvanêñ mezin, ên mîna Ehmedê Xanî, Xarisê Bitlîsî, Pertew Begê Hekarî... û heya tu dîghêjî Osman Sebrî, Cegerxwîn û Qedrîcan, bandorî û hîkariya Mellayê Cizîrî di warê evînê de li wan tevan çêbû ye. Mirov nikare vê rastiyê veşere. Kîjan hozanvana dibe bila bibe, dema ku mirov helbestên wî yên evînî dixwîne, bê guman e wê bêhna helbestên Mellayê Cizîrî jê werin.

Li gora ku Şêx Zivingî tîne ziman, sedema ku hişt Mella bi ber bayê evînêkeve ev e: "Mellayê Cizîrî evîndarê Selma keça hakimê Hesen Kéfa bû. Dema ku çavêñ wî li bejn û bala wê diketin, hiş belav dibûn û bi ber pêla evînê diket..." Li cihekî din jî hinek dibêjin ku ew evîndarê keça mîrekî Cizîrê bû. Navê vê keçê li gora ku Mellayê Cizîrî dihelbesteke xwe de tîne ziman, Sitiya Bisk Kesb bû. Gora wê li yamac (ember) quesra wê bû. Mella her roj diçû piştâ xwe dida berkêlka gorê û helbestên evîndariyê dixwendin.

Mîrê evînê û pesna dilberê:

Bi şêweyekî wêjevanî ya afirandiyar, ku mejiyê mirov nikare hilgire, Mellayî Cizîrî pesna şemalî, çelengî û nazikiya dilbera xwe dide. Dema ku guliyêñ hûnandî, bisk û keziyêñ wê dipesinîne, tîne ber çavan ku hîna li ser rûyê gerdûnê mîna wê keçen nazenîn

peyda nebûne.

Raste, Feqiyê Teyran jî pesna dilbera xwe daye û gotiye:

Ey dîlbera gerden zerî Wey nazika dêm qemerî Qamet ji mûma fenerî Wêran ez im malim xerab

Belê, Feqiyê Teyran jî dibistaneke. Wî jî nav û berhemên xwe di zikê dîrokê de kolandine, ev nayê încar kirin. Lê dîsa jî mirov dikare bêje ku, tu kesî mîna Mellayê Cizîrî pesna dilbera xwe nedaye. Li jér em li van malikên wî guhdar bikin, gelo, ka di dermafê çelengiya dilbera xwe de ci dibêje:

Sef sef me dîn Hindî û Zeng Cengîzî hat Têmûrê leng Xef wan reşandin dil xedeng Teşbîhî tîrêñ Xan Şeref

Mellayê Cizîrî dixwaze bi van herdu malikan, dema ku bejn û balan dihejîne bîne ziman. Gelo, ci dixwaze bibêje? Em bi hev re van malikan verêsin ka Mella ci dibêje:

"Dema ku dîlbera Mellayê Cizîrî radi-be semayê û nazik nazik bejna xwe dihejîne, keziyêñ wê weha ji mirov ve xuya dîbin: "Me dît leşkeren Hindî û yên Zincî (Keziyêñ dilberê) rîz bi rîz û lek bi lek xwe ji bo cengê ama dikirin. Herweha leşkeren Cengiz xan jî hat, da ku êrîşê bibe ser arteşa Têmûrê leng. Tevayı wan leşkeren di qaha cengê de, xedeng û tîrkevan bi xef avêtine dil. Mîna tîrêñ Şerefjan xwe lidile min di-girtin û dihatin" Rûyê dilberê qada cengêye. Bisk û keziyêñ dilbertê mîna êrîşa wan leşkeran xwe dihejîne. Ji nişkêve jî ew tîrekevanêñ ku di şerde bi kar têne di dilê Mellayê Cizîrî de lêdikevin..."

Ji vê nimûneyê ve xuya dibe ku Mellayê Cizîrî di pesna dilbera xwe de mirovekî pispor bûye. Baş dizanî bi wêre biaxife û şox û şengîya wê bîne ziman. Di warê torevanî û wêjevanîyê de, ev afirandineke, mirov dikare bêje bê nişeye.

Li cihekî din, dîsa çelengiya dilbera xwe weha tîne ziman:

**Zulf çûne ser nûra zelal
Cerak were bayê şemal
Biskan ji ser dêman vernal
Zulfan ji ser cotê sed**

"Zulfan xwe bi ser nûra zelal de berdane (li vir nûr rûyê dilberê ye), ew rûyê rewşenî, ji min ve xuya nabe. Ey bayê başûr, carekê were û wan biskén mina şevê, ji ser dêman vernal. Da ku ez bibînim wan dêmên henarîn. Carekê were, wan zulfan hilde, da ku ez dibînim wan cotê şeran (li vir her dû çavîn-li gora şêx zivingî)".

Li ser rewşa kesên evîndar û aşiq, Mellayê Cizîri weha tîne ziman û dibêje:

**Xelko li min kin şîretê
Ew dilbera zerîn kemer
Min dî di halê xufletê
Hat der ji bucê wek qemer**

**Hat der ji burc û penceran
Dil girt û da ber xençeran
Ev rengê halê dilberan
Lew aşiqan xûn bûn ceger**

**Qelb û ceger min bûne xwîn
Lewre ku nû derbûn birîn
Ey can, were halêm bibîn
Wer ruh ji qalib bête der...**


Lê hema Zivingî di pirtûka xwe de dibêje ku, "ev malikên han ne yên Mellayê Cizîri ne. Ji ber ku helbestên Cizîri ne weha wate sivikin. Cizîri helbestên xwe mîna girêkan dihûne. Çawa be ji di dawiya helbestê de, mîna her helbestên Mellayê Cizîri, navê "Melê" hatîye nivîsandin:

**Zahir dibêjim pendî gîr
Da dil nedî zalfa herîr
Şubhê "Mellê" dibî esîr
Guhdêrê qewlê muiteber**

Peyva "Mellê" di vê helbestê de didirikîne (ispatdike) ku helbest ya Mellayê Cizîriye. Lê hema bi şêweyekî hesan û sivik nivîsandiye.

Dîsa di vê helbestê de pend û şîretan dide kesên evîndar, debêjê: "Ez eşkere ji we re dibêjim, da ku hûn di pêşerojê de poşman nebin. Dilê xwe nesiparin

zulfên herîrî, pêve girênedin. Heke hûn guhnedin vê pend û şşîreta min, wê hûn mîna "Mellê" dîl û hêşîrê wî dîl bin. Guhbidêrin, ey evîndar! Ez vê şîretê li we dikim, ji bo ku hûn jîyanke xweş bijîn..."



Li cihekî din ji weha pesna dilbera xwe dide û dibêje:

**Tenha ne Kurdistan didin
Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin
Ji Espehan têtin xerac**

**Çehvîn belek, qewsêne helek
Çerx û felek, xalîb melek
Fî hubbihe umrî delek
Welhubbû yecrî fî ûcac**

**Sahid hezar reng xemilîn
Reqs û sema pê kemilîn
Îro Mella em sed hilîn
Saqî werîn cama zucac**

Mella di xwaze di van malikan de bêje ku, ne tenê Kurdistan, Şîraz, Yeng,

Wan û Espehan buhayê çelengî û şemaliya te didin. Her kes dixwaze li ser çavan buhayê wê şemaliyê bide. Vaye ji Espehan xerac têne, tenê ji bo ku te bibînin. Gelo, ma ev çavêne belek, eb-rûyên xelekîn ên mîna çelengiya periyênu buhuştê, kê serxeş nakin? Vaye jiyan û temenê min ji min standin, tu di min de nehîştin...

Mellayê Cizîri, nikare dijminên xwe ji bîra bike. Li vir bi şêweyekî wêjeyî ya xurt êrîşî wan dike û dibêje:

**Dijmin ji can talan bitin
Ew xwe hero nalan bitin
Mêlak û dil kalan bitin
Lê bêtû ret xedarı çerx**

Belê, bila dijmin talan bibe, bila bi xwe binale. Bila cerg û hinav bibin kalan şûr û tîran, bila kîlî bi kîlî rastî lêdana şûran were. Bila şûr wan hinavan bibire, ew şûrê çerxa xedar.

Mellê bi dilbera xwe re diaxife, da ku wî ji evîna xwe rizgar bike. Serê xwe hildide û dibêje:

**Bes aşiqan mehcûr bikî
Şubhê Mellê rencûr bikî
Qelbê şikestî hûr bikî
Şûna birînan kûr bikî
Şema mejî pir nûr bikî
Bi zehrê xwe meimûr bikî
Nîv kaseya ferfûr bikî
Feydê li dilda fûr bikî
Dêmê j' rengê kafûr bikî
Dalan ji xalan dûr bikî
Pê alemê meqhûr bikî
Weqtê seher ku bade tê.**

Di encama vê kurte-lêkolinê de em dikarin bêjin ku, wê ev dibistana di hola torevanî de nemir bimîne. Wê Mellayê Cizîri bibe mîrê evîn û dildariyê.

Çavkaniyêñ gotarê:

- 1- Kovara Hawar (Mir Celadet Bedirxan)
- 2- Dîwana Arifê Rebbani, Şêx Ehmedê Cizîri, Meşhûrê bi Mellayê Cizîri (Hejar)
- 3- Mêjûya Wêjeya Kurdi (Elaeddin Elsiccadi)
- 4- Elqediye El Kurdiye (Dr. Blêc Şêrgo)
- 5- Mêjûya Kurd û Kurdistan (M. Emin Zeki)
- 6- El Eqid El Cewherî (Şêx Ehmedê kurê Mihemedê Zivingî)
- 7- Tarixa Edebiyeta Kurdi (Prof. Qanatê Kurdo)

Hevpeyvînek bi Serokê Komela Mafêni Mirovan - Şaxê Nisêbînê, Dr. Cemal Kahraman re


“Zimanê zikmakî bi zagonan nayê çareserkirin. Daxwaza gelê Kurd û vê zagonê ji hevûdin cuda ne...”

Dî mîjûya 12.2.1991'an de endarmê Yekitiya Rewşenbirên Welatparêzên Kurdistan (YRWK) rojnamevan G. Çiyan, li ser navê Kovara me Rewşen, hevpeyvînek bi Serokê Komela Mafêni Mirovan (şaxê Nisêbînê) Dr. Cemal Kahraman re çêkir.

Ji ber pêwîstiya vê hevpeyvînê, em li ser rûpelîn Rewşenê diweşîrin û pêskêşî xwendevanê xwe dikin.

Dr. Cemal Kahraman bi xwe mirovekî Kurd e. Di sala 1940 de ji dayîka xwe bû ye. Ew ji bajarê Nisêbînê, gundê Çalê ye. Dr. Cemal Kahraman, di wê deverê de mirovekî welatparêz tê naskirin, ji ber vê sedemê gelek caran ji hêla Conta leşkerî ve hatiye girtin û işkence kirin. Malbata wî bi xwe jî, yek ji malbatên Kurd ên welatperwer e, gelek şehîd pêskêşî Kurdistaneke serbixwe û azad kirine, wek M. Latif Yıldırım, Zubeyr Yıldırım...

REWŞEN



Rewşen: Weke ku tê zanîn, Komara Tirk di sala 1938'an de zagonek (qanûnek) çêkir. Bi vê zagonê jî zimanê Kurdî hate qedexekirin. Li gorî ku tê xuyanî di van demêni dawiyê de hewldanek heye, ji sistkirin û hilweşandina vê zagonê. Weke Komeleyeke ku bi mafê mirovahiyê ve girêdayîye, nerîna we li ser van bûyeran çiye?

Dr. Cemal Kahraman: Ev bîryara ku Tirkîye wergirtiye, heke ne ji ber ketina wê be, ne ji ber ketina politika wê be, bi xwe jî ne politikek be tiştekî baş e.

Lê ev têra wê nake, gereke Tirkîye gavênu ku guhertinê mezin bi xwe re bîne, û yê pêşverûtir bavêje. Weke nimûne, gereke zagonêni 141, 142 û 146 bi tevâyî werin hilweşandin. Gelo, kî naxwaze demoqrasî li Tirkîye pêk were!

Heke mirov bi awahekî din bêje, rakirina qedexeyan ji ser zimanekî hîndik e, têrê nake.

Bîryarênu ku hatine wergirtin, em bi xwe jê bi şik in, di bin de listokan dibînin. Ji ber ku gava mirov li dîrokê dinêre, di demêni ketina tengasiyan de, tim û tim bi tiliyekê hingiv dane devê hinan û bi vî awahî deng dane qutkirin. Heyf û mixabîn, ev bîryar jî ji ber sedemêni wilo hatine wergirtin. Ji lew re em pir bi vê bîryare kêfxweş nebûn. Em vê zagonê bi dilekî geş hembêz nakin.

Rewşen: Komara Tirk, di sala 1983'an de zagonek danî bû. Weke ku Dr. İ. Bêşikçi dibêje, di wan deman de zilm û zordarî li ser Kurdan xurt bû. Lî iro, weke ku berî niha min qal kiri-bû, dixwazin wê zagonê hilweşînin. Di nerîna we de sedema vê gavavêti-nê ci bû?

Dr. Cemal Kahraman: Mirov digihêje baweriyeke ku, li Ewropa ev tiş bi şasîti hatiye têgîhiştin. Heya sala 1983'an zagonêke weha tunebû. Lê vê demê em bi Kurdî diaxîfin, bi awahekî din mirov bibêje, dewleta Tirk nikare her

mirovekî me polisekî deyne ber.

Em berê jî di mala xwe de, li kolanan, di dan û standinê de bi zimanê xwe Kurdî diaxîfin. Ez mîna doxtorekî, bi nexwesêni xwe re bi Kurdî qisedikim, tu kes nikare pêşîya van tiştan bigire.

Wilo dixwazin bidin xuyanî ku, bi hilweşandina vê zagonê xêrekê bi me dikin. Ev ne rast e, mafêmeye.

Heke mirov ji aliyeke din ve li vê pişî binêre. Mirov dikare bêje ku, zimanê zikmakî bi zagonan nayê çareserkirin. Zagona ku di sala 1983'an de hatibû derxistin bi xwe jî ne di cih de bû. Ji ber ku zimanê zikmakî qedexedikir. Di vê rojê de jî tişte ne di cih de tê rast kirin.

Rewşen: Hilweşandina zagonêke wilo, dikare xwestina geleki bîne ziman. Anglo, pişî hilweşandina vê zagonê gelê Kurd dikare xwestina mezintir û cure bi cure bike?



Dr. Cemal Kahraman: Wekî ku min berî niha daxuyanî kîrî jî, em bi hilweşandina vê zagonê kîfxwêş nebûne. Yênu ku kîfxwêş dibin, ew in ên ku ev zagon hilweşandine. Ew jî ji ber ku wan ev şâştiya kirine. Heke nehatiba rakirin jî wê her dem li nava çavêñ wanketa. Ji ber vê yekê, em kîfxwêş nebune.

Ji hêla kurdan ve jî, ev ne guhartineke mezin e ku, gel bikaribe sûdekê (fîdeyekê) jê bibîne. Ev ji wan re (Dewleta Tirk) pir mezin e, ji ber ku her roj li civatêñ demoqrat mîna şîmaqekê li Ewropa û li der dorêñ din li nava çavêñ dewletê diket

Li vir, em dikarin bêjin ku, daxwazêñ gelê Kurd di ber çavan re nehatiye derbas kirin.

Daxwazêñ gelê Kurd ew in ku, çanda xwe bi zimanê xwe hîn bibin, di dibistanan de bi zimanê xwe bixwînin, weke her gelan azadiya xwe bi xwe hilbijêre. Bi vî awahî jî kultura xwe bi pêşxe.

Rewşen: *Li navçeyê rewş çawaye, bi taybetî di vê dema şer de. Hûn mina Komeleyekê çawa lê dinérin?*

Dr. Cemal Kahraman: Me berê jî ev pirs bi awahekî dorfîreh vekiribûn. Li ser bûyerên ku dibin me bi hînek rojna-

*“... Di navçeya me de, şer ne ji niha ve heye. Lê hema şerê ku heye bi rengekî fermî nehatiye diyar kirin. Ev şer berî aloziya Xelîcê hebû...
... Li mentiqê şerek heye, lê ev şer ji hêla Komara Tirk ve nehatiye xuya kirin.
Şerekî wilô heye ku, ne di rengê tu şeran de ye. Ji ber ku di şeran de exlaq û torêñ şer hene. Lê ev şerê ku li başûrê Tirkîyê (Kurdistan) dibe, ne exlaqê wê û ne jî torêñ wê hene. Maf tune, dadgehêñ mafdarî tunene. Şer bi hinde hêzan ve hatiye girêdan, şerê hêzên taybetî (Ozel Tim) ye, ku kes nizane cih û berpirsiyariya wan kudere...”*

meyan re hevpeyîn çêkirin, her weha me di raporêñ xwe de jî nîvisîn.

Di navçeya me de, şer ne ji niha ve heye. Lê hema şerê ku heye bi rengekî fermî nehatiye diyar kirin. Ev şer berî aloziya Xelîcê hebû.

Berî niha bi demeke kurt, ji rîkxistina

mafîn mirovan hînek berpirsiyar, ji partiyêñ politikî jî hînek endamêñ Parlemento hatibûne mentiqê. Piştî gerekê ditina xwe bi vî awahî dane şanî kirin.

Li mentiqê şerek heye, lê ev şer ji hêla Komara Tirk ve nehatiye xuya kirin. Şerekî wilô heye ku, ne di rengê tu şeran de ye. Ji ber ku di şeran de exlaq û torêñ şer hene. Lê ev şerê ku li başûrê Tirkîyê (Kurdistan) dibe, ne exlaqê wê û ne jî torêñ wê hene. Maf tune, dadgehêñ mafdarî tunene. Şer bi hinde hêzan ve hatiye girêdan, şerê hêzên taybetî (Ozel Tim) ye, ku kes nizane cih û berpirsiyariya wan kudere.

Di navçeya me de şerekî wilô heye. Ev tiştêñ ku ez tînim ziman, ne ez tenê dibêjim. Lê belê, her kes dibêje. Berî niha Partiya Yekitiya Sosyalîstan a Tirkîyê hatibû vir. Wan jî bi vî awahî qise kirin û axaftinêñ wan di BBC hatin weşandin. Anglo li herêma me şer berî aloziya Xelîcê hebû û hîn jî heye.

Rewşen: *Em bi navê Kovara Rewşen, gelekî we ji bo vê hevpeyînê spas dikin.*

Dr. Cemal Kahraman: Ez jî we zor spas dikim, bawerim ku ezê mîna endamekî Komela Mafêñ Mirovan her delametêñ (wezifeyêñ) xwe pêk bînim.

KARWAN Û ŞÊR

WENDOXÊ ERJAYAYEY

Yew ziwanî di bîyayîşê dîyalektan (lehçan) nişanî pêtey (zengîney) û xorîye ay ziwanî yo. Na mesela nêbena sebeb û ciyabiyyîşey ziwandê ma yê şêrîn, ki wayirê gelek dîyalektan û jargonan o. Heqê yewî qînî yo ki na pêtey ziwandê ma yê tarix ser o, spekulasyon ya zî bazir-ganey biko. Ayê ki no ware di kar kenî û zirar danî yewey ziwandê ma, wa bizanî ki yê yew bêbexteyda kor miyan di yî. Gelô qey kê şenî weziyetê ziwandê ma, weziyetdê tarix û halo ki ma eyro tede yî blaqtî. Eke hetanî eyro ziwanî ma nêomewo werte re hewenayîş se, yew sebeb zî ayo ki ziwanî ma wayirê zaf dîyalektan û jargonan o. Çaxo ki kolonyalîstanê tîrko, dest bi plananê asîmlasyonê kerd û waşt ziwanî ma hewenî, raştê pêtey û qileweydey ziwandê ma omey. No semed ra zî, plananê jînî serê xo nêgirotû puç bî. Çunkî reyey ziwandê ma zaf xori di bî. Ziwanî ma, wayirê zaf dîyalektan û jargonan bl. Ganî yînî nê dîyalektî yew bi yew asîmîle bikardînî û werte re bîhewenayîş. No kar zî asan nêbi. Eke pêtey dîyalektandê ma ra nêbinî se, beno ki hetanî nika dişmenê ma resaybî he-defandê xo. Ziwanî ma, bîyayîşê mayo zaf erjaye wo. Ganî ma wayirey heme qâdê xo nê erjiyayo bikî. Parsey dîyalektandê ziwandê ma, ganî nêba menfeetê kesan, caya, ya zî sewbîna qyo. Na mesela ser o yew nişno cembazey biko. Herî rayirê cembazey padaye wo. Ma, omarandê xo nê verînan di tayn behsi ziwanî û dîyalektandê ziwandê xo kerd bl. Ma ku eyro ra pey zî, na parsi ser o vinderî. Eşkera ya ki hetanî nika ware di sînasnayîşdê dîyalektan di zaf q' nêamewo nuşîş. Nêzonayîş bê-hesab o. Labelê sebebê no apeymendiş û nêzonayîş pabestey hali welatdê ma Kurdistani yo. Ma bawer kenî, ki heme heway ra halbiyyayîşê na mesela pabestey azadbiyyayîşê şar û welatdê ma wo.

REWŞEN

Rojê rojan ra keyêndê koçera kodê Qerejdaxiya beno. Xeyma ci tenya be-na. Lajêndê ci beno, lajê şino seyd. Şino caê wiyo, dereyê di karwanê vinderdo, şino karwanî het.

Lajek karwanî ra pers keno, vano, "Şîma çîçirê vinderdê?" Karwan vano, "Şêrêno ma vernî di, ma ay ra vinderdê." Karwan vano, "Mayê nêwetanê şêrî ra şirê."

Lajek vano, "Şêr o kotî yo?" Karwan şêrî musneno lajekî. Lajek karwanî rê vano, "Şîma dûrî kewê."

Lajekî pêşê xu pist xu mîra, bazî xu weşanay. Şemşêre xu ant, kerd xu de-sta, si şêrî ser. Şêr werîş pay. Şêr û lajekîa xu kûwa piya. Lajekî şemşêre da şêrî ro, şêr kerd dirbetin. Şêrî pencê da lajekî ro, a gandê lajekî nêkewt, kewt a prêndê lajekî. Prêne lajekî dirriya. Lajekî şemşêrna da şêrîro, şêr kişt. Marê va, "Ravêrê, mi şêr kişt." Ma kerd ravêrê, lajekî da bermiro. Ma lajekî ra va, "Tiyê qandê çîçî bermenê?" Lajekî va, "Şêrî pêşê mi dirrna. Ez nêwetana şîra keye." Ma ci ra va, "Ti çîçirê nêwetanê şîre keye?" Lajekî va, "Şêrî pêşê mi dirrna, ez ay ra nêwetana şîra keye. Pî mi do vajo, "Kê pêşê to dirrna?" "Ez vaja şêrî dirrna se, o do mî bikşo, do vajo, "senî şêrî pêş to dirrna?" Ay ra ez bermenâ. Ma qandê coya to ra reca bikerê, ti lajekî "ef kerê."

Karwanî lajekî ra pers kerd, va, "Tiyê çîçirê bermenê?"

Lajekî va, "Şêrî prêne mi dirrna, e-zan ay ra bermenâ." Karwan maht mend lajekî rê. Karwanî va, "To şêr kişt. Wa qe prêne to bidirro" Va, "Her kes nêşeno şêrî bikşo." Lajekî va, "Prêne mi teva nîyo, ez nêwetana şîra keye." Karwanî pers kerd, va, "Ti çîçirê nêwetanê şîre keye?"

Lajekî va, "Ez şîra keye se, pî mi pêşê mi dirrate bîvîno se, o do vajo, pêşê to kê dirrna? Eza vaja, "Şêrî dirrna, o do mi bikşo."

Karwan vinderd, pêra va, "Ney marê hewlî kerd," va, "Ma nê lajekî berê pêrdê ci het. Ma pêrdê ney ra reca bikerê, wa teva lajekî rê nêvajo."

Karwanî lajek girot û berd pêrdê ci het. Lajek riş kışta keyî, karwan şî kışta meymanan. Pêro şî, pêrdê lajekî des-tan, kewti dûrî ew pay vinderdî. Pêre lajekî karwanî ra pers kerd, va, "Xeyr o şîma?"

Karwanî va, "Ma qandê recaâ amê to het."

Pêre lajekî va, "Serr û çimandê mi ser," va, "Vajê recay xu."

Karwanî va, "Ma amê to ra, lajê to reca kerê."

Pêre lajekî va, "Vajê!"

Karwanî va, "Ma ray ra şiyê, de-reyên di şêrî ma vernî di peyda bi. Ma nêwetard şêrî ra ravêrê. Ma tersay şê-

rî ra. Ma dî lajê to mao vijîya, ma ra pers kerd, va "Şîma çîçirê vinderdê?" Ma va, şêrêno rayda ma ser o, ma ay ra vinderdê. Mayê nêwetanê şêrî ra ra-vêrê. Lajekî va, "O yo kotî yo? Ma şêr musna lajekî. Lajekî şemşêre xu ant, si şêrî ser. Lajek û şêrîya xu kûwa piya. Lajekî şemşêre da şêr ro, şêr bi dirbetin. Şêrî pencê est a lajekî, a lajekî nêkewt, kewt a prêndê lajekî. Prêne lajekî dirriya. Lajekî şemşêrna da şêrîro, şêr kişt. Marê va, "Ravêrê, mi şêr kişt." Ma kerd ravêrê, lajekî da bermiro. Ma lajekî ra va, "Tiyê qandê çîçî bermenê?" Lajekî va, "Şêrî pêşê mi dirrna. Ez nêwetana şîra keye." Ma ci ra va, "Ti çîçirê nêwetanê şîre keye?" Lajekî va, "Şêrî pêşê mi dirrna, ez ay ra nêwetana şîra keye. Pî mi do vajo, "Kê pêşê to dirrna?" "Ez vaja şêrî dirrna se, o do mî bikşo, do vajo, "senî şêrî pêş to dirrna?" Ay ra ez bermenâ. Ma qandê coya to ra reca bikerê, ti lajekî "ef kerê."

Wexta karwanî a qisa pêrdê lajekî ra va se, pêrê lajekî da xu sere ro, va, "Ey wax, ey wax! No lajê mi nîyo."

Karwan maht mend, va "Çîçirê?" Pêrê lajekî va, "O lajê mi bîya ê se, şêrî nêşa ê prêne ci bidirro." Va, "Şêr heywanen o. Senî prêne lajdê mi dirri-neno? Ey zanayê, o do prêne ci bidirro se, çîçirê şîno şêrî ser?"

Karwanî va, "Kiştaya no girwe-yêno gird o. Her kes nêşeno şêrî bikşo. Lajekî şêr kişt. Tiyê qahryenê. Ma nê qahrdê to rê maht manenê."

Pêrê lajekî karwanî rê va, "Heta nika mi çend şêrî kiştê, şêran nêşa mi rê zir-arê bikerê." Va, "O lajê min o se, şêrî nêşeno prêne ci bidirro."

Karwanî va, "Ti do qisûre lajekî ef kerê?"

Pêrê lajekî va, "Qandê xatirdê şîma mi ef kerd."

Lajek ame, lewê na pêrdê xu de-sta. Perê lajekî va, "Mi ti dayê xatirdê nê karwanî." Pêrê lajekî recay karwanî qebûl kerd, lajek ef kerd. □

- Na estaniki kitêbdê Oskar Mannî ra: Mündarten der Zazé, Kurdisch-Persische Forschungen/Berlin, 1932 Redaktion: Karl Hadank.

AHMEY TEMÎ Û LACÊ YÎ

Arêkerdox: Marûf Y.

Hêkki bi çinê bi merdimêki bi. Nomê yi Ahmey Temî bi. Hot hey lacê yî bivî. Namey yîni : Şok, Tes, Rem, Sal, Zek, Bayîr û Hen bi. Rojêkî rojanê Hamê ra, Tes şino dewarî di. Dewarê xu beno çardaxi. Qay dewarê yî şino kono manê fasiliyê Avdê Derwêşî, Avdê Derwêşî vono :

- Mi kirê to ke cinîya bayî to, lacê qutikî, ez bî to berzî binê linganê xu ku werê to biwo e ku bû to xelasbiko. Tes vono şîrp wer bi kîye remeno, dewarê xu jî wardiwerdenê û keno qêrin wer bi kîye remeno û çakêtê xu jî keno xwe virîya. Bêçakêt û larsigê yî jî lingonê yî konê. Bayî yî vono :

- Ho ça dewar? Zanê yî nêgérno. Bi ker û lal.

- Ero ho ça dewar de vaji! Tes lerenzo û vono :

- Wille halî û valo neyîno. Mehemeyê Avdê Derwêşî neggê mi çinê û pêra werdê mi dima.

Ahmey Temî va :

- Şokê mi, Tesê mi, Zekê mi virzêni, şenî yî bikoni, bikoyini va gunî ji ci û fekê yî berzo û yî awa serdini ro cinêni û vejêni. Mi boynî kutarê Avdê Derwêşî boynini! Tes binêki vineno vono Remê Hemê Siqî jî dî ki yî neggê mi çinê, yî hesê xu nêke wekobîn yev uja bi yo nê?

- Mehmê Hekê Berxî jî uja bi, yî hesê xu nêke. Şima mi boynini pirzê Hekê Berxî boynini, kutarê Avdê Derwêşî û Topalê Hemê Siqî boynini. Ez şima ra vona "virzêni û verê xu bidêni Qeymê Ziyara Xêywo." Cinîya yî va :

- Ero ti laconê mi kiştayış donê! Wille linga yîni nêşina! Ahmey Temî va:

- Enî qebraxon mi monê şarî di rezil kerdê wa şêyrê dîyarê dewi di çend tifingon biteqinê û ver bi kîye biremê, ku sot şorû dewa cêrinê û ya corîni ku persê ez o wajî laconê mi pêra werdo Mehwmeyê Avdê Derwêşî dima.

■ Min na estoniki hezey valîşdê yew Xosorijî (yew dewa Licê ya) nuşta.

TUTO VÎJNAYE

Hêkki bi çinê bi pireki, hirî ci ya bivî. Lacêki, beronêki û mergêki. Beron, we waşteni tenîya şo tewer biko mergi, û lacê ya, we şivonê beronî bi, henî we nêçîni tewer. Rastê ji rehet nêbi, û hêkki beronî monê mergi di xo şâ erd (rawesta). O' wext pîri lacê xo ra va, ki we ço beronî monê mergi ra vejo. Kêkki tut i tewer monê mergi, beronî, lingê xo şâ erd û qiloçen xo da tutî ro, henî tut nûştro û dest bi bermayî ke.

Rast ji zê veri, arvesêki bi lengayış ame.

- Tu çirî bermenê, tuto? Arwêşî pers ke.

- Ez bermenê semê ki ez nêşkena beronî mergo pira xo ra tewer bikî. Tutî va.

- Ez ku hettê to biki ez, verê xo da ceey henî arwêş kot raye semê ku beronî biro. Faqet beron serê raye di lingê xo şâ erd, veniya arveşî di û uja di arvêş jî berma û serê çeyîri di nûştro.

Lûy jî amî.

- Ti semê ci bermenê? Yî va:

- Ez bermenê semê ki tut bermenê.

- Ti semê ci bermenê, tuto ?

- Ez bermenê, semê ki ez nêşkena beronî mergo pira xo ra veji, tutî va.

- Ez hettê to biki, lûy va û henî koti raye semê ki beronî biro. Faqet semê yî jî hol nêşî. Beron qiloço hol da yî ro jî û we ca di nuştro û berma.

Verg jî ame.

- Ti semê ci bermenê, lûyê?

- Ez bermenê semê ki arwêş bermenê.

- Ti semê ci bermenê, arwêş ?

- Ez bermenê semê ki tut bermenê.

- Ma ti çirî bermenê, tuto?

- Ez bermenê semê ki nêşkena

beronî merga pira xo ra tewer bikî.

- Ez ku hettê to biki ez, vergî va û serê raye di nûştro semê ki beronî biro. Faqet beron bi hêrs, hettê yî ra şî. Ü we ji nûştro û berma.

Heş ji amê.

- Ti semê ci bermenê, verg?

- Ez bermenê semê ki lûye bermenêna.

- Ma ti ci rî bermenê lûyê?

- Ez bermenê semê ki arwêş bermenê.

- Ma ti semê ci bermenê, arwêş?

- Ez bermenê semê ki tut bermenê.

- Ma ti çirî bermenê, tuto?

- Ez bermenê semê ki ez nêşkena beronî merga pira xo ra veji, ke piste - pist

- Ez ku hettê to biki, ez va heşî û kotî raye semê ki beronî biro. Faqet beronî serê rayî di lingên xo şâ erd û qiloçen xo ke berz, hettê heşî ra ame û heş ca di nûştro û berma. Dije ji ame.

- Ti çirî bermenê, heşê pers ke.

- Ez bermenê semê ki verg bermenêno.

- Ma ti çirî bermenê, vergo?

- Ez bermenê semê ki lûye bermenêna.

- Ma sevo to, ti çirî bermenê, lûyê?

- Ez bermenê semê ki arwêş bermenê.

- Ma ti çirî bermenê, arwêşo?

- Ez bermenê semê ki tut bermenê.

- Ma ti semê ci, çirî, tuto?

- Ez bermenê semê ki ez nêşkena beronî monê merga pira xo ra tewer bikî.

- Ez wazena şima hemînî bermeyîş ra xelas biki dijê va û kot cae şî xo serê boça beronî naro û iyminî gina beronî ra. Beron zê merdimi bilêri û bilêri. O roj ra pê hindi qet nêşî monê mergi.

■ Swedîkî ra tadayox: Marûf Y.

Ferhengok

Kurdî - zazakî / Kurdî - kurmancî

Anwêş, hergoş	Keroşk, kerghu
Bermayış	Girîn
Beron	Beran
Dije	Jûjî
Hers, heş	Hîrc
Lûy	Rovî
Nûştro	Rûnişt
Rayîr	Rê
Tewer	Derve
Tut	Zaro
Verg	Gur
We	Wî
Waştiş	Xwestin
Xu	Xwe

Z E K A

Zeka
yew keynek a
tirkî ti ra vanî Zekîye
şarê Kelkit a
'heway ma' xeberî dona

Gelo şima zanî kerek
Vîstê yewê Çâzî di, heway şanî di
wertey sükûnî şîyanî kîlî
paştey xo dûrî şîyanî
ü xo veşna, kîye şere

W'astay herûda Medya
bînî doktorî şerma
'Embazey jay cay ç imî bî
tepa nêmendînî ç iray
cîfî jay nêpeysaynî lêzalez
Kitaban ra
mêrdiman ra
vîlikan ra
koyan ra
teyran ra
heme ç i ra hes kerdî
labelede zaliman ra tî

Zeka
yew keynek a
tirkî ti ra vanî Zekîye
şarê Kelkit a
'heway ma' xeberî dona

Riy jay, riy jay
Mona Lisa, ovanî
tayn ç imî şîyanî
qet mevajê
Beşni; derg
heze dehlî
'Awki biwî
Ç i serey şîyanî
herç i hetey
ç iydo onas
ne di ç imanî
nemendî
nemendî

Zeka
yew keynek a
tirkî ti ra vanî Zekîye
şarê Kelkit a
'heway ma' xeberî dona

Benzinê xo

Benzinê xo...

xo reyra arabi

pînosî

hûdê xo biveşna

şîyanî yeno şîma?

teze û ciwanî

Tedârîk

Kibrîtê xokiley

adîn berîhera, ti ra pey

teyqasîmî

tergîti Diyarbekîjî naşt

ta mîday omey pêser via:

ç i girwe wo?

aley adîrî bî xîdar

bî ç îlsur...

ja

ayoxey Kawa'y

marî

xo ra ewniyaynî

aşkînandê rîndo reyra

taynîn di qisey kerdînî

Sevîtinî yewbinan ra?

Kam ç i zano?

Dîma

serey ç ehenînta nuzdî adîrî bî

Xortê ki fanzar û reysej û heştay di di

Ç aldey Rezai di pey adîrî şî

xortê ki şarjîni ra vano 'dortler'

Zeka

yew keynek a

tirkî ti ra vanî Zekîye

şarê Kelkit a

'heway ma' xeberî dona

Bandrola jay desî gedan di mend

Şar bindê ç iman ra ewniyaynî gedan ra

hînî herkesî zanayî şîyanîy nê girwîy

ç inî ya

adîrî reysejînîkî nêbena

Yewerî biney vengâzî berî reyra wendî

'Newroza buyukî' serî yüksêk aleveler

gerekir

'Zînî' şîyanîşine selam

gerekir

izedê xo di va:

'şîyanî illay ti ciwanik a!

ç i vînikej ciwanikan a!

J. Esper

Nisan - 1990 Stockholm

Xwendevanê hêja

Ji vê hejmarê û pê ve, emê li kovara REWŞENê, ve-kolinek bi navê: Di Têkoşîna Şoreşgerî De Huner û Wêje, pêş-kêşî we bikin. Ev xebat; pîrsên weke di domana dîrokî de huner, di civaka dîldariyê, feodalîyê û sermay-edariyê de huner û wêje rohnî dike. Di domanê şo-reşen civakî de, li civaka Kurdistanî leyistokêñ sistêma dagîrkeran li ser hunera Kurdistanê eşkere dike. T2 yê llonê û huner, di şoresa Kurdistanê de huner û wêje û pîrsên hwd ên li ser vî babetî, şirove û rohnî dike.

Ev nivîs, wê bi şewe yeke rezenivî (seriel) were belavkirin. Vekoñin, li ser, bi çavekî şoreşgerî nihêrîna li wêjeyê, bi perspektifan di-de xuyakirin. Weke dihete zanîn, di pêşveçûna Têkoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê de, huner û wêje, cîhekî pêwîst dadigirin. Bê-guman, li tenîşa pêşveçûna gelemerî li welatê me, xebat û têkoşîna ji bo huner û wêjeyê jî, dê xurttir bibe û wêje û huner jî dê dewlemendtir bibin. Lê, ji bo destpêkê û danîna bin-gehekê, em bawer in, ev lêkoñin gelek agahdariyêñ bi kapasite û bi súd da-dihêne hole. Vekoñin ji rex-neyan û ji nixandinêñ cûr-becûr re vekirîye. Lewma daxwaza me ev e, ku hemû xwendevanêñ me, pişti ku nivîs dawî bibe, rex-ne û dîtinêñ xwe bigehî-nine me û bi vî awayî afî-kariya me bikin. Em hêvîdar in, ku ev xebat, dê bersivêñ valahiya di vî barî de bide û hindeki daxwazêñ pêdivî bi cih werîne. Em bang li xwendevanêñ xwe, rewşenbîrê Kurdistanê yên welatparêz û endamê YRWKê, dîkin, ku bi dîtin, bi bîr û baweriyêñ xwe yên aza, vê xebatê pêşdetir bi-bin û berfirehtir bikin. Hê-viya me ev e, ku bang a me bersivêñ xwe bigire û em bi xebateka hêja pêş ve henîn.

REWŞEN

Di Têkoşîna Şoreşgerî De Huner û Wêje

Huner di domana dîrokî de

Di hemû domanê dîroka mirovayetiye de, huner û wêje, ji bo berdewam-kirina jiyana civakî û pêşvebirina jiyana civakî, bûne pîrsên xebatê yên ku mirov nekarîne xwe ji wan dûr bigirin. Ji berhemêñ kevin ên ku ji civakêñ dîrokî mane, bi hêsanî tête famkirin, ku di serî de bûyera hilberînê, li kêleka xebatêñ pêwîstîrîn, ji bo civakî, di nav kar û xebatêñ pêwîstîrîn de huner cîhekî giring û fireh wergirtiye. Mirovên ji domana şikeft û hewingan, li ser dî-warên şikeftan gelek wêne çêkirine; ev wêneyêñ ku ji aliye mirovan hatine çêkirin, di nav xebatêñ hunerî yên kevntir û pêşemîntir de cih digirin. Ev wêneyêñ dewra şikeftan, ku heyâ neha parastî mane, ji bo huner û wêjaya jiyana mirovî mîna nîmûneyêñ huner û wêjeya pêşemîn dihêne pejîrandin. Mirov, di bin hoyêñ jiyana kevintirîn de jî, giraniyêkê dane xebatêñ hunerî û xwe jidiî bi hunerê ve mijûl kirine. Di hemû demêñ dîrokê de û di bin hemû hoyan de mirov, li gora domana pêşveçûna xwe û li gora derfetên xwe, xebateke hunerî, ne tiştekî xeml û fantaziyê bûn, bêhtir xwe nola faktorekî danîne holê, ku pêwestiyeka jîyanî di xwe de hildigirin.

Bêguman, ew domana ku huner û hunermend di civakê de ristekî bi posîdetir leyistine, ew doman e, ku civakêñ çînî derketine holê, ku ji bo xebatêñ hunerî bêhtir derfet hatine pêşkêşkirin û hoyêñ vê yekê afîrinê. Di zemanêñ romayıyan, misriyan û yew-naniyan de, anku di zemanê bajarvaniya wan a kevn de, xebatêñ hunerê pêş ve çûne û mezîn bûne. Ji bilî rewşa wan a paşmayî, herçend di sed-salêñ dîrokê yên kevn de ji aliye zan-yarî (ilmî) û teknikî ve, ev bajarvanî pêşve neçübûn ji, hunerên wan gelekî pêş ve çûbûn. Awayêñ wêjeyî yên pêşemîn ên mîna wêne, endiz (heykel), muzîk û yên din domanêñ dîrokê yên dawî de, ji bo kar û xebatêñ ku di-hatine pêşvebirin, herdemê mîna xaleka hilpişkinê hatine nixandin û pejîrandin. Pêşveçûnêñ ku di barê huner û wêjeyê de xwe diyar kirin, pişti bi hezaran salan, li gora pêşveçûna perwer-

debûnê, zanyarî û teknikê, posîdeyêñ xwe berdewam dikin. Dema em neha rewşa gelek civakan bihênenê pêşîya çawêñ xwe, emê bibînîne, ku hunera çerxa antîkî hîn li ser pîyan e û gelek civak, gelek li paş vê merhelê jî mane.

Mirov, di demêñ cengê de, di demêñ xelayê (birçibunê) de û di hemû demêñ ku civak, ji gelek alîyan ve dikevin nava afetan de ji, dîsan hewla xwe dane xebatêñ huner û wêjeyê. Ev rastî gelek baş tête zanîn. Ev hemû hoyen nebaş, nekarîne xebatêñ hunerî bi tixûp bikin, li bervajîya vê, di wan deman de ku civak rastî pîrs û kîşen gelek mezin bûne, tête dîtin, ku mirovan bi awayekî dijwartir berê xwe dane xebatêñ hunerî. Ji vir jî em têderdixînin, ku xebatêñ hunerî û xwestekêñ di vî barî de, taybetîyek dadihênenê holê, ku di xwerûstiya mirovan de heye. Huner û jîyan di her dema dîrokê de ketine nava hevdu û hevdu têkûz kirine. Lewma pêwîstiyea hunerê heye, ku mirov tu caran, nikarin xwe jê dûr bixin. Em dikarin vê yekê wisan şîrovê bikin:

Huner, berhema şixulandina xey-alêñ mirovan e, da ku rastiyêñ jiyana dijwar û zehmet çêtir bihêne debarkirin û mirov jîyanê ji xwe re hesantîr bikin. Anku mirov, li hemberê hoyen dijwar ên xwerustiyê û hoyen jiyana civakî, daku şehtinê (kirîzê) birawestînin, jîyanê bi naveroktir, rindir û xwestir bikin, berên xwe dane buyerên hunerî û hunerê afirandine. Ji ber vê yekê huner, biqasî afîribûna civakê kevn e û xwedîyê dîrokekî ye. Û afîribûna civakê ji hebekî hunerî ye. Çêtir bê gotin, her demê rastî û xeyal ketine nava hevdu. Xeyal her demê hunerê xwedî kiriye. Ji bo ji holêrakirina yan jî nerm-kirina zehmetiyêñ rastiniyê û jîyanê, her demê xeyal hatiye bikaranîn. Ci ne daxwaz û dijwariyêñ rastiniyê? Bi gelemerî bingehêñ rastiniya xweristê û civakê ne. Ji bo li alîkî danîna dijwariyêñ van ên giran û sext, huner bûye tevera berz û balakirina mirovan û bilindtirkirina rûmeta mirovayetiye. Lê rastî, ji aliye hunerê ji paşverûtî heye, an jî hunera paşverû jî heye, hunera konzervatif (muhabazakar) ji heye, lê belê, ev tenê li gora hinde domanan wisan e. Hunera ku pêşveçûnê bi bin-gehî pêktîne, van taybetîyek ku me li jorê gotine, di xwe de hildigire. Hemû

berhemêن hunerî, navgînêن (hacetêن) hesanîtirkirina jiyanê û pêşveçûnê ne. Ji vê nirxandin û şirovekirina li jorê, em dibînin, ku posîdeyêن hunerê yên li ser xebatêن civakê yên din de û pêwistiya hunerê, bi zelalî dihêne zimêن û xwe rohnî dikan. Pêwendiyêن hunerê ji nêzik ve di serî de bi şaxêن perwerdebûnê re hene, bi zanyariyê re, bi tekniê re û bi xebatêن civakî yên din re hene. Hinde cudadîyêن bingehîn hene ku hunerê ji buyerâ perwerdebûnê dûr digirin. Ev jî ev e; huner, ji bo dengê xwe li mirovan bike û posîdeyêن xwe serdestî mirovan bike, rewşa hîs û xeyalan derdixine eniya pêş û dadihêne pêşîya mirovan. Mejiyê mirovan û navendêن hîsê mirovan di bin hemû hoyan de, ne di rewşeka eyñ merhelê de vekirî ne li hemberê hîsê (sensibîliteyê) û posîdeyêن derveyî. Ji bona ku hîs û hîzr xwe posîdeyan re vekirî bikin, li ser riya armanceka diyar posîdeyêن xwe belav bikin û ji bo meylekê xwe amede bikin, ew tiştêن ku perwerdebûn nikarin pêk bihênen, huner û wêje pêkdihênen. Gava di bûyera perwerdebûnê de navgîn û azîneyêن cuda dihêne bikaranîn, di hunerê de bi riye nedîrekt û nerastûrast, bang li zanistî û navendêن hîsê mirovan tête kirin, ku bi navgîn û azîneyêن din nikarîne bikevin binê hîkarî û posîdeyan. Her çendî direjahiya dîrokê de huner û perwerdekirina wêjeyî û hacetên perwerdekirinê ketine di nava rewşeka navhevdu de jî, di bingeha xwe de huner û wêje bi perwerdebûnê re ne eyñ ne. Lê di encamê de huner û wêje, xizmeta wan armancan dikan ku perwerdebûn dixwaze xwe bigihîne wan. Carinan em dibînin, ku bûyera perwerdebûnê, bi espiriya hunerê bikar tête, bi atmosfera hunerê tête bikaranîn.

Huner û wêje, her weha hîs û hîzren (ramanê) mirovan dihêne zimêن. Bi rengê berzimanâna hîs û hîzrê mirovan, bi rengê azîneka ji bo vî karî, huner û wêje, berpirsiyariya pêwistiye ka taybiyeî jî dikan. Ji vî alî ji pêwistiye ka huner û wêjeyê heye. Hîs û hîzrê, ku bi axiftineka ji rîzê, bi nivîsekê yan jî bi riya şerhkirineka zanyarî neyêne fahmkirin an jî her wişan mirov nekariba wan bide fahmkirin-

Di qurnêن pêsemîn de huner, tevîl şaxêن perwerdekirinê û zanyariyê yên din bi hev re hebû û gava şaxêن zanyarî û perwerdekirinê ji hevdu cuda bûn, huner jî di nava xwe de şax bi şax cuda bû û her awayê şaxekê jî dîsan di nava xwe de bû pişk û bir. Em dibînin, ku ji vî alî ve pêşveçûna hunerê, li ser bingeha pêşveçûna zanyarî û teknikê xwe daye pêş. Di dema me de wêne, muzîk, helbest û hemû şaxêن hunerî yên din di nava xwe de şax bi şax, şêwe bi şêwe cuda bûne. Ev rewş diyar dike, ku ji allî huner di qada xwe de û bi qanûnê xwe ber bi pêşveçûn û kûrbûnekê ve diçe û xwe ji perwerdebûnâ kevnar (klasikî) dûr dike. Ji aliye din ve jî, bireka mirovan perwerde dike, da ku di vî barî de bibin pisporêن hunerê û hunermendêن hilbijartî (bijarte).

Teybatiya pêwîstîrin, ku hunerê ji şaxên zanyarî û perwerdekirinê din cihê digire ev e, ku huner rasti niyêن jiyanê yên weke civakî û konevanî, nikare bi pîvanêن berçavî (konkret) û bi dest têne girtin, bîne zimê; li şûna vê, bi riya hîsan, sîmbolan û awayên dijberîn pêşniyaran dide ber çavên mirovan û bi van pîvanan bi hêsanî xwe bi mirovan dide naskirin an jî mirov wê bi hêsanî dibînin û nas dikan. Em ji matematîkê bigirin heya tenduristî (tib) û ramyariyê (politîk), derfet heye ku mirov bikarbin rastîniyeka diyar bi terîmêن (gotinê) şaxên zanyarî bînîne zimê. Lê her weha awayê vê, bi muzîkê, bi wêne û helbestan jî ber ziman anînê, heye. Tenê yek cudadîya taybetî heye; huner xwedîyê pîvanêن xwe yên teybetî û xwedîyê awayê xwe ya dengkirinê ye. Her weha binirxbûna hostayıya di huner û hunermendîye de, nişanî me



danê, em dibînin, ku bi hesanî bi berhemêن hunerî yên weke wêne (resim), muzîk, helbest û hwd dihêne fahmkirin an jî mirov dikare wan bide fahmkirin danê. Ev rewş datîne hólê, ku huner xwedîyê taybetiye ka mîna zimanekî duwemîn e, ji bo danûstandina di nava mirovan de û hevdu fahmkirina mirovan. Her bi vî rengî hatiye dîtin, ku mirov her demê vê ji xwe re kirine daxwaz û divêtiyek. Her çendî tiştîkî wişan ne rastîniyeka ku bi qanûnê fizîkî hatiye İspatkirin jî, ji allyê encamê karvanî ev tête vê maneyê. Huner û wêje, ew bûyer in, ku hîs û raman bi sîmbol (remz), dîmen û xeyalan hatine xemilandin û bi gotin û galgalan mirov wan di nava xwe de bi kar dihênen.

dide, ku ev pîvan ji terîmêñ zanyarî û teknikî yên din cuda ne. Lê bilî vê jî, delameta armancêñ têne xwestin dike. Cudahiya navbera fotografekê û wêneyeka bi dest hatî çekirin, cudahiya di nav helbestekî û nivîseka pexşanî (nesîr) de, dîsan cudahiya di navbera peyvîna normal û deng û müzik de, pîvanê hunerê şanî dîkin.

Bi gelemperi wisan tête ditin, ku huner xebatek e, ku bi serê xwe û di nava pîvanêñ xwe de tête bikarhanîn. Lê di gel vê, ji aliyê taybetiyeka es-tetikî li ser berhemê û xebatêñ mirovan ên din, posîdeyêñ xwe li wan dike. Eger çêtir were gotin, dibe ku xebatek an jî berhemek bi serê xwe tenê, ne xebatekî huneri be. Lê ev dikare taybetiyeka yên dijwar di xwerustê û civakê de, ji bo ku rawestînin, jiyanê bi navaroktir, rîndir û baştîñ bikin, berêñ xwe dane bûyerên hunerî... Ev gotin vê pîrsê xweş rohnî û dike û diverisîne. Ji bo nimûne gava mirov sporê yan jîmnastikê li bera destûra dengê pîpikan (tütikan) an jî işaretîn vê nolê bike, nabe ku mirov xoşxaneyeka rîveçûnê yan stranekê, bi dengêñ vê nolê bi awayekî sazendî ya berçavî bi kar bîhêne, nabe weke ku ev bi awayeke monotonî û di rewşa xwe de tête bikarhanîn. Gava mirov dixebeitin û hinde berheman derdixînîne holê jî bi tempoyeka eşkere û bi bizavêñ bedenî yên li gora karî, rengîniyekê tevlî xebatê dîkin. Ev rastî bi hêsanî dikare were dîtin. Li hemberê zorî dijwariyêñ sext û hişk, xebata mirovan jî xwe digehîne dimeneke hunerî.

Gava perçeyeka muzîkê, helbestek an jî baweriyek bi şêweyeka hisî ber bi ziman dibe, posîdeyêñ xwe li pîskolojiya, sîstema hêrs û qasêñ mirovan dike. Ev rastî xweş tête zanîn. Carina mirov, di bin hoyêñ normal de nikarin debara êş û tîvancan bikin, lê bi posîdeyêñ hunerê dikarin debara van bikin, li kîleka vê jî, xweş tête zanîn ku bi dilxweşî vê yekê jî xwe re dikine armanc û xwe pé girê jî didin.

Tevlî her derdorêñ çinî û ramyariyan, ku posîdeyêñ hunerê yên li ser cîvakê û jiyanâ ramyari xweş dinasin, hemû baweriyêñ bîrdozi (îdeoloji) jî, ji bo serkeftina xwe heyâ derfet hebe vê faktorê bi kar dihênenî û gelek hîm dane vê yekê. Ci xebateka hunerî nîne, ku di xwe de berpirsyariya berjewendêñ baweriyeka filozofî, bîrdozekê û çînekê ya diyar, venâşere û hilnagire. Di hemû xebatêñ hunerî de, di hemû bûyerên hunerî de, ger bi zelañî û dîrekî neyê dîtin jî, ji aliyê encamêñ karvanî, mirov dikare bibîne, ku ev kar-

guzariya berjewendêñ neteweyekî, geleki an jî çînekî dîkin. Pir eşkere ye ku vê rojê em ji armancêñ konevanî yên bilinditir bigrin heyâ ji bo veristina pîsgirêkêñ rojenî yên xwerûtir, ji bo poside li mirovan were kirin, pîvekêñ hunerî dihêne bikaranîn. Nimûne; firotin an nasdana daringiyeka (materyal) yekta û xwerûtir jî, em dibînin, ku huner tête pêşkêşkirin. Ü ji bo van xebatan, huner û hunermend dihêne bikaranîn, ji wan sûd tête standin. Bêguman, ne xebateka bi serê xwe ye, ku mirov bi riya xebatêñ hunerî liv û bizavêñ mirovan tevdigerîne.

Di vir de rista hunerê bi tixûb e. Huner tenê bi ser xwe, nikare pîrs, kîş û pergâlêñ mezin biverisîne. Lê huner-veristinê hêsanîr dike.

Di serî de hemû olêñ hene, hemû bîrdoz, da ku xwe bi cîvakê bidine pejirandin û xwe serdest bikin, sûd ji hunerê ji bo xwe wergirtine. Di hemû olan de hene, bi awayekî hozanî û muzîkî tê xwendin û hatine nîvisîn. Di olê musulmanî de jî ev wisan e. Nîvisîna awayê ayetîn Quranê helbestî ye. Dema têne xwendin, xwediyê miqamekî taybetî ne. Her weha ne tiştekî ji ber xwe ye, ku banga melayan bi miqamekî muzîkî têne bihisîn. Di van hemû rastiyan de, aliyê hunerî graniye-ka mezin datîne holê. Weke tête zanîn, Yêñ mewlewî li ber muzîkêka bi navê "sema" xwe dizivirîn. Di vir de, mirov dikare li ser baxive, ka ma giranî di destê hunerê de ye yan jî di destê ayinan de ye? Rastî bersiva vê pîrsê, ne hêsan e û mirov dikare li ser vê yekê bi dirêjahî bide û bistîne.

Di cîvaka dîldariyê de huner

Taybetiya zelaltir a sazûmana cîvaka dîldariyê ev e; dîl (kole) di kategoriya hacetêñ hilberînê de ne û ev mirovîn dîl, ji her babet mafêñ jiyanê bêpar hatine hîştin. Xwedanêñ dîliyan, tevlî kuştinê xwedîyê her cure teser-rûfê ne li ser van mirovîn dîldar. Di cîvakê de mirovîn dîldar, mîna hîçkê hatine pejirandin, li hemberê vê jî qîralê cîvaka dîldariyê xwe mîna xwedan û yezdanîne dane nîşandan. Desthilat-dar û qralêñ wê demê, xwe mîna xwedanîne dane şanîkirin û xwestine bidin pejirandin, ku ew sixlet û taybetiyêñ xwedanîne ên mîna quđretdarê her tişti, hîma bê dawî û jiyanâ bêmirin li ba wan hene û ew xwedîyêñ van sixletan in. Li kîleka vê jî qralan, di her delîv û keysekê de belengazî, bê neçarî û hejariya dîliyan û bê hîmî û tengasiya dîliyan anîne zimêñ. Ev rastî

û rewş, xwe hilimandiye huna cîvaka dîldariyê jî. Ji berhemêñ hunerî yên ku xwe gîhandine niha jî, dîtin û nasîna vê yekê bi derfet e.

Di dema dewleta Misri ya dîldar de, firewnan xwe xweda nîşan dane. Hinde pîramîd û sfenksên gelek mezin dane çekirin, ku nûnerîya hîma wan û nemirina wan dîkin. Di wê demê de haydariyê xwerûstiye (astronomiyê) mîna "kehanetan" dihatin pejirandin. Lê di van berhemêñ hunerî de, derfet heye, ku mirov hinde haydariyê xwerûstiye û astronomiyê ji bibîne. Li kîleka mezinahî û balabûna pîramîdêñ misri, taybatiyêñ di van de yên hemû aliyêñ din ve jî, heyâ were gotin bi naverok û nirx in.

Di gelek mezel û birêñ di pîramîdan de, mirov dikare bibîne, ku firewnan gelek hazîrî û amadekarî ji xwe re kîrine, ku ji bo jiyanâ wan a pişî jiyanâ di vê dinê de hewce û pêdivî ne. Li kîleka amedikirina gelek tişten şexsî, tişten ji bo xwe, her weha bedenî xwe jî dane mumyakirin, da ku dîtina wan a fiziki domeneka dirêj awayê xwe biparêze û berdewam bike. Ev jî tête wateya (maneya) bi şêweyekê berzimanîna bêmirîniya xwe. Her weha, sfenksên hene, bi sedan car ji pîvekêñ bedena mirovan ên normal mezintir hatine çekirin. Ev jî tenê ji bo wê armancê ye, ku di cîvaka dîldariyê de mezinahîya firewnan bête zimêñ. Ji bilî vê armancê, ci armanceka din ji bo ev çend mezinçekirina wan nîne. Di serî de pîramîdêñ Misre, gelek wêne, endiz û grafikêñ ku ji wê demê mane, bêhtir ji jiyanâ ku di wê deme de hebû, jiyanâ firewnan a pişî mirinê dihênenîne zimêñ an jî remzeka ji bo vê rastiyê dadîhênenîne holê.

Tîşnebûn û bêhêjayiya dîliyan û bawerîya ku qralêñ cîvaka dîldariyê xwe-dan bûn, di vê demê de bîrdoza çîna serbets bû. Ev bîrdoz, li gelek herêmêñ cîhanê yên din de jî, xwe hilimandiye berhemêñ hunerî. Li Mezopotam-yayê, di wêneyêñ di keviran de hatine kolan, bi bask û çeng hatine şanîkirin. Ev jî dixwazin bibêjin, ku ev qral, di asmanan de difirin û digerin. Her weha, ali-yêñ wan hene, ku ji hîma mirovan gelek jortir in. Cihê ku kavîlêñ berhemêñ Nemrûd li wir hatine dîtin, bîlindahiya cîhî, ji wir dîtina hemû derdoran û serdestiya cîhî ji aliyê li raserî derdorê, bi me didine nasîn, ku ev cih ji bo girêdana tekiş û pêwendîyan bi asmanan re, cîhekî bi derfet û destûr e. Ev cih jî, bi vê hêla xwe, taybetiyêñ qralan ên xwedanî dihêne zimêñ.

Dîliyan ku di cîvaka dîldariyê de

rastî kedxwarî û pîkoliyên dijwartir dibûn û jiyaneka bi eş û kovan dikişandin û mirovîn din ên ku di vê cîvakê de li dijî sîstemê serî hildidan û xwe dilivandin, bi gelemparî em dibînin, ku bêriyên xwe yên ji bo civaka komunal a kevnare ku navê "çerxa zêrin" lê dabûn, hilimandine hunerê. Li ba hozanvan û helbastvanêñ yewnanî yên kevn, ev rewş gelek tête dîtin. Hunera civaka dîldariyê, di warê xanemariyê (mîmari) de jî, bi şeweyeka lêhatî xwe xilimandiye rastîniyê civake. Ev bûyer jî bi hesanî tête dîtin. Çekirin û avakirina xaniyan, mirov dikare bibêje, ku dijbihin avahiyên bendîxanan (girtîgehan). Ji bona ku revîn û bazdana dîliyan we-re rawestandin û derfeta xwerêk-xistinkirina wan neyête hiştin, di xaniyan de hinde kulek û pence-reyên yê hesinî hatine çêkirin, ku dijbihin qulêñ piçük bo hewastandinê. Ev kulek û pencere, di civaka dîldariyê de mohra xwe li şeweya xanîmaniya civaka dîl-dariyê xistine.

Li kêleka endiz (heykel) û wêneyêñ tiraşî yên bîranîne, dîliyan hîs û ramânên xwe bi giranî di seramikan, çomelekan, vazo û di hunerên din ên destî de anîne zimêñ. Ev tiştîn ku ji bo divêtiyêñ rojî jî dihatin bikaranîn, bûne rê û navîngîn hîs û ramânên dîl û bendan. Lewma jî em di berhemêñ ku ji vê demê mane de dibînin, ku ev tişt, bêhtir ji tiştîn berdestiyêñ rojenî, tay-bettiyêñ berhemêñ hunerî di xwe de hil-digirin vê rastiyê dihêne ser zimêñ. Di civaka komunal a kevnare de, huner ji xwe re tiştîn nola nêçîrê, hey-wanêñ nêçîrê û xwedanêñ xwerûstiyê bi kar anîye... Ev bûyer, mîna serp-hatinekê di civaka dîldariyê de jî berdewam kirîye.

Dîroka gelê Kurdistanê ya ronaktir û pêşketitir, dikeve domanêñ civaka dîldariyê. Gelê kurdistanê di dîroka xwe de pêsemîn di domana dîldariyê de xebatêñ xwe yên hunerî, bi awayekî ronak û pêşketî, pêş ve biriye û domandiye. Di wan deman de, ku gelê kurdistanê, di serî de avahiya civakî ya urartuyan û awahiya civakî ya dagirkarî û vegitina biyaniyêñ din, ku binkeitibûn paşê nehilweşandiye û wan parastiye, tête dîtin ku gelê Kurdistanê di warê hunerê de jêhatibûn û serkeftinê mezin şanî kiriye.

DI CIVAKA FEODALLYÊ DE HUNER

Berhemêñ dîrokî yên ku girêdana bi begêñ feodal re dihêne ser ziman û civakê, ji vî alî ve dixistin bin posî-deyêñ xwe, bi awayêñ devkî û nivîski

hema pirsên beşdar (şirîkî) kirine nave-roka xebata xwe. Naveroka çîrok û çîrçirokan bi giranî yan padîşah û mîr in. Keça mîr û axan û dewlemendiyêñ wê yên diravî û sermayedarı ne, yan jî lawikêñ serîkeçel û hêjar û belengaz in lê bi "gotinêñ mezinan" dikin û ji bo wan fidakar in. Di dawiya "îteat" û girêdana bi çavkorî de lawikêñ keçel û hêjar hem digihin keçen axan û mîran û hem jî digihin "refahekê" (xweşiyekê) ji aliye xwedî-malî ve. Di hemû hunerên devkî û nivîski de, tête gotin, ku di civaka feodalî de hejarî û bêmalîya gîrsêñ gel wê rojekê ji ber xwe ve ji holê rabe û lewma divêt mirov bi hedar û aram (sabir) bin. Di hunera feodalî de ev rastî bi dijwarî tête bikaranîn û bi ser de jî ev, mîna jêhatibûn û "karî-neke" mezin tête şanîkirin. Kesêñ hunerê û hunermendêñ navdar bi giranî di bin fermana çînîn serdest ên civaka feodalî de ne û bi giranî mîna memûrêñ padîşahan û mehvanêñ padîşahan ên dewlemend (zengîn) in. Gîrsêñ gel, di cîhana xeyalan û xewnan de digihin rizgarî û xelasîya xwe. Di hunera civaka feodalî de, nav-ûdengê kesan, navdariya kesanî (şexsi) ber bi asmanan ve tête bilindkirin û geleki mezin tête şanîkirin. Lê ev kes ji bi bingehî ew kes in, ku xwe li ber çînîn serdest ên domanê di-çemînîn, seriyêñ xwe dadihêniñ, rîz û hurmeta wan digirin, ji wan re "îteatê" dikin, bi hedar in û hîma meji û lojîka (mantiqa) xwe hîçek dihesibînin.

Li kêleka vê rastiyê jî, qehremaniya kesanî bi dijwarî xwe hilimandiye hunera civaka feodalî. Di kesbûna wan qehremenan de, ku li pişt heft çiyan cinaw-irekî heft-serî kuştine û ji bo keça padîşahî derman anîne, hisêñ fedayîbûnê yên mirovan tête pêşvebirin û germkirin. Hunermendêñ di kelehen padîşahan de û bircan de, çîrokên vê nolê çêkirine û gotine, qehremanîn van çîrokan ji, tu caran berêñ xwe nadîn çînîn xwe yên serdest û li dijî wan ranabin. Bi mafdarî şanîkirina pîkoliya feodal di malbatê de ji, bi wêjeya mezinahî û piçûkañ tête serdestkirin. Bi-rayêñ piçük di malbatê de, kirina her tiştî ku di malbatê de hatine gotin û bikaranîna wan, mîna tiştîkî gelekî bi meji, mîna tiştîkî gelekî pîroz dihêne şanîkirin. Di çîrokan de, di piraniya çîrokan de, kesêñ ku li ser bingeha logîk û meji, li ser bingeha rastîniyêñ zanyarî ji xwe re digihin biryarekê, her demê zerar û xesar dikin; kesêñ ku di gotinê dê û bavan dikin di encemê de her demê digihin miradê xwe. Bi vê riyê, terzê jiyanâ feodal bi mirovan

dane pijirandin; "meziyet" û mezina-hiya bêyi axtitîn her demê bi bêdengê guhdarkirinê di serê mirovan de tête sistkirin. Her weha ew baweriya ku dibêje di dawiyê de wê mirov bigihin bextxwesi û dilovaniyê, di serîyan de tête siskirin. Bi vê riyê, li himberê hemû eş û kelemêñ dijwar û tehl, li himberê tivanc û kulêñ bêdebar, ji mirovan tête xwestin ku divêt gelek bi hedar bin, dê di dawiyê de bigihine armanc û mebestêñ xwe.

Ew baweriya girêdana bi bircan û gesran û baweriya ku dibêje derfetêñ jiyanâ civakê, berhemêñ "lutûf" û "merhemeta" padîşahan in, ji hêla hunermendêñ qesr û qonaxêñ civaka feodal gelekî caran dihêne bikaranîn. Xwendiyêñ huner û hunermendan rewşa heyî şerîn şanî dikin, dibêjin ku hemû eş û kulêñ gîrsêñ gel berhemekî xwedanî ne û bi vê riyê, mirov dihêne azmûnkirin (îmîhankirin). Weke ku di pirtükîn olî de hatiye nivîsin, hunermend ji her wan tiştan û baweriyan dikin hacetêñ hunera xwe. Bi vî awayî pesn û forta hikimdaren sistema heyî dikin û rîzkirina pesnê ji nola "marî-fetekê" dipejirîn. Hemû bûyer û mirov, ji derdorêñ bijarte dihêne hilbijartîn. Pesn û forta padîşahan û qralan dayin, di hunerê de nola serpehatinekê pêşve dikeve û ev jî xwe gihandîye rewşa ekolekê. Nimûne, helbestvanêñ "dîwanê" yên di seraya osmaniyan de, hinde çarînê (beytêñ) helbestîn xwe ji bo pesna xwedê, peyxember û padîşahan dayinê, veqetandine. Ev rewş, bo bi sedan sal bibû tiştîkî hoyî û prensîbî. Ola ku bîrdoza serdest bû, ji gelek aliyan ve naverokê hunerê dida pêşkêşkirin.

Ji aliye din ve, di hunera gel de, rewşeka gelekî cudatir heye. Bedewî û ciwaniyêñ xwewrustê, evîn, dûrvelatî û xurbet hacetê bingehîn in. Eş û kovanêñ ku ji hoyêñ jiyanê dihêne, di stran û kilaman de hatine zimêñ. Ji hêviyê bêhtir, bêhêvîti heye. Ji ber ku di bin hoyêñ aborî û civaki yên heyî de, hêviyeka rizgarîye nayête dîtin û nîne. Çarenivîs (qeder) û "Feleka Xayîn" dihêne tewanbarkirin. Berpirsiyarekî kul û keleman, berpirsiyarekî nenas e. Tevîl hozanan, stran û tiştîn xemilandinê, eş-hêvî û hijmekariyêñ gel, di motifêñ ber û mehfûran de dihêne neqîşandin. Remz, sîmbol û tiştîn dijbehînê, bûne bi der hilimandina xeyalan û xewnan. Nimûnê; çiyanî bilind bûne sîmbola azadiyê. Şer bûye remza hîm û xurtbûnê...

Hunera gel a ku di civaka feodalî de protestoya li dijî nîzama heyî

dihêne zimêñ, ji bo veristina problem man riya rizgariyê û çareyan şanî na-ke. Tenê serîhildanek an raperînekê. Ji ber ku ji pêşî ve hatiye pejirandin, ku her tişt ji aliye Xwedê dihêne diyar û pîlankirin û jîyan jî nola çarenivisekê xwe şanî dike, derî û dergehêن hêviyê ji disan li ezmanan in. Dîtin û nê-rîna çarenivisiyê û baweriya ji bo nayêne guhartina hoyêñ jiyana heyî di hunerê de, ji vê cîhanê bêh-tir, ji bo "cîhana piştî mirinê" xewnan ava dikin. Taybetiyeka ku di hunera gel de tête bilindkirin û li ser rûmetiya wê tête rawestîn ji, bû-yera "ewliyabû-nê" ye. Em dibînin, ku ew qehremanê ku bêhtirîn xizmeta civakê kirine, bêhtirîn êş û cefa kışandine û fidekariyên mezîn şanî kirine, ketîne naveroka destanan. Ev qehreman ji nişkê ve ji ber çavêñ mirovan hunda dibin û li wê "alema bê-mirin" de, bêyî ku xwe nîşanî mirovan bikin, jiyana xwe berdewam dikin. Di ola filehi de, demêñ ku dêr (kilise) xwediyyê desthilatdarî (otorîteyê) bûn, Isa, Meryem û hewarî bûne naveroka wêneyan. Di bû-yera rizgarbûna ji dîlitîyê de, rista olêñ xwediyyê yek xwedanî geleki mezin. Di vê domanê de ol û dêr, li pêşîya qralan e. Mîna li ba herv tiştî, tiştî ku mohra xwe li hunerê ji xistî, disan ol bi xwe ye. Di ola muslimanî de ji, di vê demê de pesna cengêñ peyxemberan, jiyana wan û mezina-hiya wan tête kirin. Ji ber ku di muslimanî de wêne gelek hindik hatine çekirin û endiz ji huneraka qedexe bûn, "qesîde" bûne bûyerên pêsemîn ji

bo helbestêñ wêjeyî (literaturî, edebî). Di muslimanî de, ji ber ku senemperestiyê (pûtperestiyê) dihêne ser zimêñ, hinde şaxêñ hunerî qedexê ne. Her weha, li ba endezekî candarî tête maneya perestiya seneman.

Jiyana qiralan, di dirêjahiya teviya civaka feodalî de, bûye naveroka

dest pê kir ku bi riya wêjeyê şerê civaka kevin bike û şêweya jiyaneke nuh dahêne pêşya mirovan. Nêrîna li bûyeran û mirovan bi dîtina cîhanî ya burjuwazî, ji hêla hunermandan di hunerê de hat bikaranîn, ku ev hunermend di hunera xwe de pesna civaka kapitalîst didan. Di vê demê de, ew pîvekêñ materiyalist ên stûr bûyeran û mirovan li gora xwe nixandine û şûna "xurafeyan" û pîvekêñ osmanî yên din girtine. Berî her tiştî, pîrsa afirandina terzê mirovan û jîyanê li pêşîya kapitalîzmê hebû, ku divêtiya civaka kapitalîst ji bo wan mezin bû. Bi lihevhatineka di nava hilberîna (produksiyona) kapitalîst û parkirîn de, hilberîna kapitalîst û terzê jîyanê yê nuh ku divibû hilberîne ji nuh ve bijîne û pêşve bibe, baweriya felsefi û çandê (kultur), berî di dibistanêñ burjuwazî de, bi riya huner û wêjeyâ burjuwazî, hunermand mirovan hînkirine û wan rastîyan bi mirovan dane tê-gihiştandin. Di navbera kapitalîzmê û feodalîzmê de, dengeke dijwar çêbûye, ku bi giranî ji aliye burjuwazî hatiye destpêkirin. Ev bûyer bi dijwarî xwe hilimandiye

huner û wêjeyê û di warê huner de ji teko-sîneka dijwar xwe şanî kiriye. Mirovan dikare bibêje, ku tekoşîna di warê huner û wêjeyê de, ji şerîn di navbera herdu sisteman de, şerê pêwîst-tirîn e.

Em dibînin, ku feodalîzm û kapitalîzm bêhtir ji warêñ olî, felsefi û rêzanî, di terzê jîyanê de û di çandê de ji hevdu xweş cuda dibin. Burjuwazî, ji bo li ser piyan hiştinê sistema xwe ya



hunerê. Şahî û bûyerên nêçîrê yên padışahan û cengêñ mezîn bûne destan. Ev tişt di hunera wêneyî de ji gelektête dîtin.

Di Civaka Sermayedariyê De Huner û Wêje

Pîştî ku ji hembêza civaka feodalî kapitalîzm derketî û pê ve, burjuwazî

aborî, neçar ma, ku ahengekê bide mirovî ku endamê civakê ye û teviya jiyanâ civakî (sosyal), daku li hilberînê û li hilberîna ji nuh ve bihêne, yan jî hevdu têkuz bikin. Pêşveçûna di wa-rê zanyarî, teknîkî û hacetên komînikasyona gîrsen mirovan de, vê yekê hîmdar dikin divêtîyek û hîm jî vê yekê bi gen-gaz (îmkân) dikin, ji ber ku di dawiya hilberîna civakî de şeniyeka bûyi navendi (merkezî) derdikevi holê. Di dema derbasbûna kapitalizmê û li şûnde-hîstina kapitalizmê de, bi riya huner û wêjeyê, mirov û bi tevayî jî avahiya civakî, li gora şeweyê jiyanâ nuh dihêne hînkin; lê hinde li welatan jî, bêhtir ji xebata konevanî, huner û wêje dihêne bikaranîn. Bêguman, hinde sedemê vê yekê hene. Xebat û rêkxistineya konevanî ya serrast, ji aliyê gelek rejîman hatiye qedexekirin an jî, ji gelek aliyan ve hatiye bitixûbkirin. Di rewşen wisan de girtina sûd ji avantayêñ taybetî yêñ huner û wêjeyê, pêwîstiyeka gelekî mezîn e. Em dibîn ku, çîn û gelêñ ku xebatêñ wan a konevanî dibin hoyen pîkoliya giran a konevanî de dihêne rawestandin, car ji caran weke ku xebateka konevanî be huner û wêjeyê dikin karê xwe yê pêşemin; her weha, pêşemin gava tekoşînêñ çînî dijwar dibin û pîrsgirekîn konevanî yêñ mezîn derdikevinne holê, buhayetiyea mezîn didine xebatêñ huner û wêjeyê. Lê ev jî rastiyek e, ku huner û konevanî ne yek tiş in. Di vê pîrsê de Mao Zedung wisan dibêje: "... Divêt ku em rista wêje û hunerê gelekî mezîn şanî nekin, lê em van biçûk jî nebînin. Wêje û huner serê xwe li ber konevaniye dadihênen, lê her wisan jî bi awayekî mezîn jî posîdeyêñ xwe li konevaniye dikin. Wêje û hunera şoşegeri, perçeyek in ji dîmenêñ gelemeperi yêñ şoşê û tu caran bihêne bikaranîn ..." Tişteku li vir tête gotin ev e: Di bin gelek hoyan de, huner û wêje pêwendiyêñ xwe bi xebatêñ civakî yêñ din re hene û xwediyê pêwîstiyeka mezîn in û di pêwendiyen de jî rista wêje û hunerê xwe zexmtîr û mezintir dike.

Di domana pêşveçûna civaka kapitalist de, em dibînîn, ku ristêñ cûrbecûr ji bo huner û wêjeyê hatine pêşkêş kirin. Civaka kapitalist bi riya her awayê hunerê, ji trajedî heya komedi, civaka kevn li erdê dixe û reş dike. Ji alîkî vê jî, di demêñ mezibûna pîrsgirekîn civakî û aborî de, burjuwazî dixwaze kehniya kêşen heyi û riya veristina kêşan cuda şanî bike yan jî rastian veşêre. Lewma jî li ser hîs, raman û têkiliyê mirovan leyistokan birêve

dibe. Ev kirin û baweriyea wisan e ku gelek caran burjuwazî bi kar dihêne. Çendîn civaka kapitalist pêş ve dihere, li gora vê jî, awayêñ çandî di nav xwe de şax bi şax cihê dibin û ekolênuh ava dikin. Ev rewş, her çend weke ku huner di nav pîvanêñ xwe de pêşve diçe tête dîtin jî, di rastiyê de ne wisan e. Ji bilî çepereka li pêşya afirandina pîvekîn civakî, ne tiştek din e. Mirovîn ku ji ber pîrsgirekîn çînî û civakî gi-habûn hevdu, bi vê riyê dikevin nav bawerî, hîs û meylêñ ji hev cuda. Ew rewş, di warêñ felsefî û rîexistîn de, perçekirina civat û çînê ji xwe re ar-manc û hedef digire. Her çend were dîtin ku di niyetê de tişteke welê nebe jî, ji aliyêñ encamêñ karvaniyê, rewş seranser weke diyardanêñ me berê gotî ye.

Bi pêşveçûna navgînêñ (hacetêñ) perwerdekirinê, di civata sermayedariyê de, pêwendî û komînikasyona gîrsen gel, zanyarî, teknîk û xebata hunerî, ji aliyê tundbûn û sixletiyê de, ji aliyê kvalîtê de bêhtir dibin. Dema em civaka kapitalist û civaka feodal dâhînin cem hevdu, em dibînîn ku di civata kapitalist de, derfeta avakirina yekdestiyekî li ser huner û hunermendant, di çarçiveka teng de, bi seraya îstîbdadiyê ve dihatine girêdan. Dîsan di civaka feodalîyê de, huner û wêjeyâ gelî, bi tevayî ne di binê kontrola burjuwazî de ye. Lewra nikare were bê-posîdehiştin, melûl û sistkirin. Burjuwazî pir nikare vî tişti bibe serî û bi ser bixe. Sansur û qedexeyêñ li ser hunerê, tenê heya tixûbekê, yan jî heya birekê dikarin vî tişti pêkbihênin.

Dema awayê jiyanâ feodalîyê de û dema ku ev awayê jiyanê bi terz û cûreyekî konzervatifî li ber xwe da, huner û wêjeyâ burjuwazî, hingê xwediyê taybetiyekê pêşverû bûn. Hingê di çarçiva baweriya burjuwazî de, pesna zanyarî û teknîkî dihate dayin. Lê ev tenê ji bo hejandina wan bingehêñ bêsedem ên ku baweriya feodalî pişta xwe dabû wan, wisan bû. Pişti demeka diyar, em dibînîn ku bi awayekî tund û dorfireh domanek destpêkir, ku xebatêñ kesane (şexsî, îndivîduel) bû xebateka bingehîn. Da ku burjuwazî kesan ji civakê bibire, bi riya huner û wêjeyê, hikmê hîs, bawerî û warêñ têkiliya şexsan dike; heya derfet heye dixe bîte ku dor û dunya şexsan teng bike û tixûban li pêşya wan dahêne. Lê belê em dizanin ev jî rastiyek e, ku tevî kapitalizmê cîhana mirovan jî mezintir bûye.

Mirov çendîn çêtir wan pîrsgirekîn ji hêla civaka kapitalistiyê hatiye afiran-

din fahm bike û bêhtirîya veristina wan çêtir binase, em dibînîn ku bi hilpiş-kîneka seranser li bervajîya huner û wêjeyâ burjuwazî, xebatek dihête kirin, ji bo perçekirina yekîtiya bawerî û bîzaviya mirovan. Di civakê de, encax bi buyer û mirovîn ji milyonî yekî, rastiyêñ civakî û dîrokî dihêne şirovekirin. Li şûna hîma girseyî û xebatêñ afirandina pêşveçûnê yêñ mirovan, bûyerên tesadûfî, hêviyêñ rizgariya şexsî û bawerîyêñ her wekî din, bi mirovan didine pejirandin. Di bin navê pêşvebirina huner û wêjeyê, hinde şêweyêñ huner û wêjeyê ku naveroka wan fantezî ye dihêne pêşvebirin, da ku li şûna rastmezinbûn û bêşveçûna mirovan, jiyanekê şexsî xwe serdest bike, da ku mirov pêwendî û hîzrîn xwe bi tişten vala û pîrsêñ talî biwestînîn û li ser pîrsêñ bingehîn xwe kûr nekin û xwe rast mijûl nekin. Bi nêrîn û bi bawerîyeka hunerê ya bi vê nolê, ew aliyêñ weke paşverûtî, bêjîhatîbûnî, şexsî, egoistî, xwesparî û bêbañî û bêdehnî yêñ ku ji xwe di cir û rawîsta mirovan de hene, dihêne pêşvebirin. Ev karîn, çalakî, jêhatîbûn, jîrî û sixletîn mezîn û bilind ên mirovan dihêne korkirin û rawestandin.

Di wan deman de, ku proletarya bi bawerî û livbaziya xwe, ji bo xwe ne hîmekî bingehîn be, pîrsêñ ku pêwendiyêñ hilberîna kapitalist dadihênin pêşya mirovan, dibine naveroka huner û wêjeyê. Lê di van deman de, weke ku di konevaniye de dibe, derfet nîne ku mirov kehniya pîrsan ya rast û awayêñ veristinê di huner û wejeyê de jî bibîne. Pîrsêñ heyin û encamêñ ku ev pîrsgirek diafirin, bi awayeke stûr li pêşya çavan dihêne raxistin. Bi terzekî berdewamî gîlîkarî (şikayet) hene û nerazîbûn tête eşkerekirin. Lê riyêñ rizgariya ji vê rewşê, nayêne dîtin.

Ew hunera ku di domana feodalî de bi tevayî di dêran û serayan de hatibû kîlîtkirin, di domana kevnarı û derketîna kapitalizmê de, bi tevgera ronesansî pêşve ketiye. Bi destpêkê domana ronesansê, em dibînîn ku huner berê xwe dide jiyanâ civaka nûh. Ji vê demê pê ve, êdî ne girîngîyekâ şert e, ku hunerek mecbûre wan mirovîn ku di civakê de di rewşka serdest de ne, bike naveroka xwe. Ew mirovê ku li ba çînêñ serdest ên civaka feodal ci nirxe-ka wan nebû, êdî dikarin hacetêñ hilberînê yêñ burjuwaziya kapitalist bi kar bînin. Ji ber vê yekê jî, me ji perwerdebûnê bigirin heya rewşa çandî û rewşa giyanî (ruhî), mirov bi her tişten xwe ve, dibine pêwestiyek û qîmetek ji bo civakê. Bûyerên evîniya serdesten

feodalan, şerên xanedanan û civanokêñ serayan, li gora hoyêñ jiyanâ kapitalist êdî tev çîrokêñ kevnare û xeyalî ne, çîçirokêñ xewni ne. Pişti ku zanyarî û teknik di hilberîne de bûn xwedîy risteka mezin û serrast, bûn bireka ji jiyanâ mirovan, her weha bûn naveroka huner û wêjeyê jî. Bi vî awayî, huner û wêjeyê jî, hêdî-hêdî jî asmanan xwe daxistin erdê.

Hunera burjuwazî, berî her tiştî, tevlî terzê jiyanâ feodalî û hebûnêñ biryari yêñ civaka feodalî, van qehremanan wan domana feodalizmê ku feodalizm wan gelek bilind kiribû û jêhatibûnêñ wan qehremanan li erdê dixe, henek û vivanokêñ xwe li wan dike û wan dike hacetên komedîyan. Nimûne; romana Don Kîşot, ku di dema feodalî de hatibû nîvîsîn, ehmeqîya şovalyejêñ çerxa navîn dadihêne holê. Qehremanê vê romanê, di kesbûna xwe de dide xweyakirin, ku qûrebûna feodalî û pîvekîn qehremaniya feodalî, ew rastîne, ku lingê wan li erdê nakeve û avînêñ pûç û derbasbûyi ne. Bêguman, kesekî wisan, ne ew kes e ku ji bo burjuwazî, pêdiviyek û hewceyek be. Kesê ku burjuwaziya kapitalist dixwaze wî bilind bike û bi nîrx û qiyemet şanî bike ew kesê, ku zanyarî û teknikê dinase, ku dizane hacetên hilberîne bi kar bîne û karekî sazendî û bi nîzam e. Lî belê ji bo feodalizmê ev tiştî ji binî ne pêdivî bû. Tiştî ku ji bo senyoran (begêñ çerxa feodaliya ew-rûpi) pêwîst bû, ev bû, ku serf (pale, cotyar û rîncberêñ gundan ku tevlî erd dihatine kirîn û firotanê) di zeviyan de xweş bixebite û girêdayî senyorê xwe be. Lewma naskirina zanyariyê erînî (pozitifî) ji aliyê serfî ve ne tiştîki baş bû, çêtir bû ku "cahilekî" kor bimîne.

Hunera burjuwazî, tevlî pêwendî û dubendiyêñ jiyanâ nuh, naveroka xwe ji birêñ vê sistemê digire. Mafdariya jiyanâ nuh û çanda nuh, xwe di mejiyê mirovan de cih dike. Bi vê riyê, gava jiyanâ kevn û nirxêñ biryari yêñ civaka kevn ji holê radibin, mirov, bi teybatî di şexsiyeta bûyerêñ wêjeya burjuwazî de, dixebitin ku cihê xwe di civakê de bistînin. Ew bûyerêñ evînê, ku berê bi taybetî karê prens, prensestan û serdestêñ feodalî bûn, qehremaniya ku tenê bo wan hebû û ew bûyerêñ û mirovân ku warê têkiliyêñ civakê bûn, êdî di civaka nuh de, mirovân ji birêñ din ji dîkin naveroka xwe.

Burjuwazî bi riya huner û wêjeyê, di civakê de enjekte (şirinqe) dike, ku ew jiyanâ daniye pêsiya civakê ji her aî ve bes e û başe û divêt mirov, tenê di vê

jiyanê de hemû dawxaz, hêvî û bêriyêñ xwe bigerin. Tevlî berhem karîn û qehremanen civaka nuh, nirxêñ biryari yêñ burjuwazî jî, bi riya huner û wêjeyê bi civakê dihêne pejîrandin.

Pişti ku kapitalizm xwe gihande karektereke (taybetiyeke) paşverû, ew nebaşî û neqenciyêñ ku vê sistemê afîrandine, bûnê naveroka huner û wêjeya şoreşgerî. Li hemberê vê, burjuwazî jî destpêkir, ku tixübêñ hunerê bi tixüb bike û hunerê bixe nava rewşekê, ku her kesek nekaribe xwe pê mijûl bike. Burjuwazî vê yekê dike, da ku şanî bike, ku hunera gel a şoreşgerî gelek bêsixlet û kalîteya; li şuna vê wan pîvekîn tenikî zirav ku hunermend pêşvedibin bingeh digere, da ku bide pejîrandin, hunermendî û huner "meziyetîn" wisan ne, ku bi hêsanî mirov nikarin xwe bîgehîninê.

Ew gotina vala, ku dibêje "huner ji bo hunerê ye", lewma tîte gotin, da ku birawestînin, ku huner tiştîn baş bide civakê. Li gora vê baweriye awa (form) her tişt e, lî naverok ne tiştîk e. Lî baweriya hunera şorişgerî bervajîyê vê baweriye ye.

Hunera şoreşgerî berî her tiştî ev e: Hunerê ji bûyerekâ kîfxweşiyê (zew-qê), şahiyê û evîna şexsî derdixîne û bi naverokeka herî dewlemed dixe-milîne, da ku civakê perwerde bike. Gava huner tenê ji aliyê "awayê" bi destan ve were girtin, civakê bêsedem mijûl dike. Hingê jî, dibe mijûliyekâ gelel vala û pûç. Nimûne; di helbestekê (hozanekê) de ew taybetiye formî yêñ mîna pîvekî, kafiye û her wekî din, çend bi hostayî hatibin avakirin jî, heke ji bo veristina pîrsigirekî domanê rî şanî neke û ne xwedîyê naverokeka wisan be, ci buhatiyeka wê helbestê jî nîne.

Ev şerhîrîn û şîrovekirina me, ji bo hemû awayêñ hunerê wisan e. Çend huner û hunermend, posîdeyêñ xwe yêñ pozitifî li domana konevanî û dîrokî bikin, ku civak û çin jê derbas bîbin, ewçend jî bi nîrx û buha ne.

Di rojêñ me de kapitalizm, bilî neqenciyê û xirabiyê nema tiştîki diafirine. Hemû berhemên kapitalizmê li ser riyeke wisan xwe didine pêş. Ev taybetiya kapitalizmê, xwe hilimandîye hunerê jî. Çend têkoşîna çinî ya proletarya mezintir û bilintir bûye, evçend jî burjuwazî neçar maye, ku bixe bixe baweriya mirovan bi mirovan biyan şanî bike û da ku mirov êdî nekaribe berheman biafirîne, neçar maye ku gelek berê xwe bide hunerê û hunerê bixe bin zext û pîkoliya xwe. Di rewşeka wisan de, huner tenê bi navê

xwe huner e. Naverok bi tevayî hatiye şüştin. Nimûne; di rojêñ me de, bi hezaran awayêñ mûzîka rojavayî (xerbî) hene. Lî mirov dikare bibêje, ku ev mûzîk, bêhtir hîs û ramanen mirovî, bang li hîsên heywanî dike û posîdeyêñ xwe li ser van hîsan serdest dike. Tiştî ku burjuwazî dixaze tenê ev e: Divêt mirov di dirêjîhiya rojê de li ser makînan bi jîrî bixebite, mirovê ku li ser makînan wisan xebîti jî heya êvarî dema razanê divê di nava keftûlefê de be, da ku teviya enerjiya xwe di riya vala de biqedîne û bi vî awahî, tu caran zeman peyda neke, ku xwe bi pis-girekîn çinî yêñ bîngîhîn mijûl bike yan li ser wan bihoşê û bîhizire. Di rojêñ me de, ku bi hezaran problemen mirovayetiye hene, tiştîki gelek dide bizdandinê ye, ku proletarya, zemanê xwe yê vala di cihêñ sema û şahiyê de derbas bike. Lî burjuwazî, di vê barê de baş biserketiye. Di bin tîrêjîn rona-hiyêñ renga-reng de, dengê ku bi dehan hacetên mûzîkê derdixînin, mîna balyozekê dadikeve ser mejiyê mirovan. Di rewşeka wilo de, ji binî ve derfet nîne, ku mirov bikaribe bi serîyekî bînêxweşî bîhizirine û bikaribe ras-tiyêñ jiyanê şîrove bike. Bi riya televizyonan, vê rewşê, kişandine heya hundîren malan jî. Mirov, her rojê rastî deng û qelebalîxên bêhejîmar dîbin. Mejiyêñ mirovan însîyatîfa xwe hunda dike. Lewma jî mirov, dikeve rewşeka gelek pasîf de û xwe nalîvînîn. Pişti ku ev tişt dîbin û posîyêñ xwe jî li mirov nikare zû bi zû xwe jî van rîzgar bike û rewşeka wisan bi hesanî nikari bête rawestandin.

Welatêñ rojava gelek caran bang-eşiekê dîkin û dibêjin, "kî naxwaze tiştîki bibîne, bila li televizyonaya xwe binere ..." Ev gotin xwedîyê wate (mane) û naverokeka kûr û mezin e.

Pişti xurtbûna sînema û televizyonê, wêjeya (îteratura) nîvîskî jî pêwîstiya xwe hindekî hunda kir. Lî pêsemîn, pişti ku ev navgîn (hacet) jî ketîne desten monopolen kapitalist ev karin hikmê xwe li ser hunerê û hunerman dan avabikin. Niha heya merheleke gelek mezin hatiye rawestandin, ku mirov bikaribin, warê têkîlî û mijûliya xwe bi azadî hilbijîrinîn. Li şuna pîrsen ku serrast ji mirovan re bîngîhîn in, pîrsen gelek taşî xwe bi cih kirine. Li şuna ku mirov xwe bi pîrsigirekîn xwe mijûl bikin, ketîne nava rewşekî, ku xwe bi fanteziyan bi jîrî mijûl bikin.

Ji Ber Maye

Niştimana xwe binase

MÊRDİN

M. Bozan

Dema dibêji Mêrdîn, berî her tiştî keleha wê ya weke eyloyekî baskvekirî, dihête bîra mirovî. Ev keleb bi nêzîkê du hezar (2000) metreyan ji serpîka (seviya) behrê bilind e. Li gorî dihête gotin, keleb navê xwe ji keça împaratorê Roma, Maria girtiye. Li gor gotina şêniya li herêmê, dibêjin ku keça împarator rastî nexwesiyeke bêderman hatiye û li vê derê, li kelehê, ji vê nexwesiya xwe baş büye. Wê demê, Mêrdîn gûndekî biçûcik bûye û gund li ser vê kelehê büye. Serbanê kelehê rast e û gûndekî mezin dikare lê bi cih bibe. Mêrdîn demeke dirêj li ser vê kelehê maye û dûre, dakteye xwarê. Iro bajar bi temamî li dor û sîngâ vê kelehê daniye û binê bajar, bi çend girêñ mezin, digîhê beriyê, beriya Mêrdînê. Hema-hema hemû pence-reyên xaniyêñ vî bajarî li beriyê, li Girêşor (Qiziltepe), li Amûd û Dirbêsiyê û li gun-dêñ bêhejimar ên dardora xwe vedibin. Bi şev lampe û çirayêñ gund û bajarêñ hêla başûra Kurdistanê, hêla Rojavayê Naverasta Kurdistanê û yên vî aî, di nava hevdû de xuya ne. Havînan di van penceran re mirov 'behreke kes' dibîne. Lewra dan û zadêñ beriyê şîn dîkin...

Mêrdîn bajarekî pir kevn ê dîrokî ye. Berê medan, hûrrî - mîtannî babîlî û aşû-ran, bi dorê li vê derê desthilatdarî kirine. Pişti medan Mêrdîn, di navbera makedonîyan, er-men, rom, sasanî û partan



Foto Koçer

de maye. Pirî caran hatiye kavîl û dagîrkirin. Mêrdîn ji van Împaratorîyêñ li jor nî-mandî re cihekî stratejîk bûye. Ev rewş pişti van hêzan ji her berdewam kirîye. Di belavbûna ola İslamayetê de vêca ereban Mêrdîn kavîl û wêran kirine. Lê berî ku ereb werine vê derê valahiyekê çêbûye û suryan û ermenan vê valaiye bi kar hanîne. Wê demê li Mêrdînê pişekdarî (senaat) û bazir-ganî (ticaret) pir pêş-de bûye. Bi hatina ereban û olguherîna kurdan re, suryan û ermen qels û jar ketîne û di civaka nuh de desthilatdariyêñ xwe winda kirine. Her çend kurd ji, bi alîkariya ola İslamî, bûne xwedîhêz, lê dîsan ji ber assîmîlasyonâ ereban rizgar nebûne. Ne ereban bi tenê, ji ber nezanî û ji ber hijmekariya ji bo kultura İslamî, kurdan ji xwe bi xwe asîmîle kirine. Serekên êl û eşîrên hin kurdan bi daxwaziyêñ xwe û ji bona ku bi-

karibin ji ereban parekê bis-tînin, xwe kirine ereb û na-vên ereban li xwe kirine. Têr nekiriye ku ev car reh û ko-kên xwe bi nîşen ereban ve girêdane. Hin ji wan bûne 'seyyid', hin ji wan bûne eb-basî... Hin ji wan bûne Bex-dadî û hin ji wan bûne Hîcazî... Hetta bûne haşîmî nişâ pêxemberî ji...

Li dunyayê, çend kêm cih hene ku li wir erda rast û çiya di zikê hevûdu de ne. Yek ji van ciyan ji bajarê Mêrdînê bi xwe ye. Çiyayêñ Mêrdînê ku jê re pişta Mêrdînê tête gotin û berrî, li rex hevdu ne. Havînan, dema ku bayê hênik rûyê bajarê Mêrdînê mîz dide, berrî ku hemâ bi Mêrdînê ve ye, ji germa dikelije. Zivistanan, dîsan dema Mêrdîn di binê berfê de sipî dike, berri zippî-zuwa ye an ji baranê lê kirîye, di nava qur û heriyê de ye.

Mêrdîn bi bajarokê xwe digîhê bajarok û bajarêñ li

jêrê nimandî:

Mêrdîn li başûra roavaya Kurdistanê dikeve. Başûra Mêrdînê bi beriyê ve digîhê tixûba dagîkerêñ dewleta Sûriyê. Bajarêñ me yên Qamişlo û Amûd li tenîş in. Berî, li wê hêlê ji heyâ ciyayê Ebdulezîz berdewam dike. Nexwe ciyê ku berî lê dawî têt, tixûbê Kurdistanê lê diyar dibe. Bajar li rojava digîhê bajarokê Ruhayê û dîsan li rojava, ber bi bakur de bajarokê Diyarbekirê li tenîş hene. Li pişta Mêrdînê, li bakur, dîsan tixûbêñ bajarokê Diyarbekirê hene. Li bakur û ber bi rohilat de tixûbêñ bajarê Sêrtê dest pê dîkin. Di başûra rohilatê de Mêrdîn li tixûbêñ bajarêñ Zaxo û Dihokê vedibe. Ev rola cogafîk û stratejîkiya Mêrdînî mezintir û girîngir dike. Ji ber vê yekê Gerîlayêñ ARGKê di manavrayêñ xwe yên leşkerî de, bi giranî li ser Mêrdînê radiwestin.

Bilindaşıya pişta Mêrdînê,

li hevberî çiyayêñ bi nav û deng bêhtir ne bilind e. Lê çend çiyayêñ xwedî xatir li Mêrdinê ji hene. Ji vana **Çiyaye Cûdi** herî bi nav û deng e û li hêla Cizîrê (Cizîra Botan) dikeve. Ev çiya di berxwedan û serî-hildana gelê Kurdistanê de roleke giring û mezin leyîstiye û hîna ji berdewam e ve rola xwe bi serbilindî dilêyize. Çiya pir kevn e û tête gotin ku gemîya Nuh peyxemberî xwe li vî çiyayî daniye.

Piştî Cûdi mirov dikare çêl û bahsa **Çiyayê Qerej** bike. Ev çiya bêhtir li hêla Diyarbekirê dikeve, lê beşeka wê li Mêrdinê ji dimîne. Serbanê wê rast e û geleki hênik e. Dora wê daristan û taht in. Ji bona nêçirê ji cihekî destnekî ye. Neçîrvan dikarin hemû babetên sewal û heywanan li ve derê bibînîn. Çiyayê Qerejê volqanelekî kevn e û ji mêje ye ku vermîriye. Li jor me çela berrin û çiyan kiribû û me digot Mêrdin ciyekî ji wan kêm ciyan e ku erda rast û çiya lê di zikê hevdu de ne. Mirov dikare vî tişti herî baş li Çiyayê Qerej û beriya li ber wê ji bibîne. Hetanî ku ev ketiye stran û pahîzokan ji. Welê tête gotin:

**"Berîka Mêrdinê Berîkî rast e
Pozê Çiyayê Reşî şewîti
Di ser de xûz e."**

Ciyayê din, bi dorê ev in: **Çiyaye Mewalî:** Li bakura Midyad û Kercewsê dikeve. Çiyakî tûj e û li dora wê daristanen berfireh û pahn heñe. **Çiyeyê Bagokê:** Ji basûra roavaya Hezexê (İdil) dest pê dike û di bakura Nisêbînê re derbas dibe û digîhe Çiyayê Omerîyan. Weke di bakura roavaya Hezexê, di ser Kerboran re xwe digehîne **Çiyayê Mazî:** Bilind e, lê kêmavî ye. **Çiyayê Omerîyan:** Di navbera Mehsertê, Mêrdin û bendeva (bajar) Çax-Çaxê de cih digirin. Dora wê daristan û rez in. **Çiyayen Eynkale:** Li başûra roavaya Kercewsê dike-

ve. Bilind e lê daristanen wê kêm in. **Çiyayê Mazî:** Ji Mêrdinê dest pê dîkin û di bakura Girêşor û Dêrikê re derbas dibin û xwe digehînine Çiyayê Qerejê. Bi piranî girikî tazî ne. Hew li hêla Çinarê daristan hene.

Mêrdin hetanî salên 1940-1950'ye de, bi ekonomîyeke girtî û temamî bi feodalî ji-yaye. Her çend ku erda Mêrdinê ji çandiniyê re lihevhatî bû ji, ji ber bêavîyê û ji ber ku makînen kapitalizmê hêj neketibûne Kurdistanê, çandîn bêxêr bû. Her dem perçeyek erd vala dima. Piştî sala 1950 de traktor, çinkutok (biçer) û makîneyen çandiniyê weke din, hatine Mêrdinê. Hingê rejîma tirk a dagirker bi temamî li ve derê ji bi cih bû. Hetanî salên 1940-1950'yi de, şenîyê Mêrdinê bi awaye eşayiriyê bi hevdu ve girêdayî bû. Ev hetanî ve dawiyê ji berdewam kiriye û hêdî hêdî şikeстиye. Ji ber bêavîyê erd bi piranî neçandî diman û hew cihêni bi av ji çandiniyê re vedibûn. Ji ber ve yekê gel, di warê aborî de, giranya xwe danibû ser xwe-dîkirina pez û dewaran. Rez û bostan ji riyekî din bû. Ev aboriya girtî li ser jiyana civakî ji poside û tesîr kiribû. Gel bi piranî li gundan dijîya û qebile bi qebile, eşir bi eşir bûn. Dem dema serekîn eşiran û axayan bû. Her tiş li gor daxwazîyen wan pêk dihatin.

Mêrdin bajarekî biçük bû. Sedemek ji biçükbûna wê re ev bû ku pozisyonâ we ya cografîkî li ber berfirehbûna wê astenek bû. Hatina aboriya bajêr bi xwe li ser pişta gundan bû. Li bajar pişekdarî û bazirganî li pêş bûn û ev ji di desten erek û sûriyanan de bûn. Gundîyan bi derefetêni ji bona jiyana wan pêwest bûn digitin.

Piştî sala 1950 û ve de, li Kurdistanê hin bendav çebûn. Şebekeya rê hate danîn û makîne ketine welat. Evana hemû ne ji bona gel bûn. Ev karakterê kapitalizmê ye. Ji bona ku kapitalizmê ye. Ji bona ku kapitalizmê ye.

bikaribe jê baş sûd û kelk bigire û Kurdistanê bi temamî bixe nava lepen xwe yên germar û baş bi perçiqîne, pêwest bû ku van tiştan ji pêk werîne. Mêrdin ji weke bajarê din ji vî tişti sûd wergirt. Rengê berriye hate guherîn. Hema li her derê çandîn dest pê kir û ji nişkê ve bajarokên Mêrdinê, yên ku li berriyê bûn, bi mezinbûna xwe ji Mêrdinê derbas bûn. İro li Girêşorê bi tenê bêhejimar Mêrdinî hene ku ji bajêr bi xwe daketine.

Hetanî ve derengê, ji sedî 90, şenî li gundan dijîya û ji vî nodî ji, ji sedî 70 li çiyan bûn. Ji sedî 10 par ku li bajêr û bajarokan bû. Lî İro para gundiyan daketiye ji sedî heftê û nehan. Ji sedî 50 parê gundiyan li beriyê, bi çandiniyê ve girêdayî ne. Yen mayîn ji, xwedî pez û dewaran û bêerd in.

Li Mêrdinê bi temamî 660 000 mirov dijîn. Erdê Mêrdinê 12.879 Km² (Kilometer Çarçık) e. Hejimara kêsên bi xwendin û nîvîsinê zanin, ji sedî 35 e. Weke ku tête dîtin bajar gelekî berfireh e. Yanzdeh bajarokên Mêrdinê hene. Evana Girêşor, Dêrik, Çiyayê Mazî, Nisêbîn, Cizîr, Silopî, Midyad, Gercos, Mahsîterê, Stewrê û Hezex in.

Navenda Mêrdinê navçeya herî mezintir e. Nêzîkî 80.000 mirov li navçeya Mêrdinê dijîn. Navçeya Mêrdinê ji sumeran û vir de rolekî dîrokî leyistiye. İro ji, keleha wê rolekî mezin dileyize. Li ser kelehe Radara NATOyê heye ku hevberî Sovyetê û Rohilata Navîn hatîye danîn. Sala havîna 1986'ê de, Parîzanen Hêzîn Rizgariya Kurdistan-HRKê, gelek roket avêtin ve radarê û beşeka mezin jê kavîl kirin.

Neha ji em bajarokên Mêrdinê binasin:

CIZİR: Erda wê 460 000 Km² e û 45.000 mirov lê dijîn. Cihekî pir kevn e. Di warê çanda kurdi de xwedî roleka gelekî dewlemend e. Li Cizîra Botan "Birca Belek" bi nav û deng e. Mîren Botan li

vê derê dîwana xwe danîne. Welatê epota Mem û Zîn, Cizîr Botan e. Hozanvan û edibîn klasikî yên kevin weke Fegiyê TEYRAN, Melayê CIZIRI ji ve navçeyê ne. Navê Cizîra Botan a kevn Bazibada bûye.

DÊRIK: Ne pir kevn e. Gelek caran ji hêla bî-zansiyen, ecem û tîrkan ve hatîye kavirkirin. Ev der ji ji bona mîrén kurdan warekî giranbuha bûye. Erda wê 1 367 Km² e. Şenîyê wê, ji 44 000 mirovan pêkdihêt.

KERCEWS: Cihekî bilind e. Li piştî Mêrdinê cih girkiye. Gercews hetanî ve derengê ji gundekî Midyadê bû. Ji Gercewse bêhtir navê **Hezenkeytê** bi deng e. Li ve derê şop û bermayên bi nêzîkayê 4 000 salî kevin hene. Ev şop û berma, piranî şikeft û hevingen kevn û kevnare ne, ku li der dora çemê Dîclê cihwarbûyî ne. Lî mixabin ev cihê giranbuha bi projeya dagîkeran a bi navê Guneydogu Anadolu Projesi-GAPê, dê binav bibe.

Gercews 1 378 km² e û 45 000 mirov lê dijîn.

HEZEX: Berî çêbûna İsa di sala 331'ê de ava bûye. Di Mezra Botan (Mezopotamya) de guzergaheke giring bû. Ev der ji li bakur digihê bajarê Sêrtê. Erdê wê 1 224 Km² e û 38 000 mirov lê dijîn.

GIRÊSOR: Di nava bajarokên Mêrdinê de yê mezin-tirin e. Erdê wê 1 403 Km² e û 75 000 mirov lê dijîn. Di warê çandiniyê de pir lipê e. Girêşor ji cihekî kevn e. Bermayên kevnare lê hatine dîtin. Li aliyê rojavê digihê bajarê Ruhayê (Wêranşar) û li başûr ji li Dîrbêsi û erdê Amûdê vedibe.

ÇIYAYÊ MAZÎ / ŞERMIX: Erdê wê 869 Km² e û 27 000 mirov lê dijîn. Çiyayê Mazî hetanî dereng gundekî biçük bû. Navê xwe ji Çiyayê Mazî girtiye. Li jor, li bakur digihê Amedê (Çinar) û li rojavê ji digihê Ruhayê. Di erdê Çiyayê Mazî de, Gola Gulê şunewarekî bi nav û deng e û li ser gelek stran û

dîlok hene.

NISÊBÎN: Erdê wê 1 177 Km' e û 65 000 mirov lê dijin. Tête gotin ku berî Isa, sala 2270'yi de ji hêla kralê sumeran bi navê Şulgîyê III hatiye berfirehkirin. Nisêbîn û Qamîşlo di nava hevdu de ne.

MAHSERTÊ: Erdê wê 443 Km' e û 20 000 mirov lê dijin. Cihek gelekî kevin e. Vekolîn nîşan didin ku şop û bermayêner sumer û aşûran lê hene.

STEWRE: Erdê wê 1049 Km' e û 38 000 mirov lê dijin. Di warê dîrokî de ji şûne-warênen herî kevintirin e û hemma hema li hemû bajarvanîyen mezopotamî rast hatiye. Stewr jî ji aliye ve digehê Diyarbekrê (Bismil û Çinarê).

SILOPIYA: Berî ye û weke Girêşorê di warê çandiniyê de bi deng e. Erdê wê 807 Km' e û 31 000 mirov lê dijin. Navê wê hetanî sala 1960'ı, Girê Kamo bû û demeke dirêj bi Cizîrê ve gîrêdayî mabû.

MİDYAD: Mirov dikare bibêje ku di nava bajarokên Mêrdînê de herî bi nav û deng e. Di warê bermayêner kevin de dewlemend e. Bi piranî gelê suryan li vir dijin. Em dikarin dermafê vê derêde, çel û kada hinik bermayêner kevn û cihêngirin bikin. Ji vana du tişt hene ku yek jê bermayêner daran e. Di dîroka kevnarê de navê wê Anastaapopolis bûye. Di navbera Mêrdîn û Misêrbînê de cih digire. Ya dinê ji Dêrzaferan e ku dêrekî pir kevn û pir mezin e. Temenê wê 1500 sal heye. Navenda dînî ya suryan ev dêr e.

Mêrdîn di warê serîhildanê netewiyêner kurd de ji cihekî giring girtiye. Mêrdînê pirî caran di ber xwe daye û nehiştiye dagîrker hilma xwe lê vede.

Nêzîkî sala 1980, çaxa ku Partiya Karkerêne Kurdistan-PKKê, li hemû derêne welat geş dibû, bi tevgîredana nûjen (modern) li Mêrdînê ji bi hêz bû. Ji vê herêma dîrokî pir mirovîn

hêja û şoresser ên kurd û ji gelên navçeyê, xwe gihan-dibûn Partiya Karkeran û xebatêne hêja dikirin. Lî mi-xabîn rejîma tirk provakasyonê xwe yên qirêj û gemmar li vê derê ji pîlan û prove kir. Hêzên reformist û feodal-komplolar, li heverî PKKê, gelekk eniyêner êrişî danîn pê.

Herêma Mêrdînê bi yekcarî bû keleheke berxwedana welatparêzî û ev statuya xwe heya iro her bi xurî dîparêze.

Piştî hatina cuntaya 12'yê ilonê ji, xelkê bi gelek

Na-vîn, 'Vegeera Welat' dest pê kir, di vê rêveçuna nuh de Mêrdîn roleke mezin leyîst û ji gêrilla re bû pireke dest-pêkî û pîrgirîng. Ji sala 1984 û vir de, Mêrdîn ji bo gêrilla bû cihê ceng û berxwedanê. 15'yê Tebabê posîdeyekî baş kiribû û Mêrdîn ji jê para xwe wergiribû. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ji sala 1987'ê û vir de, Mêrdîn bû hêsinâ berxwedan û serîhildanê. Gêrilla û gel di nava hevdu de bûne yek perce. Berxwedanê bi her awayî dest bi komkirina berhemêne xwe ki-

Şikestûnê, Ahmet KURT, Selman DOG-RU, Mehmet KURT, Zülfü TURK şehîd ketibûn.

- Dîsan di wê provakasyonê de nêzîkî cil welatparêz şehîd ketin.

25 ilon 1980: Mahmûd GUDEN, Mehmed SINCAR, Mehmed ESEN, Dawûd TAŞKIN şehîd bûn.

29 Çirîya Yekem 1980: Zekî PALABİYIK, Davûd ULUÇ, İdrîs AKTAŞ, Hasan ERTAŞ, İsmail DÂMAR û Bozan ALAN şehîd ketin.

Di navbera salêne 1980 - 82: Alaaddin GUMUŞ, Umer AKTAŞ û Abdûrrehman ÇEÇEN di zindanan de hatine şehîd kiran. Dû re Ferhat KURTAY ji bi çar hevalen xwe yên berxwedankar û dilsoz re, kete nav karwanê şehîdîn nemir ên zindanan.

Ne bi tenê li Kurdistanê, li derveyî welat ji, li Filistînê ji şehadet hebûn. Weke Şerif ARAS û Şehabeddîn KURT bi neh hevalen xwe re bi fişekîn siyonîstan hatine şehîd kiran.


Çirîya Duwem 1984: Ziyyâeddîn OZER şehîd ket.

Adar 1985: Hûsêyîn AL-TINTAŞ şehîd bû..

Gûlan 1987: M.Emîn ASLAN, Nihat ÇERİ û Abdûlmejid TOKYAY şehîd ketin.

Ev şehîden li jor nimandîne hemû şehîdîn ji dorhêla bajarê Mêrdînê ne. Piştî 1987'ê ji pir şoresser şehîd bûn û ketin hembêza xaka niştiman. Erdê wan pir bibe û agirê ku wan pêxistiye tûcar venemire.

Bajarêne me yên weke Mêrdînê welatparêz û doz-niştiman, her dihere bêhtir dibin. Iro hemû bajar û gundêne Kurdistanê li ber hêviya hatina roja azadiyê ne. Rindî û ciwaniya wan a coğrafîki, li hêviya ew rindî û ciwaniya azadiya van bajarêne me ne. Van bajarêne me yên delal û hêja, li benda azadiyê edî stuxwariyê napejîrinin. Berxwedankar û serîhildér in. Mêrdîn di dîroka têkoşina serxwebûnê de ewçek bi serê xwe ye.



Ferhat KURTAY

tengezarî û zordariyê ji, qadroyen xwe yên berxwedankar nedane destêne dijmin. Jihevketin û perçebûnê hêzên sist û reformist û liberal, li ser xelkê tesîr û posîdeyekê bicük ji nekirin. Her dem ji li gel Partiya xwe û ji paşerojê bi hêvî bûn. Di vê demê de pir şoresser di heps û zindanan de hatine şehîd kiran. Di nava wan şehîdîn zindanan de, ji vê herêma berxwedankar û şoresser, Ferhat KURTAY ji hebû ku di riya serxwebûnê Kurdistanê de şehît bû û ji bo gelê kurd bû remz û simboleke azadiyê..

Dema ji qada Rohilata

riye. Edî gel bi xwe, di cenga gelî de, rolekî milîtanî dileyize. Bi rastî li Nisêbîn û Cizîrê mîna li Filistînê intifada çêbûn û li der dorêne xwe posîdeyekê mezin hiştin. Ev tête ser vê wateyê (manê) ku paşeroj ji rûdanê rabûn û serîhildanê nuh re avis e.

Di van rîzên dawîn de ji em dixwazin bîranîna çend şehîdîn Kurdistanê bikin. Ew şehîdîn ku ji Mêrdînê serî hilanîne û di berxwedan û cenga serxwebûn û azadiya welatê kurdan de bûne bêmirin...

Li berxwedana



MIHEMED ŞÊXO KEWEKİ MISEXT Û STEMBAR

Besir Botanî

EW KÎ YE?

Bejinzirav bû û dirêjiya wî bêhtir ji du metran bû. Rengê wî genimî bû. Çavjar bû. Baş nedidît û berçavk bi kar dihanî. Her dem cilên nû û giranbuha li xwe dikirin. Ew hez ji muzîka *rohilatî* dikir. Dengbêjê wî yê yekem M. Ebdîwehab - Misrî - bû. Ew xudan kesnameyeka hunerî ya pil û radeya yekem bû, ji Lubnanê wergirtibû. Dengbêjê mezin Wedîi El-Saffî ji hez ji wî dikir û bi xweşhatina wî jî kiribû. Kurdeki serbi xwe bû û kurdiñ rêka wî bû.

Mirovekî sitembar bû. Ji ber hindê mîna koçeran bû. Her dêmanî nebû li çi cihekî. Zimanşîrin, jîr û jêhatî û bi rûmet bû. Hunermendekî dengrast û xuandaîan bû. Tenbûra wî jî xweş bû.

Kêmasiyên wî jî ev bûn, ku dostêñ wî yên hunermend nebûn. Hez ji xwendina kurdi nedikir û mixabin e, folklorâ

kurdî (awaz, govend û stranê folklorî) jî ne dizanî.

HATINA WÎ BO BAŞURA KURDISTANÊ

Li destpêka sala 1973, hêja Mihemed Şêxo, bi dizî ve hate Kurdistanê Iraqê û dema gehîste gundê Bêzihê - Zaxo, Isa Suwar û zanî ku mîvanê wî hunermend bû. Wî ji wî ra xwe çemand û bi xweşhatina wî kir. Kak Mihemed Şêxo demeka kurt li wê derê ma û paşê çû gundê Newpirdanê - Gelale li devera Soran. Li wê derê babê min dît û babê min sojek daye wî ku ji wî re stranan tomar bikit û bişînite ji bo zaneyê kurd Kek Sadiq Bahadîn û bi alîkariya wî, dê li radyoya Bexdadê - Pişka Kurdî stran dê bihêne weşandin. Babê min car stran ji wî ra tomar kirin û gehîstine destê kek Sadiq ï. Hingê ez

li Bexdadê mîvanê wî bûm û wî gote min;

"Divêt em piştgîriya hunermendêt kurd bikeyn heta ku hûnerê me dewlementir û rengîntir bibî."

Ü paşê got :

"Heger hûn bêhtir stiranêt wî bo me hinêrin, emê dîsan şad bibîn û hemû ji bo parastin û belavkirina hûnerê kurdî. Pişî heyvekê ez zivîrime Kerkükê û xwestina kek Sadiq ï jî roj bi roj gehîste hêja M. Şêxo yî."

Hunermend M. Şêxo geh li mala babê min an xizmîn me stiran tomar dikirin û li çar aliyên Kurdistanê belav dibûn.

EZ Û EW

Rojekê kek M. Şêxo li Silêmaniye bû û ji wê derê hate mala me li Kerkükê û bo cara yekê kû em hevdû dibînin... Ü di cih da min gote wî:

"Pismam min par guhdariya hevpeyvîna te ji Radyowa Urdinê kir. Bi rastî stiranê te xweş bûn û naveroka programê ji baş bû."

M. Şêxo gote "Sipas! Ew ne ji Rad-yowa Urdinê bû, lê belê ya Libnanê bû."

Mêvan û dost ci kurd, ci aşûrî an turkman, her roj lek bi lek dihatine mala me. Dengê muzikê bilind bû û goved coş û xoş bû. Hingê min kasêtek ji wî ra tomar kir û hunerhez li mala her dostekî gûhdariya wî dikirin û pîrsa wî jî dikirin.

Ci cihem em lê bûn, li wêrê dibû cejn û şahî, xwarin û vexwarin, çîrok û henekan, stiran û govend... Rojekê, min kemana xwe deranî û min ji wî ra parçeka muzik lêda bi navê "Çemî Rêzan." Hêja M. Şêxo ecêbmayî ma û dema ku ew dikenit, an gewza wî têt, bejna wî ya dirêjzirav hemû dilivit û di-hejît û li destpêkê ji xweşîya neşîya di gel min wê parça muzikê lêbidit û got: "Ezê parçekê lêbidim ger bi min ra lêbidî tu hunermend i. Paşê parçeka tirkî ji min re lêda û min gote wî: "Pismam a ku te lêdaye, "lorkê" bû û tirkan dewlimentir kirine. Hingê wî zanî ku ez folklorâ kurdi ji dayka xwe û xizmîn xwe fêr bûme û ji nişâ (cîl) nû ji kurdên Botan ên derbider her ez bi tinê pûte (îhtîmam) pê didim. Û wî got:

"Ez hêvîdar im ku kurdên Botan zarrav, çand û cilên xwe biparêzin, lê mi-xabin e ku pîren wan ne mane û min botaniyek ne dîtiye ku botaniyeke re-sen (esli) weke mala we! Ji derdê si-temê roj bi roj namînin û winda dibin. Eger bixwazî paşnavê xwe yê pîroz biparêzî divêt bingeha te folklorâ Botan bê û cilên te ji şal û şapik bin."

Di cih da min ji wî ra stîra û bersiva wî da:

*Bedir xan paşa lolo
Lawê hejdesalî
Egîd û gernas î lolo
Rêzdar û delal î*


HUNERA WÎ

Wekî wî got ku strana wî nû ye û bingeha wê ji devera Cizîra Kur Eme rî (Botan, Tor, Mêrdîn) û Badînan e, wi-san helbest jî... Carekê gote min:

"Ez nikarim stirana folklorî xweşîr ji kurdên Botan bêjim. Ci Mîryemxan an M. A. Cizîrî, H. Cizîrî, Remezan Cizîrî, Seîd Axa Cizîrî û Almasxan!"

Êdî ez ê çîma bêjim? Baştîr e ger ez karekî pêşkêş bikim ku hunerhez ji min razî bibin.

Hema ji ber hindê hunermend M.



Şêxo yî ji bo strana nû xwe westan-dibû.

ÇÜNA WÎ YA BO BEXDADÊ

Hêja M. Şêxo demeka dirêj li Kerkû-kê ma. Li ser xwestina wî, min ew şande Bexdadê nik hevalan heya ku li Radyo û Televizyonê bistirit.

Min zanî ku dengbêjê me bê pare ye. Min alîkariya wî kir. Gava min heqê rîkê daye wî, min ji xwe ra got; xwezi ez bêpare bama lê ne ew!

Dema ku hunermendê me gehîste armanca xwe, berpirsiyaren Radyowê bi xweşhatina wî kirin û harîkarîya wî jî kirin.

Wî heft stiran li Radyowê tomar kirin û nîzîkî pênc stiran bo Televizyonâ Kerkûkê. Hingê navê M. Şêxo yî li de-vera soran jî baş belav bû û gelek hez ji wî kirin.

Li Mîhrecana (festival) kurdi ya ji bo hunerê li Baxdadê -1974'ê da- huner-mend M. Şêxo jî wekî mêvanekî hêja pişikdar bû. Hunera wî cihê şaneziyê bû...

LI ZINDANÊ BÛ

Dema ku Mîhrecana Bexdadê hew bû, kak M. Şêxo bêdeng bû û me ne zanî ka ci li wî hatîye? Ne li Bexdadê û li Kurdistanê. Pişî demeka dirêj, me zanî ku ew zivirî Sûriyê û li wêrê kete zîndana reş û li bin lêdanê bû.

Stem li berdewam e... Dema ku rejîma Iraqê sala 1974'ê de otonomî jî nedî gelê kurd, rewşa Kurdistanê sext bû û bû cengêka mezin. Nêzî 200,000 kurd şehîd bûn. Yek milyon kurd mane bêmal û bêhtir ji 100,000 kurd, aşûrî û turkman jî ketne zîndanan. Ez jî di cih da çûme ber bi ciyayê Kurdistanê. Havîna 1974'ê babê min pîrsa M. Şêxo yî kir û nameyek bi harîkarîya hevalan ji wî ra şand ku bête Kurdistanê. Ew li destpêka sala 1975'ê hate Kurdistanê û hingê nûçeka nexweş hebû ku şoreş divêt bête rawestandin!

Wî jî xema kire girî... Me xwe da dest leşkerêni iraqî. Ew li pişta me bûn, leşkerêni cezayirî li ser sinorê bûn û yêngî Iranî jî li pişta wan bûn. Sê artêşen dijminan li dora me bûn. Li gor texmîna

hevalan, nêzîkî yek milyon leşkerên dijminan li wêrê hebûn û xwe amade kiribûn ji bo dijî kurd û Kurdistanê. M. Şêxo yî got: "Leşkerên dijminan çekêne xwe ên mezin nişa me didine heyâ ku em ji wan bitîrsin."

Bi rastî demeka reş bû, Geleka sext bû û cihê mixabinê ye ku ji kurdên dî ra demeka geş bû!

KUŞTINA İSA SWAR

Rojekê ez û M. Şêxo li Xanê (Pîran şehrê) bûn û li xwaringehek me şîva xwe dixwar. Nûçeyeka nexweş gehîste me ku Kek Isa Swar bi destê hevalê min Kurdo Seyid Ebûşî hate kuştin. Me xwarina xwe nexwar û me rêka xwe girt û em çûne mala Barzaniyan ji bo pîrskirinê...

Dîtra rojê min helbestek li ser Isa Swar û berhev kir û min tinê bendek ji M. Şêxo yî ra xwend û min nekarî hemû bixwînim û tev ji ber rondikên wî:

Bêzihê rêka
çûn û hatina me bû
Zaxoka ciwan
cihê seyrana me bû
Heyf û mixabin
şehîd bû lawê Xabûr
Ew ci dost
û çi hevalê jiyana me bû

M. Şêxo got: "Ez nema muzîkê lêxim, ji ber ku delaltîrin kes, leheng-tirîn pêşmerge û jîtirîn mirov şehîd bûye. Kurdo Seyid Eboş jî gehîste dij-minî û li Bexdadê bû milyoner... Hingê bêhna M. Şêxo yî geleka teng bû û got: "Ez ê ji derdê kurdên xiniz û caş bipeqim! Çawan şoferekî wekî kurdayê pere-perest serokê xwe dikujê û pere şoreshê jî didizê û...?!"

Di wê rojê da M. Şêxo dicîte ordîgeha Rebetê û ez li xanê dimînim. Paşê ez mala xwe dibime Mehabadê...

EZ Û TEMO Û M. ŞÊXO

Li rîketa 14 1975, ez ji Mehabadê çûme Naxedê û li wêrê min kek Izzeddîn Temo dît û em bi hev ra cûne nîzîkî mala Barzanî. Me li wêrê M. Şêxo dît û wî dixwest di gel kek Hebîb Mihemed Kerîmî baxifit û va ye pişkeka kurt ji gotina wî ya ku min li kovara "Muzîk û Hunerê" belav kîrî, careka dî gotina wî belav dikime.

"Ez naxwazim ji welatê xwe bi dûr kevîm, li vê derê û di gel kurdên derbider li Kurdistanâ Iranê bimînim û bîrim. Ez ji Kurdistanê narevîm, çimku

xebat li ser xaka welat e. Rewşa min rewşa kurdên derbider û stember e. Rewşa wan ji rewşa min e, ez ji mirinê û ji kuştinê natîsim. Ez mirovekî hûnerrmend im û tembûra min xameya (qelem) min e."

Paşê wî navnîşana hotêla xwe da min ku sê kasêtek ji wî ra tomar bikim û piştî mirina wî belav bikim...

Bi şevê ez çûme nik û mêvan li wêre gelek bûn. Yek ji wan Mela Mihemed Neyo bû.

Di wê şevê da, M. Şêxo ji dil û canê xwe distira û berî ku ew kasêtek ji min ra tomar bikit du SAWAK (sîxurên faris) hatine oda wî û şeva me têkdan. Van du sîxurên sawakê, kurd ji Urmiyê bûn. M.M. Neyo bi dizî ve gote min "bes e!" Ev kasêt heyâ niha jî li nik min maye.

HATINA WÎ YA MEHABADÊ

Rojekê ew hate nik min û di cih da xema me revand. Bi rastî dîtina wî hêja ye. Kasêtek û nîv ji min ra stira û paşê wî dest bi çîrokê kurt kirin, yek li dûv yek...

Bi rastî çîrokêk wî xweş bûn û her min ne dizanî ku çîrokbej jî bû. Kêfa wî li Mehabadê gelek dihat û digot: "Cilêن kurdî, zimanê kurdî, radyoya kurdî..."

Lê, cihê mixabinê ye ku teypa min hate dizîn û kasêtea wî jî têda bû. Bi rastî min dizanî ew diz kî bûn? Ji ber ku ne du-sê caran, lê li her cihêkî welatî Ecemistanê, pirtûk, kasêt, name û nîvîsarên me, yan li hotêlê yan jî li malê winda dibûn!

Li gor texmîna min jî em li bin çavê Sawak'ê bûn. Em ji aliye wan ve gelek caran hatine girtin jî. Carekê tenbûra wî jî ji wî standin.

JİNA WÎ YA SEXT

Bi kurtî; M. Şêxo di jîna xwe de ci xweşiyek ne dîtiye û her tam jî neki-riye. Jîna wî hemû tal bû. Zîndan û lêdan, bêkesî û derbederî, ne kar û ne pere... Stema ku hatîye serê wî, her nayête salixdan. Dema ku wî zanî ez dê biçime Ewrûpayê, min ji wî xwest ku kasêtek di tomar bikit. Wî gotina xwe ya dumahîkê ji min re pêşî got: "Bêşîro, babê te mala min wêran kiriye û te divê wêrantir biki? Na, em ne serbest in. Ma tu nabînî leşker polîs û Sawak her roj serê me gêj dikin?" Û min gote wî:

"Cano, bi rastî ahengên te cihê dilx-wêşî û dilgeşîya hemûyan bûn. Serketin û saxiya te tinê daxwaza her kurdêkî reben ê ku li bin top û firokan bû."

bêjin bila bêjin! Ew ji rastiyê dûr in. Nanekî û pîvaz di gel ava sar û li Mahabada xopan ez bi cîhanê nadime. We-san bi xweşîya zikreşan jî!"

JI M. ŞÊXO YÎ RA

Cano, Cano...

Te ji bo me
Tim bi dilpakî distira
Ji bo jiyan
Ji bo hêviyê
Li xweşî û nexwesiyan
Bîraniñeka ronahî
Têr bi awaz û bi hozan
Va te ji me ra hiştiye
Tijî ye b' evîn û viyan
Cano, cano...

Cano, Cano

Jî lewra me tu parastî
Her dem li hiş û dil û can
Di sıruşta welatî da
Ç i l' berf û baran
Ç i l' ba û bahozan
Ç i l' ronahiya rojê
Heyv û stêran
Tu mayî û dê mînî
Hey kewê Kurdistan
Cano, Cano

★ ★ ★

Cano: Naznavê M. Şêxo yî ye
û tenê min ji wî ra digot.

Jêder

1 Ji devê Sadiq BEHADDÎN, Sebî BOTANÎ
û M. ŞÊXO


2 Kovara Muzîk û Huner

3 Fred och Kerlek

4 Rûbarê Sorav

Kurtebahsek Jiyana Dostekî Gel

Xaçatûr ABOVYAN



Xaçatûr Abovyan di 15 ya cîriya yekem sala 1809'ê de, li gundê Kanakêrê (5 km ber bi bakura Erivanê / neha di nava herêma paytextê Ermenistanê de dimîne) ji diya xwe bûye. Welatê Abovyan Ermenistan weke Kurdstanâ wê çaxê di bin nirê xanedana Faris û Osmaniyan de dipelçixi. Zilm û zordesîyeke zor û giran, li ser kurd û bi taybetî ji, li ser ermenên - ji ber ku fileh bûn - du car hebûn. Civaka ermenan, di tarî û taristanekê de bû. Dibistan, xwandin û nivîsin kêm bûn.

Abovyan li ser daxwaza bavê xwe, pêşî dest bi dibistanê dike. Di sala 1924'ê de, li Tiflisê xwendegeha Nêrsisiyan de rastî ermenîzaniyê, welatparêziyê têt. Li vir dest bi nivîsara helbestan dike. Ürisi û fransizi ji fêr dibe.

Di sala 1928'ê de, qava Abovyan xwendegehê diqedine, bi dîtinêm welatperwer û pêşverû tête Eşmeyazînê, li ser çiyayê Araratê. Li vir mirovîn paşverûyên olperest li hevberî ronahîdariyê û welatperwîriyê radiwestin, ji Abovyan re neyartiyê dîkin. Li pey wî dikevin. Wî bîryar dabû kû ji bo welat bijî û bimîne. Di sala 1929'ê de, bi profesorê zanîngeha Dorpatê, Frîdrîks Parrot re, li nehiyeyên Ermenistanê yek bi yek digere. Bi alîkariya Parrot re, sala 1930'ê de, li zanîngeha Darpotê de, dest bi xwandinê dike. Zimanê almanî li wir hin dibe.

Di mêjûya 1837'ê de, li bajare Tiflisê li dibistanekê dibe dersdar û li vê derê navendeke kêrhatî, lê bi awayekî neremî, ji bo xeba ta rewşenbîri û xwendîna civakî, vedike.

Di dawiya salên 30'î û di destpêka sala 40'î de, afirandina xwe ya bi nav û nişan Birîna Ermenistanê dinivîse.

Di nîvê salên 40'î de, di nava kurdên Ermenistanê de digere, bîr û bawerîyan berhev dike û afirandina xwe ya bi navê *Kurd-Ezidî* dinivîse. Di 2'yê meha nîsanê sala 1848'ê de, Abovyan sibê zû ji mal derdikeve û édi venagere.

Bi ser û binî winda dibe. Heya roja iro ji nehatiye zelalkirin ku ka ci bi serê Abovyan hatiye.

Abovyan wêjeyeke dewlemend li pey xwe hiştîye. Her çendî ji li ser problemên Ermenistanê bi kûrî munâqaşe dike, her wisân, weke dîroknaş û rewşenbîrek demokrat, li Rohilata Navîn de, li

ser dîroka civaka kurdan jî dinirxîne.

Abovyan di sala 1848'ê de, di rûpela pêşîn de, di çend hejmar-en rojnameya *Kafkas* li Tiflisê bi sernivîsa navê *Kurd* nîvisan dinivîsîne. Dîsan di vê rojnameyê de, nîviseka dîroknaşiyê bi navê *Ézidî* tête çap kirin.

Abovyan li nav civaka kurdan

Abovyan ji bo wan afirandinê xwe, du hette di nav qabileyên kurdan de digere. Ew dermafê vî tiştî de wilo dinivîse: "Par na pêrâr, min li gora daxwaziya li cî, ya Kombênkêndorfê, her çend sar û serma û seqem û roja cejâa bûyîna İsa bû ji, min ji hêla dem û zemani bêxem û bêxembarî, ji ser kîsê xwe, dest bi sefera xwe ya ber bi kurdên ézidî kir. Ez du hette di nava wan de mam. Min xelatê giranbuha, li pîr û jinan parve kir. Mîna ku ez ji hemû hêlan baweriya wan wergirtbûm û her bi vî cûreyî min li hindava hemû tiştan, bal û tema wan kişande ser xwe.

Min dermafê ferheng û toreya civaka kurdî de, dermafê dilevîndariya wan, dermafê helbesta wan de, ji du mehan bêhtir xebat kir. Min şev û roj dinivîsi. Lewra min bi rojan darfeta kar nebû. Min nîvisareke gelekî berfireh û kûr nîvisi. Min di nav vê nîvisara xwe de, merema xwe ya ji bo zaniyariya bi rûmet, serheng û piştîvanê hêja, şûngirê padîşahê mirovan diyar kir. Min vê nîvisare bi almanî nîvisiye. Gelek gîlî û pesindên dermafê wê de bihistine. Di demeke kurt de, ci ji destê min hat, min ji ber girt û amade kir. Lê belê neha xwedê zanê, li wê dera Almanya yan ji Tiflisê ew dirize." (Abovyan afirandin, cilt 7'ê, rûpela 194 - 195)

Ji Abovyan re tenê ne ev car bûye ku di nava kurdan de geriyeaye û ew rasthatina wî û kurdan a cara pêşîn bûye. Berî hingê wî kurd nas kiribû û kurdî baş zanibûye. Weke Qanatê Kurdo gotiye; Abovyan zimanê kurdî rînd zanibûye. Gelşa avahiya vî zimanî, rêziman û ferhengê wî ve mijûl bûye. Stranê kurdî bi vî zimanê almanî dide hozanvanê alman F. Bodênstêd. F. Bodênstêd van stranan di pirtûka xwe ya sê besî de "Hezar û yek rojên li rohilatê de" de çap dike.

ÇEND STIRAN Û DÎLOKÊN X. ABOVYAN ÊN BERHEVKIRÎ BI KURDÎ

KEŞİŞ - POLO

-Têkoşînî-

Kilama êzdîaye mîraniê derheqa
Şerê miqabilî tirka û serekêşîre
kurda - Şêx Qasim da - 1

Li Radovanê karî min dive,
Hespa Mîrza - axa hîr e - hîr e
Keşîş Polo li Şêx Qasimê kire gazî
Got : "Min eskerê te gişt qeland, serê wan firand "

Ber Radovanê ra çem dikişê,
Eskerê Şêx Qasim xwe da nave
Mîrza - axa û Keşîş Poloê êgal
Lê kirin gazî : "Me hezar syarê
We dane ber van rima "

Li Radovanê baxê tiryân e
Eskerê Şêx Qasimê kete wira,
Keşîş Polo lê kire gazî :
"Serê we boy me serê pîvazan e "

Delanê wê hejîr e
Şûrê Miçoy zincîr kiriye,
Miçoy kire gazî : "Xwedê şade ye
Mérxaşê min, birê min

Rimê me şikestine
Çeqmeqê qirmê me şîhistîne
Şûra bigrine xwe
Ü piştê va neferê me xweykin

Miçoy rakine piya
Pê şûrê Misirî wî ruhdarkin
Wekî saw bikeve ser kafir
Xwe me ra negîhîne"

(1) Êzdî vê yekê jî derheqa wî şerê êyan da gîlî
dikin. Ew Şêx-Qasim bona ruhdarkirina surmanê
xwe, pêşya ser êlam dike, wekî eger defa hewarê û
bor'ya şêrxin.

Wî çaxî hemû kela, sûr û bedenê êzdy wê xwe
berî xwe bihemin, imberê nanê wan wê batmîşbin,
gazî û norîna wiye êwlin ra gişkê bikevin ser çoka û
tiştê mayîn.

Wexta gîlî tê ser vê qalê, her êzdič bi kubarî bîr
tîne navê serekêşîre êzdy Mîrza - axa û keşîşê er-
menya Pogos, kijanî ra ew divêjin Keşîş-Polo.
Hema navê wî jî li vê kilamê kirie.

ŞÊR - PADISÊ DUNYA TEREWILA

-Têkoşînî, mîrani, egîdî -

Tu wexta bi temamî nêçîra nakujî,
Çawa dijmin divîne - ew dike humrîn
Ew wî bêçari dihîvişîne, ê ku ji ber wî direve
Xûb-Xan xût şerekî usa bû,
Ew li şera digerya, ew li qezyâê digerya
Ewî rast li orta çavê dijmin dinhêri
Çaxê hê nîze dilê wîra nekiribû
Tîrk xwe ditelîne mîna bûmê kor
Ber dijminê xwe, ew bi kirêti û fesal
Ew nahîvişîne ne ruha, ne jî qismî jîn
Ew zarê hewla daykêda difetisîê
Kevotk li wira dinya Terewila,
Dikine qewe-qew bi per û baskê xweye nazik
Kevotik bêfitya cuckê xwe hiz dike
Pê nikul risq dike devkê cûcika.
Xanim hema kevotkeke usa bû
Ewê por û gûliê dirêj dixemilandin
Niha ew bûye nêçîra tirkeki
Xan şerê giran da hate kuştin
Sekav cinyaza li wir bîn dike
Ew kîfa şevê li goristana datîne
Lê xûna teze rêtî, canya can dihîvişîne
Tu cara wir dîhar nabe, li ku êmir û evîntî hene
Paşa tîrk beyanîe barbarosa
Ew tenê xûnê fir dike, çawa teyrê har
Kurê min, bala xwe bide
Serê bavê xwe yi xûnê da gevezbûyî
Tîrk, lawîno, dilketî jî te stend
Nehilet li wî, kî du dilê evîn jî hev diqetîne
Nehilet zor û zorbera, kijan jî zelûliê avhêrsa fêm nake
Mezel merya tu cara paşda venegerîne,
Lê Melekî Tawis nîfrî me dibhê -1

(1) Eva şîera, kilama nava para cilda Abovyane heyştaye nîvisarnasiê de
bi tercîma zimanê almanî hatîye ciwarkirinê, kijan, hilbet, Abovyan kiriye. Ewî
bi kilamê kurdîye mayîn ra eva tercîma jî bi xeber-xeber ulîmdarê almanî nas-
kiri, kurdan Morîs Vagnêr ra şandye, kijanî xebata xweye "Seferberî İranê û
welatê kurda"- da ew daye çapkirinê (li Léypsigê S. 1852-a).

Sed heyf, wekî têksita vê kilamêye kurdi ne maye. Lê bi tercîmê jî, çiqası jî
em dicedin, nikarin cimle, xeberê wêye kurdi tam usa bidin dasekinandinê,
çawa ku ew berê, hêna Abovyan da hebûne, hatîne gotinê. Bona têksîa wê
zêî lev naeve, jî orîginalê, jî ya kurdi, ku hebûye, geleki dûr nekeve, me jî
aliê xwe da ew xeber tercîmeyi kurdi kiriye.

Vê kilamê da kurd zulmkari û nemerdya paşê tîrk tîne ber çava, ê ku bi
nemamî û destê zorê jîna kurde bi mîr dike, mîrê kijanê bi zulmkara ra di-
keve şer û xedar birîndar dive. Paşê tîrk şeqal jî xiravtir e.

Ew kîra wî dûri fikirdarya kurde, ê ku tu wexta nemerdya usa nake. Va
kilama, bêfitya, kurdê êzdi sîwirandîne. Ew jî cimla paşin tê kıvşê, kijanê da
navê Melekî Taûs tê dayînê, kijanî ew çawa pêximberê xwe dihevînin. Kurde
ser ayîna dînê, Mehmediê wê tu cara bi vî teherî bi qencî navê Melekî Taûs
hilneda. (Wezirê Eşo)

MİÇOÊ ŞÊX ÎSAÊ

- Mérani, egidi -

Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûmane
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdiya û van romiyan e [tirkan e - R]
Ax, gidino, Çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, cûkê heft biran e
Ax, gidino, serê Delanê şerekî jê giran e
Xwedê méri, Xwedê va éyan e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê çûkê heft biran e
Xwedê méri Xwedê va éyan e, Miçôê Şêx Isaê vê sivê
Kuştiyê 300 melê romiyayê xwey kitêb e, xwey quran e

Hewar e, bavo hewar e
Birayo hewar e,
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdiya û van romiyan e
Ax, gidino, çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e
Delana şewîti dînihîrim wê gezgezkê
Miçoyê Şêx Isaê sé denga kîre gazi, got: "Zadê, xaîngâ
birê xwa kirîbî, rabe mînegya birê xwe meheske
Miçoyê Şêx Isaê kire gazi, got: "Geli lawikê Anqosya!
De hûn lêxin, min vê sivê jêkirîye serê çarsid
melê romiyan e serbikesek e

Hewar e, bavo heware
Birayo hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ van romiyan e
Ax, gidino, çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e
Ax, gidino, wezê Delana xopan dînihîrim wê kimkor e
Vêsivê kafir Beşo bin Miçoyê Şêx Isaê da nûr e - nûr e
Xwedê méri xwedê va eyan e, vêsivê Miçoyê Şêx Isaê
Kuştiye pênsid mîrê romiya ye serbipor e

Hewar e, bavo hewar e
Birayo hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ û van romiyan e.
Ax gidino, çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e
Ax, gidino, wezê Delana kavil dînihîrim wê bi hiz e
Miçangê Şêx Isaê syarê çîçeka dêl gevez e
Vê sivê li Eraf vê meydane Miçoyê Şêx Isaê birîndar e
Ax xûna sor ber saqê sapokaraça dibeze
Miçoyê Şêx Isaê kire gazi, got: "Geli lawikê Anqosya!
De hûn lêxin, min vê sivê jêkirîye
Serê şeşsid melê romiya ye ber miraz e

Hewar e, bavo hewar e
Birayo hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ û van romiyan e
Ax gidino çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e
Ax, gidino, wezê Delana kavil dînihîrim wê bi hiz e

Miçangê Şêx Şêx Isaê syarê çîçeka dêl gevez e
Vê sivê li Eraf vê meydane Miçoyê Şêx Isaê birîndar e
Ax xûna sor ber saqê sapokaraça dibeze
Miçoyê Şêx Isaê kire gazi got: "Geli lawikê Anqosya!
De hûn lêxin, min vê sivê jêkirîye
Serê şeşsid melê romiya ye ber miraz e

Hewar e, bavo hewar e
birayo hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ van romiyan e
Ax gidino, çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e
Miçoyê Şêx Isaê xwedê hişt
Rişi-sûr mertala pola jê ra bûne ben û piştî
De vê sivê şürekê Miçoyê Şêx Isaê dane, orta meydane
Bûye mînani mîrekî nivkuşî, weê, weê

Hewar e, bavo hewar e
Birayo hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ û van romiyan e
Ax, gidino: Çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûman e
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e

Wezê Delanê dînihîrim kevirê şin e
Keseki xêra xudan tunîne
Carekê daxê Keşîş Polo ra
Bê: Keşîş Polo, malik li te xirav be, ocaxê te kor be
îşev sê roj e û sê şev e mawizera destê Miçongê Şêx Isaê da

Li êrafê meydane ingirî ye ne diteqe, ne dike deng e
Keşîş Polo kire gazi, got: "Geli ézdyâ! Serê xwe reşmişotkin
Kê berê xwe dide şerê Delanê, ber çavê wî dibe mijdûman e"

Hewar e, bavo hewar e,
Birao hewar e
Dayê hewar e, hewar e
Ne berf e, ne baran e
Ne mij e, ne dûman e
Ne erd e, ne ezman e
Serê ézdyâ û van romiyan e
Ax, gidino, Çiyayê Delanê ber çavê min bûye mij dûmane
Ser xweş kiriye Miçoyê Şêx Isaê, çûkê heft biran e

Ax birano, wezê Delanê dînihîrim, wê bi war e
De gelî ézdyâ, hûnê xwekin li xwedékin
Hûnê serê Ezidîde xweki sor kin
Hûnê şemsê xwekin
Hûnê ocaxê şêxa û pira kin
Hûnê piştî Miçoyê Şêx Isaê bidine darek-dara çinarê ye
Hûnê şûrê hêşin, bidine destê li rastê ye
Mertala pola bidine destê li çepê ye
Bira eskerê româ reş bê derbaz be,
çav Miçoyê Şêx Isaê keve, jê bikşîne tîrsê û xofê ye
Bira bêje, "Miçoyê Şêx Isaê xweş e, rûbarê li dinê ye"
Hetanî hêşîrê ézdxanê derbaz dive ji avê ye
Hewar e, bavo hewar e...

Dumahîk di hejimara pêşin de

HELBEST HOZAN HELBEST HOZAN HELBEST

GÜLA EVİNÂ MIN

S. Botanî

Pir pir ciwan rengê te ye
Êhmed XANÎ dengê te ye
APO li ser cengê te ye
Cizîr û Şengala minê

Soza dil peymanê te ye
Xwîna min dermanê te ye
Min çav li fermanê te ye
Tu cejn û sersala minê

Çayayê Cûdî bejna te ye
Xemla NEWROZ cejna te ye
Dilsoitiyê dîtna te ye
Rengê te ser ala minê

Me dil evîndarê te ye
Ji mêjve xwîndarê te ye
Pêşmerge guhdarê te ye
Rewşa te pergala minê

Ez bang û hawarê te me
Xîçek ji nîgarê te me
Hişyar û xemxwarê te me
Hey xâç û hîlala minê

QELENÊ GIRAN

Rûbarê xap û pilan
Her jê dicit xwîn û zêr
Jêr sitema bê pivan
Sêwî dîkin qêre - qêr
Bê derman û cil û nan
Rojek bîrsî, yek nîvtîr
Birîna derdê giran
Hemû kîrin şoreshgêr
Agrê vîna serbestî
Ketye dilê jin û mîr
Yan azadî yan mirin
Dinya bûye xebatgêr
J' bo qelenê azadî
Her divêtin xwîn û zêr
Karwan dicit ber bi jor
Venagerê ber bi jêr
Pêş da dicit gav bi gav
Li pey rînasen dilêr
Tengav bûye koledar
Pire lawaz û newêr
Şengedara wî rîzi
Rûvi idî nabit şer

BÜKA BOTAN

Hey bajarê min
Sîrta pir ciwan
Hey mala minê
Behîşa cîhan

Xwîna sor a germ
Herdem li dilan
Navê te xweş e
Pê wer kim gulan

Îro NEWROZ e
Muzîk û dîlan
Di gel xweşiyê
Dengê tifengan

Nazê Goyanî
Ji Sîrta Botan

SORESA ME

lehiya Serxwebûnê

Behr e Kurdistan
Û "nalewitit bi devê seyi"
Ew genî meydan...
Dibê pak dema radibê leyî

Binêrin! Va kom dibine
Dilopên baranê
Bibhîzin! Tekez dê bine
Lehî l' Kurdistanê

LEHÎ

Ev lehiya agir û pêt
Ji kaniyên xwîn û xuhdan
Sax dikit birîna welêt
Bi ramûsan, bi ramûsan

Ev lehiya coşî rengîn
Ji xebata bê rawestan
Ronahiya gelê xemgîn
Ji ramûsan, ji ramûsan

Ev lehiya bîr û bawer
Ji volkana partîzanan
Hêviya jaran her û her
Cî ramûsan, cî ramûsan

Siyabendê Şîşî

EY GELAWÊJ!

Evdilla Goran

Be şew geşt û guzarî xatirat her wek şîney şewba
Le rohi pir leessurma eka sehrey xefek berpa

Elêy behrekî qûl û meng e dînyay pir le bêdengî
Beserya heja-hej erjê enînim sozî ahengîl

Heta ser rûy zewî çin çin newîwe perdeyî tarî
Le xoşîm diyar niye wêney dilopî eşki bêdarî ...

Dilim wa gêj eda gerdawî yeis û naumêdiy reş
Meger to bêyte imdadim Gelawêjey sitarey geş!

Meger to, ey Gelawêj! Ey bizayê lêwî sehergahanî!
Meger to bisrewêni qulpî êşî qelbî bêsamani!

Le çawî to we pişingê egate rohî bedbextim
Eka mestî tesellî ta şewi duwayî serî sextim

Desa ey şasitare! Ey Gelawêjî geş û taban
Ke helhatî be egrîcet bişo çawî şewî gityan!...

EM HATIN

Em hatin, hatin, hatin
Ji derya Wanê hatin
Weke Dîcle û Ferat in
Bi rêzanî em hatin

Dêrsimî, Agirî ne
Kurmanc û Soranî ne
Leheng ji dil kelî ne
Fidekar in em hatin

Ji berbangê em rabûn
B' ramana APO şabûn
Li dijî kedxwar û neyaran
Em rabûn, rabûn, rabûn

Bi Egîdî b' nav û deng
Bi Xeyriyê weke fişeng
Bi hevalêن pir leheng
Em rabûne dikne ceng

Cenga me pir giran e
Cihan tev de dizane
Neyar li ber erzan e
Erê mixtar bizane

Bo welat tim dinalin
Rext li pişt in li kar in
Artêş in tev de ar in
Neyaran pê disojin

Kobanî

MËŞA AZADIYÊ

Karkêr û gundî şîyar bûn
Xwendekar hatine meydan
Ala serxwebûn rakirin
Şoreş geş bû li Kurdistan

Beg û noker tev revîn
Cih nemaye ji bo wan
Bi dengekî bilind gazi kir
Bijîn kurd û Kurdistan!

Karker, cotyar, xwendevan
Rêka şoressê digirin
Her dem diçin bi raman
Wan berxwedan nas kirin

Daketin serê çiyan
Heviyên gel geş kirin
Me tevan hêvî ye ew
Kurdistan rizgarkirin

Ev meşa azadiyê
Me can dayê ser destî
Bi rûmetî ketin rê
Li ser rêka serbestî

**Mamê Hevîndî
Atîna****MİLLETÊ KURD IM**

Milletê kurd im
Ziman ê bav û kalanê min e

Xweş li dîrokê min e
Zerdeş, ew kalê min e

Kawa'yê Medya ava kir
Xwediyê dîroka min e

Orta Dîcleyê û Ferad
Mezopotamiya a min e

Ji dema hovîtiyê ye
Şer li ser serê min e

Serê xwe qet natewînim
Berxwedan karê min e

Ser çiyan jîndar dibim ez
Rim li ser milê min e

Şer dikim bi şûr û mertal
Şal û şapik li min e

Qet di şer de neşkestim
Medya nişana min e

Şerkirê şûr û rima me
Gurz û mertalê min e

Sê sidê salan di şer de
Min dijmin şikandine

Milletê bin destê aşûr
Min tev rizgar kirine

Agirê newrozê va ye
Hîn li ber çavê min e

Ser çiyan ez vêdixînim
Cejn û sersala min e

Dawet û dîlan dikim ez
Hêjî govenda min e

Xwediyê helbest û ziman im
Kum û kolazê min e

Lê tenê dijmin bixapa
Em di xew ra kirin e

Di serê me de dixwendin
Şûş dibû mejiyê min e

Dîroka bav û kalê min
Tev de şewitandine

Ew bûye xwediyê dîrok
Û nav û nişana min e

Mozobotamiya minî nuh
Ev Kurdistana min e

Hawîr dor diz û kaleşa
Tev li hev par kirine

Ç iyayê me tev qelaştine
Rê ji xwe 'r vekirine

Malê me ser erd û bin erd
Tevde talan kirin e

Şerm e ku idî bibêjim
Welat ne doza min e

Herim li Parîsê rûnim
Xwe bavêjim dijmîna

Otonomiyê bixwazim
Bê jim ev besî min e

Deng û hawara Helebça
Hîn li ber guhê min e

Ez ji wê xewê şîyar bûm
idî ev roja min e

Ez nema ti car dixapim
APO serokê min e

Va diçim şerê gerîl a
PKK partiya min e

Têkoşîn nuh bû bi carek
Serxwebûn doza min e

Va ye ERNK ava ye
Ev yekîtiya min e

ARGK daketiye şer
Li her derê dengê min e

Bagok, Agiri û Botan
Gabar li pişta min e

Ew keç û xortêni di şer de
Xemla welatê min e

Xum - xuma BKC li cûdî
Ew serihildana min e

Cenga partîzanê kurd
Hostaye APÊ min e

Şewqa ku daye cîhanê
Tîrêjîn roja min e

Rizgariya karkerêñ cihan
îro armanca min e



Karlêne Çaçanî

REWŞENA MIN

Pêşkêşî kovara REWŞENÊ dikim

REWŞENA min, gula min
REWŞENA min bîna min
REWŞENA min sebra min
Nîfûs û şemedena min

REWŞENA min, stêra min
REWŞENA min şemsa min
Rewş û rébera min
Nexş û nîgara mala min

Bîn û bexça te REWŞENÊ
Naz girtiye Kurdistanê
Bûye komekdar, qewet û zal
Boyî xebatkar, boyî her cotkar

REWŞENA min, de pervede!
Li çiya û baniya Tu şax bide
Ü bikeve ser - govendiyê
Hijmekar ke Tu vê dinê

Karlêne Çaçanî

*KURDISTAN
DÊ AZAD BE*

Gul û sosin xeyirî ne
Nakan qibîn kew û bilbil
Êdî "nastirê" cem û kanî
Nalîlîne bayê dîn

Kêçêñ kurda cêr helanîn
Êdî naçîne ser kaniyê
Xortê kurda kihêl naison
Dayik pêtiyêd navê

Kurdistanê mij dûman e
Reş, mişotin çiya, banî
Xûna gevez jê dikişê
Deşt û zozan digirîn

Roma xayîn dîsan li vir
Şûrê kevan hildaye
Hev berdaye heyayêd kurda
Wêran dike tev pê da

Bes e j' we re tirkê devxûn!
Bes e xûna kurda birêjin
Pak bizanibin nav wê xwînê
Hûnê lê bixeniqin

Bes e wêran cehsêd neyar
Pişa dijmin negirîn
De bîr bînin kîrnê tîrka
Kîrnêd gurêd dev be da

Tîrk xayîn e bê abûr e
Bawer nekin sozêd wan
Çin, mîda la wê de bavê
Netin qûlêd wan tîrkan

Dest bidne hev gelê kurda
Ez qurbana we şêra
Wan neyara bavê dehlê
De dest ve bînin azadiyê

Kurd timê ji mîrxas bûye
Sûr û mertalê hildaye
Ji bo azadî û rastiye
Bi mîrxasi şer kiriye

Kurd timê ji dîlxas bûye
Xwediyê keda xwe bûye
Xwedê şeed ev yek diye
Lê çîma wa dizêre

Na wê altke rastiye dinê
Kurdistanê azad be
Çiya û banî wê bixemilin
Gulêd gevezê vebin

Ez bawer im gelê kurd
Ew roj êdî nêzîk e
Hev re rabin dest bidin hev
Hev re bi tifaq û yekbin.

Karlêne Çaçanî

*SELMAQA GEOGRAFYAYÊ*Çerkezê Reş

Qîza min vege riya û giriya
Qîza min vege riya û giriya


-Ez êdî naçime mektebê
Ez êdî naçime mektebê

Dersdar qet tiştekî nizane
Dersdar qet tiştekî nizane

Min xwest ser xerîte bibînim
Min xwest ser xerîte bibînim

Lê wê got - "Kurdistan tuneye!"
Lê wê got - "Kurdistan tuneye!"

Qîza min vege riya û giriya
Qîza min vege riya û giriya



Çerkezê Reş

Mirovekî helbestvan, welatparêz, dilsoz, ku her dem li ser evîniya welat e. Ew dixwaze li ser rewşa gelê xwe bi nîvis û xebat bi dilgermi rohni bike.

Di sala 1955'ê, li Eşmeyazinê - Rewşanê, ji dayika xwe bûye. Sala 1977'ê li İnstîtuya X. ABOVYAN a li Rewanê, beşê Pedagogiyo gihandîye dawiyê û dûre di sala 1980'yi de xwendina xwe bi serkeftinî biriye seri.

Sala 1980'ê pirtûkeka wî li ser zanistiyê bi zimanê ermenî hatîye weşandin. Ji sala 1967'ê û pê ve, helbestên wî di weşanên Komara Ermenistanê de, weke yên bi navê Buhara Teze belav bûne.

Çerkezê Reş heya vê rojê bi vehûnana helbestan ve mijûl û geleki hezkiriyê gel e.

Pirtûkeka Îsmaîl BEŞİKÇÎ ya bi navê TUNCELİ KANUNU VE DERSIM JENOSIDI / QANÛNA TÙNCELIYÊ Û JENOSIDA DÈRSIMÊ *

Nivîsevanê zanistdar, doktorê sosyo-logiyê û ji dostêñ herî bi nîrx ên gelê kurd Îsmaîl BEŞİKÇÎ, berî sala 1980'yi, pirtûkekê amade dike. Ji ber hinde sedemêñ ku nivîsevan bi xwe, jê geleki diqehere, ev pirtûka wî çap nâbe û pirtûk ji meydanê winda dibe! **Îsmaîl BEŞİKÇÎ:** "Gelek aşkere ye ku ev ji bo nivîsevan derbek mezin e. Tişteki welê ye ku bîhna nivîsevan teng dike, wî difetisîne û riya kar li ber çavêñ wî reş dike." dibêje, di pêsgotina vê pirtûka xwe ya teze çapbûyi de. Bi berdewamî dibêje: "Ev vekolînek bû ku diviya çap bibûya. Pirtûk di rewş û hoyêñ salêñ 1976 û 77'ê de hatibû nivîsin. Kêmasiyeka mezin bû ku di merc û hoyêñ wê demê de pirtûk nehate çapkîrin.

Ev vekolîna destê we, ne nivîseka ji nû ve hatiye amadekirin. Ji têbîni û perçenîvîsîn ku di salêñ 1976 û 77'ê de hatibûn nivîsin, ji ber wan hatiye wergirtin."

"Derhatina qanûna Tûnceliyê (19-35) û bikarhanîna vê qanûnê, ji hêla nişandana dîmensionîn dagîrkeriya tirk, ji hêla nişandana wêrîna meydanwendînê li hevberî milletê kurd û gîrsêñ kedkarêñ kurd ve, bûyer û qewimandineka gelekî girîng e. Li hêla dinê girîng e, were vekolîn û zanînê, ku bikarhanîna vê qanûnê li ser mirovan ci poside û pêkiriye hîştiye û mirovan vê qanûnê çawa nas kirine. Vekolîneka li ser vê babetê, ji hêla nişandan û eşkerekirina li deriveyî zanistiyê mayina unîversîteyên tirkî ve, profesorên tirkî ve, nivîsevanîn tirkî û bi kurtî ji, ji hêla nişandan û eşkerekirina valabûna fikra tirkî ve, ji spartek û fenomenan dûrmayina wan ve, ji hêla nişandan û eşkerekirina çendîn lipêşbûna wan a li warê derb li domana zanistiyê xistinê ve, bêrohnîbûna wan û li ber îdeolojiya resmî xweşîrînkerîna wan nişandanê ve, gelekî girîng e. Awayê têgehîn û bidestgirtina qanûna Tûnceliyê û kîrinêñ vê qanûnê, ji hêla "Çep"î tirkî û bizava wî ya "Sosyalîst"iyê ve ji, herî hindik şerm û fedîyeke mezin e.

Qanûna Tûnceliyê û kîrinêñ vê qanûnê, sparteka pêncemin a ji dîroka Cumhûriyetê ye, ku me ji bo lêgerîn û nîrxandinê hilbijartiye. Di vê lêgerînê de, daniştinêñ meclîsa tirkî li ser Vê

Qanûnê, piştî ku sedem û pêdivîtiya Qanûnê tete eşkerekirin, li ser vê bûyerê awayê xwenîşandana dîtinêñ unîversîteyên tirkî, profesorên tirkî, filozof û nivîsevanîn tirkî, çepê tirkî û awayê bidestgirtin, têgehîn û nîrxandina wan a li ser Vê Qanûnê, hatiye rexne-kerin.

Di vê navberê de ji, karguzeriyen qetîlamî, ên li Kurdistanê û bi taybetî ji ên li Dêrsimê, bi alîkariya jêder û binyadêñ cihêring dihêne raxistin li pêş çavan." dibêje Îsmaîl BEŞİKÇÎ di pêsgotina vê berhemâ xwe ya derengçapbûyi de.

Nivîsevan, di berhemâ xwe de, weke di her berhemekâ xwe ya din de kîriye, hemû diyardan û iddiayêñ xwe, bi cih, bi nav, bi nişan, bi hejîmar, bi jêder û binyadékê ve girêdide. Ji bo nimûne; li ser vê Qanûnê di meclîsa tirkî de ci hatiye gotin, kê ci gotiye, hemû, yek bi yek derxistiye meydanê û nivîsiye. Ji bo her xal û rewşekê ji, di paşıya pirtûkê de dîtin û diyardanê xwe yên rasyonel û rast rîz kirine. Di beşekê de, li ser awayê bikarhanîn û kîrinêñ vê Qanûna qîrîkînî û hovane radiweste û ev Qanûn, qanûneca çawa ye, ji xwendevanan re şirove dike. Sernivîseke besê pêncem a pirtûkê, welê rîz kîriye: "Jenosidi meşrulaştırıcı bir araç olarak Tunceli kanunu" dibêje. Anku: *Qanûna Tûnceliyê, navgîneka meşrûkîrîna Jenosidî ye ...*

Li ser vê yekê kada bîranîn û diyardanê M. Nûrî DÊRSIMI ji dike. Li ci ciyê û bi ci awayî jenosidîn hovane çêbûne, M. Nûrî DÊRSIMI li du pirtûkên xwe yên bi navê Bîranînên Min û Di Dîroka Kurdistanê Dê Dêrsim bi berfirehî kad û çêl dike. Îsmaîl BEŞİKÇÎ di binê sernivîseke bi navê "Nûrî Dersimi'nin anılarını doğrulanın resmi yayınlar" de, bi spartek û belgeyên dizî û dewleta tirk, li rastbûn û licîhbûna diyardan û bîranînê M. Nûrî DÊRSIMI dibeste, teyîd dike. Li ser kîrinêñ jenosidî welê dînîvise: "Bûyeren ku bi piranî di vê jenosidî de diqewimîn ev tişteñ hovane bûn: Jin, keç û xort, zaro û kal, tev de dikîrîn şikeft û hevingan û wan bi saxî dişewitandin. Gazên jehrê li şikeftan werdikîrin û yên ku ji ber vê gazê direviyan derdikîtin der, li gulebaranê rast dihatin. Serê zaro û bîcûkîn kurd jêdikîrin û sur têre diçikandin. Sur di zikê Jinêñ avis dikîrin. Serê zaro û bîcûkîn li keviran dixistin û dipelaxtin. Di vê jenosidî de kîrinê

Tunceli Kanunu (1935)
ve Dersim Jenosidi



Bilim Yonetimi, Türkiye'deki Uygulama: 4

BILIM DİZİSİ

Pirtûka Tunceli Kanunu (1935)
ve Dersim Jenosidi

welê hov siyaseta wan a herî bingehîn bû. Şewitandin û kavîkirina gund û darîstanan, kuşin yan ji talankirina heywanan, jehîkirîna av û çeman heleka din a vê siyaseta qirkirînê bû."

Bêdengmayina profesor, nivîsevan û rewşenbîrên Tirkîye li ber vê qirkirîna mezîn, babetâ herî berfireh a rexneyen Îsmaîl BEŞİKÇÎ ye. Unîversîteyên tirkî, ji parastina maf û berjewendêñ mirovatîyê bêhtir, xwedî hewildan û karvaniyeka xweşîrîn-nîşandana li ber Şefî Mezin - Mistefa Kemal bûn. Li vê derê navêñ rewşenbîr û nivîsevanîn tirkî ên herî nasîkî derbas dîbin. Weke navêñ Prof. Dr. Faruk Erem, Ord. prof. Dr. Hifzi Veldedeoglu...

Di beşekâ dinê de nivîsevan behs û rûberkirina dema bikarhanîna qanûna Tûnceliyê û di wê demê de têkilî û girêdanê Tirkîye bi derve re şirove dike. Di vî beşî de, pêşveçûn û têkilîyên li herêmê û li tevayî cîhanê şirove dike. Her wisan di çapemeniya tirkî de pesindanê ji Almanya Nazî re eşkere dike û hevgirêdana qirkirînê demê digire dest. Li ber vê qirkirînê, li hundîr dîtin û bidestgirtina çepê tirk û bizava wî ya sosyalîst û li derve ji dîtin û bidestgirtina Internasyonalâ III KOMMINTERNê, li ser vê qirkirînê rexne û mehkûm dike. □

(*) Dijmin navê vî bajarê birîndar kîriye:
Tunceli...

HÊMIN

(1921 - 1986)


Mehabad Kurdî

Gelî kurd wek her gelêkî tîrî ser rûyî em zemîne pan û berîne xawen, zor le honeran û zanayan û kelepiyawani hêja û nawdare ke bûnête meşxel le pênañî ronak kirdinewey rîgây rasteqîney jiyan û xebatî kurd û Kurdistan. Her weha le heman kat da êmey kurd zor dewlemendî le rûy folklor û edebî mîlli û pendi pêşinan û kultur û dab û nerîtî nîw komelgay kurdewarî. Helbete le her kat û satêk da çend zanayekî pateberiz lenew milletêk da heldekewin û debne rîpi şandderî ew gele û momî roşînkerewey jiyanî komel. Ewaney ke temenî jiyanî terxan kirduve û deken le pênañî xizmetkirdinî rolekanî niştiman da, ewa nawyan hergizawhergiz be zîndûyî demêñnewe û qet lebîr naçnewe û le laperey mîjûy gel û netewe da denûsrênewe.

Yekê lew honere nemiraney gelekeman ke hemîşe bo kurd û Kurdistan desûta û deqîça mamosstay payebariz û hêja (Hêmin) bû. Lîre da demewê kemê basî jiyanî (Hêmin) î nemir bikem: Mamosa Hêmin le salî 1921 z le gundi Laçîn le rojhîlatî Kurdistan hatote cihanewe. Nawî bawîkî Hêmin (Seyit Hesenî Şêxulîslamî Mukri) bû, ke le torey Mela Camî Çorî bû 300 sal lewepêş hatote Sabrax (Mehabad) û binemaleyekî gewrey lew melbende pêkhînawî. Dayîkî Hêmin nawî (Zeyneb) e û kiçî şêxî Burhan bû ke êsta binemaleyekî gewrey mukiryan in. Le sereta da Hêmin le xizmet mamosa Seîd nakam fêri elfûba û xiwendîn bûwe, inca nardirawe bo quatabxaney Seadet le Sabrax û lewê fêri zimanî farsî bûwe û ciwar kilasî xiwendûwe. Duway eme çûwete Xaneqa û ciwar salîşî lewî be xiwendîn beserbîduwe û her wek xoy delêt: Ew ciwar sale xoşîrin salekanî jiyanî min in. Mela Ehmedî Fewzî ya Melay Silêmanî ke zanayekî Kurdistanî başûr bû zor karî le Hêmin kirdûwe û boye Hêmin debêjet: Debê bilêm min deskirdî Fewzîm. Ew helîweşandimewe û têkîhêşlam û serlenîwî diristikirdimewe !

Hêmin her le hereti laweti da karameyî tewawî le edebî farsî û kurdi da peyda kirduve û boxoşî honrawey becoşî danawê û zor le diwane şierekanî şairanî kilasîkî kurdi xiwendotewe, wek: Mewlewî, Heriq, Mehwi, Edeb, Nalî, Kurdi, Salim, Hacî Qadirî Koyî û Wefayî. Her weha kitêbekanî Eskendername û Emîr Erselan û Şiroye û Hüsenî kurdi peydakirdûwe û xiwendotewe.

Bari nalebarî ramiyarî Kurdistanî Rojhîlatî ewkat zor karigerî hebûwe le ser jiyanî Hêmin. Katê komeley JK (Komeley Jiyanewey Kurdistan) damezra, ewa Hêmin bûwe yekê le endamanî ew komeleye û weke be xoy delêt: Endametî komeley JK goranekî seyîr beser min da hêna. Yekem honrawey Hêmin le jimare dûy govarî



Hêmin

Niştiman (Organî Komeley JK) da bilawki-rayewe, sernûserî em govareş mamosa Zebîhî bû. Duway ewey ke endamanî komeley JK destiyan kird be damezrandinî Hîzbî Demokratî Kurdistan - KDP le salî 1945 û her le ser binaxey rîkxirawî komeley JK, alugorék pêk hat lem búwareda. Qazî Mihemed be pêşeway hîzib helbijêrdira û Hêmin'ş bo yekem car leberdem xelik honrawey xiwendewe. Paş damezranî komarı Kurdistan le Mehabad (1946), Hêmin rolekî zor çakî gêra le karî nûsîn û çapemenî û bilawkirdinewe da, bo nimûne le rojname û govarekanî Kurdistan û Hawarî kurd û hawarî niştiman û Girûgalî mindalan û helale da honrawe û witarî bilawkirdotewe. Bedaxewe komarı Mehabad teniya 11 mangî xayand û paşan be yarmeti imþîyalizmî Emîrka û Berîtan-îya şay gorr be gorr tuwanî em komare sawaye lenaw bibatû gelî kurd tûsi perê-şanî bikat. Helbet e em karesate bo gelî kurd û Hêmin gelê cerigbir û diltezen bû. Hêmin tûsi rawedûnan û azar û zahmetiyekanî jiyan hat. Duway çend sal rûy kirde Kurdistanî Başûr û bo maweyek lewê gîr-sayewe.

Duway şoreşî gelanî Eran, Hêmin iş paş saleha derbederî gerawê bo baweşî Kurdistan û be dîdarî xaw û xézan û kes û kar û dost û biraderan şad bowe. Le Mehabad ta cengî sê mange berpirsiyari rojnamay Kurdistan bû. Le Kongirey ciwarî Hîzbî

Demokrat - KDP da be endamî şanazî helbijêrdira û kongire naznawî şairî Millî.

Pêbexşî, mamosa Hêmin le katî pîrî û keneftî û nedarı abûrîş da neywîst ziman û edebî kurdi le Kurdistanî dagikiraw da bifewtêt û destî kird be bilawkirdinewe govarî Sirwe, bê guman em govare xizmetekî çak dekat be edeb û kelepûri Nete-wekeman.

Honerî nawdarî kurd Hêmin le 17.4. 1986 dili pir le evîn û xoşewistî bo Kurdistan le lêdan kewit û giyanî pakî xoy sipard be xakî razawey niştiman. Le şin û pirsey Hêmin da nek her le Kurdistanî belku le Ewropaş korr û kobûnewe sazkiran û bas û xiwas bilawkiranewe. Be rastî merîgî Hêmin ziyanekî mezîn bû bo gelî kurdi qareman, belam Hêmin nemirdûwe û namîre Hêmin! Hezar silaw le giyanî pakî Hêmin!

Basêk Derbarey Honrawekanî Hêmin

Bêguman ke Hêmin yekêk le şaire here berizekanî kurdi serdemî ême ye. Belam şeri Hêmin her le seretewa le ciwarçêwey edib û nûseran derçûwe, lenaw komelanî xeliki Kurdistan da bilawbotewe û her le seretasewe le dilî hemû kurdêkî dilsoz û niştimanperwer kariger bûwe û ewanî berew xebat le pênañî rizgarî gelî kurd da

handawe. Hêmin le seretawe şairî gel e û her be şairî gelîş mawetewe. Sih sal ziya-

tir e hezaran xebatkerî kurd pêkewe legel

Hêminî şair hawar deken:

*Gerçi tûşî renceroyî û
hesret û derd im emin,
Qet le dest ew çerxe siple nabezim
merd im emin!
Min le zincir û tenaf û
dar û bend bakim niye
Letlet im ken, bimkujin,
hêsta delêm kurdim emin!*

Kakey Fellah honer û nûserî Başûrî Kurdistan le rojnamey Hawkari çapî Bexda le ser Hêmin denûsê: Hêmin Mikuryanî şairî kurdperwer û mirovwist û ciwanî perîst û awareman, yekêk e lem şaire hel-kewtuwaney em serdememan ke wek bil-bilêkî xoşxîwê be ser liqî berizî hunerî şieri kurdîye û bestey besoz beser awat û hîway duwarojî kurd û xebat û ciwanî û awareyi dexiwêne. Eger birwanîne-sercemi şiere siyasiyanî, ebinîn gewherî biwa be serkewtinî kurd le dû tiwê hemû beyteka edrewşîtewê tenanet lew beyteş da:

*Ta be dasî ew pale bekarey kurdî
Dirik û dalî sererê giştî nedîwên degrîm.*

Nûserî nasraw Mihemmedî Mela Kerîm le débaçeyek da, ke bo kitêbî Naley Cudayî Hêminî nûsiye, delêt: Le naw ewane da ke min pêşanîş û şierî enûsim û min her dû core berhemekyanî xiwendotewe, le ereb da Nezar Qebbanî û le kurd da Hêmin... Paşan delêt: Minîş - Hêmin - im wek êwe û bigre ziyatîrîş xoşewê. Sererray şairyettekey, min boyeş im xoşewê çunke remzi meseleyeke ke be yekê le piroztîn meselekanî em çerxey ezanîm: Mesley xebat le pênavî azadî niştiman û serberizî hawilat û rêzlîgirtinî hemû ew mafaney ademizad da ke eger yekêkiyanî lê zewitbikrê wa ezanîm beşêki gewrey mirovayetiyekey pêşêkirawê. Emaney serewe ray çend kesêk bûn derbarey Hêmin.

Eger mirov birwanête honrawekanî Hêmin û le mana û mebestekaniyan têbi-gat, ewa zorbey zoryan terzan kirawîn bo piştîgirkîjîrdinî xebatî gelî çewsawey kurd man û azadî xakî Kurdistan. Hêmin zor car le honrawekanî da basî zorlêkirawî netewey kurd dekat. Le Duwaroju Rûnak da delêt:

*Lemêj bû heqqî kurd de xura be fîro
Lemêj bû kurd bû deykird şîn û roro
Le meydâni şeqêni dîjmîni da
Ser serdarî kurdî bû wekû go*

Hêmin eger ci lenew malbatêkî xi-wapêdaw û nasraw da perwerde bûwe, belam zor riqî le çinî dewlemend û axa û begekan e. Le honrawey benawbangî xoy da Deylêm û Bêbakim, delêt:

*Ewî axa bê bêkar e
Dizî û rîgirtinî kar e*

*Le şerim û şüreyî mirdim
Ke axa abrûy birdim
Cebûn û qels û lasar e
Emin deylêm û bê bak im
Be xom min çon bilêm kurd im
Emin deylêm û bê bak im*

Mirovî rencder û zehmetkêş, ca ci cotiyar ya kirêkar ya hejar û kasibkarî kurd bê lay Hêmin gelê xoşewist bûne, le Areq û Tin da delêt :

*Min cûtiyar im, min cûtiyar im
Min legel hetaw hawkar im
Min be areq û ew be tîn
Baskî min û tîşkî ewî
Ger cûtiyar areq nerêjê
Danıştûy naw koşik û qela
Daman riştûwe binaxey jîn
Bijêw destênin le zewî
Ger hetaw tîşk nawêjê
Dexon nanî gela gela?*

Berxwedan û xebat le pênavî welat régayekî dûr û dirêj e, hewraz û nişêwî têdaye û serkewtin şikidişî legel daye, belam Hêmin nebez û kolneder e û hengaw denêt ta tiropkî rizgarbûn.

*Min perwerdey bin sêberî eşkewtim
Gelêk caran le çalawî reş kewtim
Hatime derê, hedam neda, nesrewtim
Derrom berew aso, berew asoy rûn
Derrom derrom, ta tiropkî rizgarbûn*

Dili Hêmin herkat tijî bûwe le evîn û xoşewîşti niştiman û le ci kat û demêk da xakî welatî le bir neçotewe:

*Le şayî da le wextî helperîna
Le xoşî da le katî pêkenîna
Le korri matem û giyan û şîna
Emin ey niştiman tom her lebîre
Lê kiwêstanê demî rawşîkarê
Le mezraye ke xom helkird le karê
Le cêjiwanê ke degûşim memkî yarê
Emin ey niştiman tom her le bîr e*

Hêmin hemîse rolekanî gelî kurd han-dawe bo xebat û têkoşan dijî dagîkeran û debêjê:

*Mewêste, xot meginxêne, metirse
Le fişal û le buxtan û le demgo
Desa xot helk e, rî bibrre be gurci
Birro pêş bê wiçan, lê bixurre boja*

Jin û xoşewistî lay Hêmin pil e û paye-keşî taybetiyan hebûwe, belam lewan ziya-tîr û xoşîr azadî bûwe :

*Belê sexte, yekcar sext e
Belam le jîn xoşewistîr*

*Dûrî le jîn, namiradî
Lelay min etoy azadî*

Her weha zor car le honrawekanî da keçi kurdî handawe bo xiwendin û fêrbûnî

zanist û berewpêşeweçün û delêt:

*Koyleti bawî nemawê
Kîjî kurdî xoşewist
Rapere heste le xew
Axir ci wextî xewtine
Derke bişkêne, peçe bidirêne
Rake medrese
Ç arî derdî kurdewari
Xiwendin her xiwendin e*

Hêminî nemir zor kat le honrawekanî da basî derdî teniyayî û dûrewelatî û derbe-derî ekat, be taybetî le qeside dirêj û be-nawbanekey ke nawî Naley Cudayî ye delêt:

*Derdî dûrî... derdî dûrî kuştîmî
Derdî wişyari û sebûri kuştîmî*

*Yadî yaran û wilatim roj û şew
Ley heram kirdim qerar û xurd û xew*

Her weha debêjê:

*Kurdewarî, ey wilate ciwanekem!
Rolekem! Xêzanekekem! Bawanekem!*

Her çende Hêmin tûşî sextî û hejarî û derd û azarekanî rojgar bûwe û leberdem dagîkeran û siyasetî çepelaney ewan dijî gelekeman le Kurdistan hergizaw hergiz kolî nedawe û le ser dawa rewakey xoy súrtir bûwe:

*Dengirî,
emma le girtûxane riq estûrtir im
Lêmeda,
emma le ser dawa rewakem súrtir im
Demukjê,
emma begij celladekem da dêmewê
Kurd im û natwêmewe, natwêmewe*

Hendê Le Berhemekanî Hêmin

1 - Tarîk û Rûn / Honrawe, 1974

2 - Hewarî Xalî, Pexşan

3 - Naley Cudayî / Honrawe Bexda 1979

4 - Paşerok / Kurdistanî Rohelat

5 - Tuhfe El - Muzeferîye / Komele Bey-têkî Folklorî kurdî / Kokirdinewe, Oskar-man, Berlin, 1905

Pêşekî û saxkirdinewe û hênanewe ser rûnî kurdî: Hêmin, çapkirawekanî Korî Zaniyari Kurd

6 - Wergêrani Çirokî ODESAY yonanî bo ser zimanî kurdî. Bê guman honerî xi-walêxoş bû Hêmin gelê berhemî tîrisî le paş beçemawê, belam ême hemûman le-ber derst da nebû.

Têbînî:

Bo em nûsîne sôd lem serçawaney xi-warewe wergirawê:

1 - Tarîk û rûn, Hêmin 1974

2 - Naley cudayî, Hêmin 1979

3 - Yadî Hêmin, Swêd 1987

4 - Govarî Sirwe, Jimarekanî 22 û 5-1336

Navêñ Pîsekî

M. Şevhat

Gava em bi zimanê xwe yê şêrin bi kurdî dipeyivin, mixabin e, em pîrî caran, pîrî tiştan bi şaşî bi lêv dikin. Eger yek ji van tiştên şaşî ku bi berdewamî di devan de bigere, êdî gelekî dijwar e ku were serrastkirin û ew gotin her bi şaşî li ziman cihê xwe digire.

Ev cûre şaşî, di warê navêñ pîsekî yên di zimanê me de jî gelekî berfireh e. Ji bo nimûne li şûna

gotinêñ kurdî yên pîsekîdariyê, gotinêñ biyanî bi kar têt. Ji vê jî bivetir, li şûna gotinêñ kurdî yên bingehîn, resen û kevin, goti-nêñ bi mantiqeka basît bihev-dugirêdayî di nav gel de digere. Mixabin e ku ev şaşî ne tenê di warê gotinêñ pîsekîyê de ye. Her wisan ev şaşî di hemû warêñ terminolojiya zimanê me de tête ditin. Çend nimûne ev in û ji binî nerast û çê in;

pêvajok, rojev, mînak, cotmeh û hwd.

Di warê terminolojiya pîsekîdariyê de jî, hinde gotin bi kar dihênin ku weke gotin rast e, lê belê di warê wateyê (mana) de çewt...

Nimûneyek ji tevliheviyan ku îro bi berfirehî belav e; tevliheviya li ser kar û cihê nivîskar (katîb) û nivîsevanan (edîb) e... Kar û fonksiyona xwendekar û xwendevan...

PAŞPIRTIKÊN NAVÊÑ PÎSEKÎ : ...van / ...wan, ...kar / ...ker, ...bêj, ...baz, ...pêj / ...pij, ...ger / ...gêr / ...gir / ...gîr, ...keş / ...kêş, ...dar / ...dêr, ...nas, ...guhêz, ...birrin / ...birrin, ...firoş, ...çêker / ...çêkrox, ...war / ...wer

Navêñ Pîsekî yên ji lêker
(verb) a Divêt:
...van, ...wan

Ji lêkera Kirin:
...kar, ...ker

Canbaz
Cambaz
Cengbaz
Dilbaz
Serbaz
Şerbaz

Wênegir
Denggir
Rêgir

Dergavan
Bilûrvan
Aşvan
Helbestvan
Hozanvan
Nivîsvan
Deholvan
Stranvan
Nêçîrvan
Kelekvan
Tenbûrvan
Masîvan
Cerdevan
Bêrivan
Şervan
Gavan
Şivan
Torevan
Zîrevan
Rojnemevan
Nûçevan
Tolikvan
Cengvan
Fikevan
Nêrevan
Keşîvan
Golikvan
Selvan
Bexçevan
Palevan
Xwendevan
Pavan

Xebatkar
Cotkar
Xwendekar (Telebe)
Nivîskar
Dirûnkar
Bestekar
Şikencekar
Şerkar
Goşkar
Cengkar
Şerker
Karker
Peyvker

Ji lêkera Gotin:
...bêj

Ji lêkera Pahtin:
...pêj, ...pij
Nanpêj
Nanpij
Kulorpêj
Kulorkêj

Wênekêş
Govendkêş
Nexşekêş

Ji lêkera Daşten - lorî
(kurdiya başûr):
...dar, ..dêr

Dezgehîdar
Peyvîdar
Serfermandar
Kujdar
Çavdîr
Fermandêr

Stranbêj
Goranibêj
Dengbêj
Çîrokbêj
Serpêhatibêj
Dîlokбêj
Teraqbêj

Ji lêkera Bezîn,
bazdan:
...baz

Rojnameger
Dadger (Hakim)
Şanoger
Banger
Hesinger
Zêrînger
Meyer
Şoreşger
Werger
Wergêr
Çapgêr
Dadgîr
Masigîr
Rexnegîr

Ji lêkera Nasîn:
...nas

Dîrokñas
Zimanas
Civatnas
Mafnas
Rohilatnas
kurdnas
Torenas

Ji lêkera Guhastin:

...guhêz

Nûçeguhêz
Wêneguhêz

Ji lêkerêñ Birrîn,
birin:
...birr, ...bîr

Serbirr
Rêbirr
Porbirr (Berber/Portiraş)
Namebirr
Rewşenbirr

Ji lêkera Firotin :
...firoş

"Zembîl" firoş
Nanfiroş
Mêwfiroş
Meyfiroş
Cilfiroş
Cerfiroş
Gulfiroş
Mastfiroş
Şîrfiroş

Ji lêkera Çêkirin:
...çêkrox

Çêkrox
Fîlmçêkrox

Çêkroxê/a radyo, Tv, mobîlya
û hwd.

bi zayenda nê:

Çêkroxê radyo
Çêkroxê tv
Çêkroxê mobîlya
Çêkroxê otomobil
Çêkroxê motor

bi zayenda mêt

Çêkroxa radyo
Çêkroxa tv
Çêkroxa mobîlya
Çêkroxa otomobil
Çêkroxa motor

Navêñ pêşekiyêñ
cihêreng - bi kurdî

Pale
Cinan
Karbidest
Pispor
Şareza
Serok
Sersing
Sertiþ
Gewende
Mamhoste/a
Hostayê/a dîwar
Hostayê/a xanî
Sixur
Arezûmend
Darteraş
Serhing
Xwende
Soldırû
Simsar
Hemşîre
Bazirgan
Hunermend
Efser
Serbaz
Rêber
Fermanber
Yawer
Xwende/a

Navêñ pêşekiyêñ
Ji zimanêñ latînî/ewrûpî hatî :

Pilot
Garson
Dansoz
Berber
Polis
Banker
Operator
Filozof

Makînist
Kamereman
Cenderme

Navêñ pîşekiyêñ ji zimanêñ latînî hatî / lêbelê rûberêñ wan ên kurdî li cî:

Şofêr : Ajo
Hostêş : Kevanî / kebanî
Doktor : Bijişk (?)
Record : Denggîr (Teyp)

Navêñ pîşekîyêñ hem ji zimanêñ latînî û hem jî, ji zimanê kurdî pêkhatî :

Kasadár
Arşîvkar

Navêñ pîşekîyêñ hem ji zimanê erebî û hem jî, ji zimanê kurdî pêkhatî :

Tehsîldar
Weznedar
Dikandar
Hylebaz
Teqlebaz
Zehmetdar
Esrarkêş
Zembîlfiroş

Çend nimûne ji bo pêşekiyêñ
bi tevayî erebî ku ketiye zimanê kurdî

Îmam, necaz
muezzîn, muneccim
xeyat, nator, tuccar, katîl

Pîşekî : senaat / meslek
Pîşekdar: xwedî senaat
Pîşekdarî: Senaat

Têbinî: Di warê Pîşekî/ Pîşekdariyê de, ji bo xweşnaskirina pîşekdariya li welat lêgerîneke karvanî û li cih pêwîst e. Min navêñ van pîşekîyan li gor derefetê lêgeriyaye û civandiye. Piraniya van navêñ pîşekîyê min ji kovara HAWARê wergirtine. Bi rastî pêwîst eku bîbêjim HAWAR di vî warî de jî jêdereke bêta ye.

Ferhengok

Amanc: hedef
Azmûn: imtihan
Ala: elam, beyreq
Afirandin: derxistin, intac
Aşti: selametî, barış
Aşit: çig
Aşiti: weke aşit, Çig gibi
Amade: hazır

Beş: pişk, qisim
Berz: bilind
Beşdar: şirîg
Boşahî: bereket
Binyad: bingeh
Bend: paragraf
Bêgav: Mecbûr
Bemame: program
Bêcir: bêehlaq
Bışkov: qumçe
Bêmenend: bêemsal
Bersiv: cewab

Cêwî: cot
Cihêreg: muxtelîf
Cihderk: mexrec
Canbaz: akrobat
Cambaz: sextekar
Co: kanal
Civak: içtîma

Çap: tebi'
Çapxane: metbea
Çel: behs
Çapemenî: press, basın

Dildarî: aşiqbûn
Dildarî: esîrbûn
Doman: merhele
Delamet: erk, wezîfe
Doz: dawa
Dad: edalet
Dilovan: bi rehm
Dadgeh: mehkeme
Dêlindêz: merasim
Dirok: tarîx
Damezrandin: tesîskirin

Enî (henî): cephe

Erk: wezîfe
Ejnû: çok
Erdnasî: cografya
Encam: netice
Ewç: bilindirin cih, lotke

Êrdim: mintiqâ
Êriş: taaruz

Ferheng: ziman, kultur
Fêris: egid
Find: mûm
Ferîsteh: melaiket

Girîng: muhîm
Giranbuha: bi qiyimet
Girav: cezîre, ada
Gewende: muzîsyen
Goşkar: soldırû
Girobûn: texîr
Goristan: qebristan
Gilgil: genimê Şamê, misir
Gefdayîn: tehdîd

Helbest: şiir
Hozan: şiir
Helbestvan: şâîr
Hozanvan: şâîr
Huner: pişe, senaat
Hunermend: pîsekdar, senaatkar

Hêstir: qantîr
Hêstir: deve
Hêsir: firmesk
Hevok: rist, cumle

Hevpeyîn: axef, çapêketin

Hesan: rehet
Hevrîsim: ipek
Herêm: navçe, mintiqâ
Hizir: fikir
Him: bingeh

Kavîl: tehrîbbûyi
Keleb: sûr, qele
Kûj: açı

Leheng: qehreman
Lêker: verb, fiil

Lê: emma, feqet
Lehî: ava pir û herêk

Maliştin: pakkirin
Mêjû: dîrok, tarîx
Mejî: beyin
Menend: nimûne, tay

Nemaze: taybetî
Nûner: delege
Nîr: giraniya li ustî
Nirx: qiyimet
Nirxandin: degerlendirme
Nivîsevan: edîb, yazar
Nivîskar: katîb, sekreter
Nivîsar: nivîs, meqale
Nimûne: menend, ta
Niştiman: welat
Nêçir: seyd
Nêçirvan: seyidvan
Nîfî: generation
Nevî: torin

Ol: din

Peyman: ehid
Pirtûk: kitêb
Pêwîst: gerek, pêdivî
Pişk: qisim
Pêşniyar: teklîf
Paşpirtik: son ek
Piše: senaat
Penaber: muhacir
Pêwendî: eleqet
Peyv: gotin
Perwerde: terbiye

Raman: bir, fikir
Rexne: neqd, eleştiri
Rêziman: gramatik
Rojname: gazete
Rêxistin: tanzîm, orgut
Rêber: lîder
Rewşen: rohnî
Rewşenbîr: bîrrohnî, aydin

Spartek: bingeh, pişt
Sermaye: kapital
Sermayedar: kapitalist
Sazûman: nîzam

Şirove: tabîr, tasvîr
Şano: teater
Şanoger: hunermendê t.

Taybetî: xasseten
Têkoşîn: mucadele
Têbinî: not
Tibab: yekûn
Têvel: tevlihev
Tîp: herf
Tékuz: kamil
Tut/tuto: zaro
Teyisin: biriqin

uşt: sedem

Vekolin: lêkolîn
Vebir: qatî
Vijnaye: bijarte
Vekuştin: qurbankirin
Vexwandin: dawet, ezimandin
Veman: bêmirin
Vaca: ters
Vejinandin: heyatdan

Wêne: resim
Wêje: tore, edebiyat
Werz: demsal
War: cih

Xwendevan: okuyucu
Xwendewar: okuyucu
Xwendekar: telebe
Xebat: kar, iş

Yekîne / yeke: birim
Yadîgar: xatira
Yom: tur
Yekser: derhal
Yeksan: yek

Zanistdar: ilimdar
Zirek: aqil
Zerrebîn: belor
Zanistî: ilim
Zêrandin: çewsandin
Zayend: genus, cinsiyet
Ziya: hût
Zanistgeh: universite

Bi raparîna Kawa, bi berxwedana Mazlûm û bi serîhildanêñ gelî yên hemdemî, em Newroza we pîroz dikin.

Girîgeha Ceyhanê

Mehmet Tanboğa, Ramazan Ödemiş, İrfan Güler, Şeyho Tabucu, Mehdi Tanrikulu, Zülfikar Tak, Hatip Akbaş, Hıdrı Akteke, Ali Doğanay, Fevzi Yetkin, Süleyman Günyeli, Alaaddin Akçay, Muhlis Bakay, A. Samet Tektaş, Mehmet Candemir, İbrahim Kasakulu, Mehmet Çiftkuş, Remzi Avcı, Siddîk Korkmaz, Hasan Bildirici, Cuma Kuyukan, Hasan Karakuş, Abdullah Paydaş, Hüseyin Makal, Mehmet Soğan, Aziz Bilgiç, Haşim Benek, Salih Ağaç, A. Kadir Atım, A. Rahman Sevgat, Osman Yıldırım, Ali Yaverkaya, Yılmaz Uzun, Ali Kılıç, Mehmet Değer



YRWK
Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan
Maxstr. 50
5300 Bonn 1